# *LI SER TÊGÎNA ESTETÎSMÊ*

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

.
.
.
.

*Li ser têgîna Estetîsmê*
Weşanên SORAN e
.
Berlin- 2014
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-9816686-2-9

.

## LI SER TÊGÎNA ESTETÎSMÊ

Ku mirov bahse xweşikatiyê bike, divê ku mirov, bi têgînî bi zêhnê re xwe li ser aqilê xwe re bihizirê û bahse wê bike. Xweşikatî, weke gotinaka ku di kurdî de bahse tişta levhatî û levkirî dike. Her wusa bi wê re jî, tişta ku li berçav xweşik tê dîtin a. Pirr li ser wê hatîya sekinîn ku ew tişta ku li berçav ku tê dîtin, weke ku wê rewşa ku mirov dibînê ya(?). Ev weke pirseka ku di temenê daraza bi xweşikatîyê re jî ya. Her wusa, xweşikatî û ankû weke ku bi rengê wê yê ku di nava felsefeyê de bahse wê hatîya kirin jî ´estetîk´, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bahse wê bike û werêne ser ziman ku bi têgîneka jîyanî mirov divê ku wê hilde li dest û fahm bike. Tişta xweşik û ankû tişta ku mirov ew aciband, bi gotina xweşikatîyê de dihê ser ziman. Ji wê zêdetirî jî, dema ku mirov li ser wê dihizirê, her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê fahm bike ku xweşikatî têgîneka ku em li vir divê ku wê fahm bikin a. He wusa, me jî, ew kir mijar di vê xabata xwe de.

Ku em bahse xweşikatîyê bikin, ji sê aliyan ve divê ku mirov nêzîkî wê bibe. Aliyê pêşî, bi têgîna bi ´xweşikatîyê´ re ya. Aliyê dûyemin jî, bi têgîna ´acibandinê´ re ya. Her wusa, ya sêyem jî ´darazê´ re ya. Xweşikatî, biqasî ku weke nerînekê ya, ew nerîn dema ku mirov li wê dihizirê, divê ku mirov werêne ser ziman ku bi hebûna xwe re ´darazek´ a. Di v çerçoveyê de nerîna xweşikatîyê, hinekî jî, bi darazî xwe dihêne li holê û li laş dixe. Dema ku em hewl bidin ku vê yekê fahm bikin û werênina ser ziman, divê ku mirov pêşî xweşikatiyê bi têgîna wê re werênina ser ziman. Ev jî, wê me di nava têgihiştineka jîyanî de bi hebûna xwe re bibêt.

Li vir, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê kifş bike û werêne ser ziman ku têgîna xweşikatîyê, mirov di nava jîyanê de bi wate dike. Her wusa, têgîna xeşikatiyê, bi hebûna xwe re, di nava jîyane zindiyî de, hişmendîyek bi jîyanê re jî ya. Em di vê çerçoveyê de divê ku wê têgînê, di vê çerçoveyê de weke hişmendiyek di derbarê jîyanê de jî, werênina ser ziman.

Têgîna xweşikatîyê, di vê çerçoveyê de dema ku me got hişmendiyek di derbarê jîyanê de ya, êdî ev bi xwe re bi me dide têgîhiştin ku jîyan bi tevgerîya wê ya ku heya re, xwediyê darêjkek heyînî ya jîyanî ya. Ev darêjk, her wusa, bi levkirina xwe re êdî wê heyînî ya darejkî a hebûnî bi me û hişê me re didêt têgihiştin. Em li vir, divê ku vê yekê baş fahm bikin ku têgîna xweşikatiyê, weke têgihiştineka jîyanî û hişmendîyek di

derbarê wê de êdî mirov di nava xwe de dibê. Ev herîkina jîyanî ku bi gotina xweşikatiyê re xwe dihêne ser ziman, di nerînê de weke hişekî pêşî ku bi me re dide çêkirin ku ´ne teqezbûnekê´ bi heyînîya xwe re dihêne li holê. Di vê çerçoveyê de, dema ku mirov li wê dihizirê, êdî divê ku mirov wê rastîya wê baştir fahm bike. Xweşikatî(estetism), têgînek şûbjeyî ya jîyanî ya. Her wusa, em li ser wê şûbjeyîya wê re divê ku bahse wê hişmendiya wê bikin. Ji xwe, ev alî, êdî weke aliyekî teybetî ku mirov divê ku wê fahm bike û hewl bide ku wê werêne ser ziman. Li vir, bi herîkînî, jîyane bi demê re ku dibê, bi xwe re darêjkekê jî dide afirandin. Em li vir, divê ku vê yekê jî, bi wê têgîna heyîna xweşikatîyê ya hebûnî re fahm bikin.

Di destpêka nivîsandina me de, gotinên ´xweşikatî´ û ´acibandin´ me hanîn ser ziman. Ev herdû gotin, wusa hîsekê bi me re didin çêkirin ku weke ku hinekî cudabûnek di nava wan de heya. Xweşikatî, bi têgîna darêjkekê xwe salix dike û dihêne ser ziman. Her wusa acibandin jî, têgînek û ankû derkek hişmendî ya di derbarê wê darêjka xweşikatîyê de ya. Jineka kurd, dema ku li gorî kevneşopîyên xwe cil û bergên xwe li xwe dike, wan cilên xwe bi reng û motivên wê yên ku afirîna re dike nava ahengekê de. Ev aheng, her wusa, weke mijareka teybetî ya di temenê vê fahmkirina me ya di vê xabatê de bê. Em fahmkirina ku em bikin, divê ku em wê ji rêzê nebînin. Wê bi serê xwe, hişmendiyek têgînî ya derkî a jîyanî bê. Her wusa, şûbjeya têgînî a rengan, ku dema ku em li vir li wan dihizirin, em vê yekê, weke aliyek teybet wê kifş dikin. Têgîna rengan, her wusa, giring a ku mirov li vir wê fahm bike. Li jêr, emê bi berfirehî li ser wê bisekin in. Lê li vir, weke mijarekê ku em divê ku wê hildina li dest, divê ku mirov em di temenê şûbjeya têgînî a darêjkê de hildina li dest. Ev jî, wê di nava gotina acibandinê de têgînekê bi xwe re bi me bide têgihiştin.

Têgîna xweşikatîyê, li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov di serî de vê aliyê wê kifş dike ku weke têgînek darêjkî a bi hişî, mirov wê kifş dike. Hiş, dema ku bi gotina xweşikatiyê re were ser ziman, wê bi ast û radayaka fahmkirinê re werê ser ziman. Ev jî, dide nîşandin ku têgînek astî û radayî di temenê fahma xweşikatiyê ya darêjka wê de heya. Ev jî, êdî xweşikatiyê, bi darêjeka wê re bi serê xwe dike mijarek têgînî ya ku mirov wê divê ku bi fahmak berfirehî wê hilde li dest a.

Têgîna xweşikatiyê, di dîrokê de dema ku mirov wê hilde li dest, divê ku mirov bi têgîna aqil re wê bidest hildana li dest biike. Lê li vir, divê ku mirov bi darêjkî di nava jîyanê de bi heyînîya hebûnî ya wê re fahm bike.

Her tiştê di jîyanê de ku zindî û ne zindî, bi darêjkekê ya. Her wusa, ew darêjk jî, dema ku mirov li wê dihizirê, bi awa û weke ku mirov wê dibînê bi reng a. Ev herdû alî, wê di çerçoveya wê tiştê de di mejiyê me de kombinasyonekê bide çêkirin. Ev jî, wê êdî vê bi xwe re têgînekê bi me re bide çê kirin. Dema ku mirov gûlekê dibînê û dest lê dide, mirov wê fahm dike.. Gûl, bi reng, heyîn û bêhna xwe re bi hevdû re heya. Ev hemû di nava darêjka gûlê de bi hevdû re hena. Em dema ku bahse gûlê dikin, em bahse wê darêjka wê dikin. Bi wê re jî, em dema ku bahse gûlê dikin, em bahse wan teybetîyên wê bi hevdû re dikin. Her wusa, gûl, weke darêjkek pirr-teybetî, mirov dikarê wê werêne ser ziman. Darêjka pelên gûlê, her wusa, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov wê di vê çerçoveyê de wê kifş bike. He wusa ev bi têgînekê bi me re heya.

Darêjka xweşikatiyê, dema ku mirov hewl bide ku wê fahm bike, divê ku mirov wê bi teybetî têgîna wê re hilde li dest. Her wusa, têgîna wê jî, di çerçovaya wê darêjka wê de heya. Ev jî, weke aliyekî din ê ku mirov divê ku wê werêne ser ziman a.

Di serdemên berê de weke ku me bi minaqa gûlê re da, mirov dibînê ku bi heman rengî bi kevneşopîyê re heya. Têgîna kevneşopîyê, di aslê xwe de em dikarin weke têgînek saf û zelal ya xweşikatiyê werênina ser ziman. Her wusa, dema ku mirov hewl bide ku wê hilde li dest, divê ku mirov bi wê re werêne ser ziman. Kevneşopî, her wusa, di çerçoveya heyînîyên wê de, mirov wê kifş dike. Kevneşopî, weke komposizyonaka têgînî ya. Her wusa, bi têgînî darêjkkirina têgihiştinan bûya. Ev jî, weke aliyekî ku mirov divê ku bi teybetî li ser wê bisekinê û hewl bide ku fahm bike ya. Salix kirina wan jî, di jîyanê de bi cil û berg û her wusa rengê jîyanê re xwe dide dîyar kirin. Ev jî, weke hebûna kevneşopîyê mirov dikarê wê werêne ser ziman.

Kevneşopî û ankû xweşikatîya kevneşopîkî, ku mirov bahse wê bike, mirov wê di çerçoveya vê rastîya wê de wê hilde li dest û hewl bide ku fahm bike. Kevneşopî, di hundurê serdema ku dijî de weke ku xwediyê derkeka dervî demî bê li mirov tê bi wê re. Ev jî, weke têgîneka kevneşopîkî ya. Lê ev têgînî, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov dibînê ku bi wê re darêjk heya. Ya ku wê hîsî bi wê têgînê re bi me re dide çêkirin jî, ew darêjk a. Darêjka kevneşopîkî, her wusa, piştî ku afirî û pê de, mirov dikarê bahse wê bike. Her wusa, piştî afirîna wê re jî, mirov weke têgînekê dikarê bahse darazê jî bike. Di nava jîyane me ya asayî de, gotinên weke ´ev kirin li gorî kevneşopîyê ya´ û ankû ´ev kirin ne li gorî kevneşopîyê ya´, her wusa, wê di vê temenê de temenê gotina ´darazê´ jî

bi xwe re êdî di nava jîyanê de bi jîyankirinê re biafirênin. Em li vir, dema ku xweşikatiyê, hewl bidin ku wê fahm bikin, em divê ku vê jî bizanibin ku em bi zanebûnî hewl didin ku têgînekê jî werênina ser ziman. Ev jî, weke aliyekî giring ku mirov divê ku wê werêne ser ziman a.

Têgîna xweşikatîyê, weke ku çawa ku bi darêjkî heya, her wusa ew darêjk jî, di vê çerçoveyê de dema ku mirov li wê dihizirê, mirov bi gotinaka hişmendiyê re wê dihêne ser ziman. Her wusa têgîna xweşikatiyê, li vir, mirov bi têgîna xwe ya ku bi me re afirandî re êdî di nava jîyanê de bi hişmendî dike. Em li vir, divê ku vê rastiyê jî, werênina ser ziman ku darêjk, hişmendîyeka ku em bi gotina ´acibandinê´ re ku ji wê derk dikin ku em dihênina ser ziman, wê êdî weke hizirkirina hişkirinê, wê xwe werêne ser ziman. Ev jî, wê êdî temenê têgîna wê ya. Têgîna li vir, ku bi darêjkî, heya, ew jî, bi hebûna xwe ya têgînî re bi hiş heya. Ev hiş jî, bi aqilê me yê ku bi demê re bûya re heya. Ev, dide nîşandin ku xweşikatî, têgîneka. Xweşikatî, hizirkirinek a. Xweşikatî, nerînek a. Her wusa, ji vê nerînê re mirov dikarê bêje daraz jî. Ev jî, weke aliyekî din ê ku mirov divê ku wê hilde li dest û fahm bike ya. Têgîna darazê, her wusa dema ku mirov li wê dihizirê, mirov bi darêjka xweşikatîyê ya ku afirîya re dibînê. Acibandin, û ankû weke ku carna di nava jîyanê de ji dev derketîya ´xwesteka dilê min´ ku mirov li vir li berçav digirê mirov wê rastîya wê êdî kifş dike.

Têgîna xweşikatîyê bi daraza xwe re heya. Her wusa, ew daraz jî, derka têgîna xweşikatiyê ya ku mirov divê ku bi têgînî wê hewl bide ku wê fahm bike ya. Ya ku mirov li gorî nerîna xwe ´xweşik´ dibînê, ya ku mirov ´rast´ ditîya ya. Ev jî, bi serê xwe mijarekê, êdî di temenê têgînekê de bi hizirkirina mirov re di temenê têgînek levkirinînî de bi mirov re dihêne ser ziman. Têgîna ´ya ku mirov li gorî xwe xweşik dibînê, ya ku mirov li gorî xwe rast dîtîya, her wusa li vir, temenê darazekê jî ya ku mirov bi teybetî û têgînî li wê bihizirê ya.

Ev daraze têgînî ya xweşikatiyê ku em bi gotina ´rast´ re dihênin ser ziman, temenê wê dîsa gotina xweşikatiyê û ankû darêjka wê diafirênê. Ev, ya ku mirov rast dîtîya ya. Ya ku mirov rast dît, her wusa, wê bi xwe re di temenê têgînek ´lihevdûbûyî´ de xwe werêne li holê di mejiyê mirov de. Ev jî, têgîna darêjkî ya ku mirov wê bi têgihiştinî wê kifş bike ya. Em dema ku vê yekê weke rastiyê kifş dikin, em li vir divê ku weke hewldanek fahmkirina wê, divê ku mirov lê bihizirê. Gotina ´rastiyê´,

weke gotinek aqil ku mirov wê dihêne ser ziman, her wusa li vir, weke darazekê ya. Rastî, bi xwe jî, li vir darazek têgînî ya.

Ya ku rastiyê li vir dike weke darazekê, ev têgîne xweşikatiyê ya. Ya ku wê têgîna xweşikatiyê jî, weke darêjk ku bi me re daye têgîhkirin jî, ew levkirina bi darêjkê ya. Li vir, em dema ku bahse gotina xweşikatiyê dikin, em dibînin ku weke ku em bahse ´komposizyonekê´ dikin a. Her wusa, em bahse levkirinekê dikin. Ev levkirin, bi darêjkî, têgîna hişî ku di derbarê wê de bûya, wê ji wê derka levkirinê di mejiyê mirov de biafirê. Ev jî, wê weke darêjkekê bê. Mejî, li vir, dema ku mirov weke rastiyeka bi hizirkirinê re di derbarê wê de werêne ser ziman ku pêşnûmaya rewşî ku di wê de wê girtîya, wê hişmendîyek di derbarê wê de biafirêne. Hişmendiya di derbarê wê pêşnûmayê de, wê têgîna xweşikatîyê bi hişmendî bixwe re biafirêne. Mejî, ya ku li gorî xwe hîs dike, wê û li gorî wê dixwezê. Êdî ev xwestek, temenê afirandinekê ya di mejî de ya.

Xweşikatî, di vê rewşê de dema ku em li ser wê pêşnûmaya mejî re lê binerin, em divê ku werênina ser ziman ku bi hişmendiyeka k u hatî levkirîn re wê xwe werêne li holê. Mejî, dema ku dihizirê, teybetîyên ku girtina, wan bi hevdû re dikarê bike nava komposizyonekê de. Her wusa, teybetîyên wan bide li hevdû. Her wusa, weke mirovekî asayî ku mirov dema ku lê hizirî ku du bask li pişt wî hatin çêkirin û piştre hat hizirîn ku ew mirov diafirê û hwd. Ev têgîna afirandinê ya.

Di nava kurdan de ´naqşaya şahmaran´, dema ku mirov bahse wê bike, li vir, wê têgîneka xweşikatiyê ya teybet bide me. Naqşaya şahmaran, bi reng û fîgûrên ku di wê de hatina bikarhanîn re komposizyanaka estetikî ya kevneşopî ya. Her wusa, li vir, em bi naqşaya şahmaran re gelek darazên bi hevdû re dibînin. Di nava jîyane civatî de çi nirxên pîroz û bi qûdret hebûna, ew bi teybetî hatina kifşkirin û hatina hanîn li cem hevdû û bi hevdû re hatina xistin nava ahgenekê de. Têgîhiştina di derbarê wan teybetîyên ku hatina hatin li cem hevdû jî, bi hevdû re hatîya ahengkirin. Her wusa, naqşaya şahmaran, weke wêneyek pirr rengî ku levkirinek bi wan rengan re hatîya çêkirin a. Mirov dema ku mirov li wan rengên wê dinerê, mirov vê yekê, weke têgînekê kifş dike. Lê li vir, em dema ku bi darazî û hwd re jî, werênina ser ziman, nirxên ´pîroz´ ku çi na, ew hatina bicihkirin li wê, minaq, weke ku bi bawerîya yazdanî re tê dîtin, ku sê rengên kesk û sor û zer pîroz in. Her wusa, biwê re jî jin jî pîroz a. Marê reş jî, bi heman rengî nirxiyek lê hatîya baxşkirin. Ev hemû di wê wêneyê û ankû naqşê de hatina hanîn li cem hevdû. Di vê

temenê de şahmaran, bi wê naqşê re ne tenê weke naqşeykê ya. Dema ku em di çerçoveya nerîna kevneşopîkî de dinerin, em dibînin ku têgîneka darazî ya civatî bi wê re hatîya afirandin. Di wê çerçoveyê de, hunerek, çandek û ankû afirînerîyeka kevneşopîkî û hwd hatîya çêkirin.Têgîna şahmaran, em dema ku weke darêjkekê hildina li dest, em van têgînên ku di mejiyê mirovan de bicih in û ku ew di wê de hatina hanîn li cem hevdû mirov dibînê. Di wê çêkirinê de jî, wê çawa levkirinek û ankû ahengek were çêkirin û ankû derxistin li holê, li wê pirr zêde hatîya hizirkirin. Teybetiyên wan nirx(têgîn)ên têgînî ku hatina bikarhanîn, ew dihên hanîn levkirin. Her wusa, di wê çerçoveyê de mirov dikarê bibêje ku mirovê vê serdema ku di wê de şahmaran çêkiriya, pirr afirîner a.

Têgîna levkirinê ya darêjkî ya bi gotina xweşikatiyê re ku mirov wê dihêne ser ziman, têgînek levkirî ya. Ev têgîna levkirî, xwediyê vaca xwe ya teybet a. Her wusa, têgîna vaca serdema mîtolojikî, mirov dikarê her wusa ji wê sûd bigrê û bi wê bahse têgîna vacê ya di nava têgîna xweşikatiyê de bike. Bi hanîna teybetîyan a li cem hevdû re afirandina darêjkê, wê afirînerîyek xweşikayî bê. Afrînerîya xweşikayî, bi mejiyê wê re dema ku mirov dihizirê, mirov vê rastiyê kifş dike ku bi wan teybetîyên ku hatina hanîn li cem hevdû û bi wan re darêjk hatîya afirandin, bi wê re levkirin diafirê. Li vir, dema ku em bahse gotina xweşikatiyê bikin, gotina levkirinê, weke gotinaka teybet dihê ber me.Gotina levkirinê, weke afirînerîyeka darêjkî ku gotina xweşikayîyê bi wê afirandina xwe re salix dike, bi wê re jî temenê têgîna ´acibandinê´ ya di mejî de jî diafirêne. Teybetîyên ku dihêne cem hevdû, wan teybetîyan, bi hevdû re dike ahengekê de. Li ser wê ahengê re levkirinê dibe. Li ser wê levkirinê re jî darêjk diafirê.

Darêjk, piştî ku afirî û pê de, wê êdî hebûna wê ya ´objeyî´ were li holê. Ev hebûna objeyî, ku weke heyînekê ya, wê li ser levkirina wê re gotina xweşikatiyê xwe bitêgîn bike. Levkirin, temenê gotina xweşikatiyê ya. Her wusa têgîna gotina xweşikatiyê jî, temenê ya gotina acibandinê ya.

Dema ku em darêjkê, di vê çerçoveyê de dihênina berçav, em dibînin ku weke ku ji pirr-teybetîya afirîya ya. Yanî, gelek teybetîyên ku hatina hanîn cem hevdû û bi hevdû re hatina xistin di nava ahengekê de na. Têgîna xweşikatiyê, em divê ku weke têgîna xwe ya şûbjeyî ya darazî jî werênina ser ziman. Xweşikatî, di ancamê de têgîneka ku weke bi nerînê re hatîya acibandin a. Yanî, hatîya ´rast´ dîtin a. Ya ku hatî rast dîtin,

weke darazek ku hatîya herêkirin a. Ev jî, weke aliyekî ku mirov dikarê wê bi teybetî kifş bike ya.

Daraz, li vir, li ser wê têgîna levkirina darêjka xweşikatiyê re weke ´rastîyekê´ xwe dihêne ser ziman. Dema ku em darazê, li vir, hewl bidin ku wê fahm bikin, emê bi nerîna xwe re wê kifş bikin. Nerîne me jî, bi hişmendiya me ya ku bûya re heya. Hişmendî, her wusa, weke têgîneka di derbarê darêjkê de ya. Em li vir, dema ku bahse xweşikatiyê dikin jî, em ji vê yekê gavê diavêjin û bahse wê dikin. Lê xweşikatî, hinek têgînên wê yên ku mirov bi teybetî wê werêne ser ziman hena. Ew jî, her wusa bi fahmkirina darêjkê re ya.

Di jîyanê de gelek tişt hena ku mirov wan dibînê na. Her wusa, her tişta ku mirov wan dibînê, mirov wan di mejiyê xwe de qayd dike. Mejî, wan di xwe de bi teybetîya wan re qayd dike. Têgîna tişta dervayî ku mirov wê dibînê, wê di temenê levkirinekê de bê. Her wusa, dema ku mirov li simitrîya pela darekê dinerî û heta ku digihijê ya tiştekî din a di jîyanê de, wê her wusa di mejiyê me de qayd bibe. Ev jî, wê wê bi têgîn bibe. Her hildana nava mejî, wê bi têgîn bê. Ev jî, bi zêhnê mirov re û her wusa sehên mirov re dibê.

Mirov dema ku ev hildan di mejî de kir û pê de, wê êdî ew hildan weke têgînna heyîna xwe biparêzên. Mejî, li vir, dema ku bi dest bi navkirinê kir û pê de, wê êdî wê têgînê temenê têgîna wê ya ku xweşik û ankû ne xweşik biafirêne di mejî de. Salixkirina bi navî, hinekî jî têgîneka simitriyî bi xwe re di vê çerçoveyê de diparêzê. Em divê ku nav, weke têgîneka giring li vir werênina ser ziman. Nav, bi xosletên xwe re wê temenê wê daraza wê ya şûbjeyî biafirêne. Xweşikatî, têgîneka ku li vir weke ku mirov kifş dike ku temenê wê yê têgînî ê bi darêjkî ku li ser hîmê xoslet û teybetîyan a.

Xoslet û têgîna di derbarê xosletan de ku bi nerînê re xwediyê darazekê na, mirov li vir bi wê re kifş dike. Daraz û têgîna darazê, her wusa, li wê rewşa jîyanî ku ew xosletên ku hena ku lêhatinekê dike û ankû nakê, bi wê re eleqeder a. Weke têgînekê jî, dema ku mirov lê dihizirê, di vê çerçoveyê de mirov wê êdî bi xosletên wê re kifş dike. Xoslet, dema ku mirov bi têgîna levkirinê re werênina ser ziman, divê ku mirov ´teybetîyan´ jî, her wusa bi xosletên darêjka wan xosletên pêşî a ku ji wan afirî re werêne ser ziman. Ev jî, wê êdî weke aliyekî din ê wê yê ku mirov wê werêne ser ziman a. Di nava kevneşopîyê de xweşikatî, bi têgîna rastîyê re xwe di darizêne. Têgîna rastiyê, li vir, dema ku em bi gotina kevneşopîyê re werênina ser ziman, em divê ku bi darêjkên darazî

re werênina ser ziman. Di jîyane civatî de ew kevneşopî û darazên wê, dema ku mirov li wan dihizirê, mirov di cih de kifş dike ku weke ´rastiyekê´ hanîna ser ziman, wê weke aliyekî wê yê bi têgihiştinî bê. Di jîyanê de, ´li gorî nirxên civatî jîyandin´, weke têgîna vê têgihiştina kevneşopîyê dihêne ser ziman. Lê bi wê re jî, tişta ku em divê ku werênina ser ziman, di nava têgîna kevneşopîyê de hemû ´rêgez´ û ankû xalên weke xalên kevneşopîkî û hwd ku dihên ser ziman, bi darêjka wan re dihêne ser ziman. Têgîna kevneşopîyê, bi jîyanê re xwediyê rêzkarîyekê ya. Her wusa, ew rêzkarîya têgînî, temenê darêjka têgîna kevneşopîyê ya. Her wusa, ev rêzkarî, bi hişmendiyekê re dihê li holê.

Kevneşopî û rêzkarîya wê, bi darêjka wê re mirov divê ku werêne ser ziman. Rêzkarîya wê, rengên kevneşopîyên wê na. Ev rêzkarîya kevneşopîkî, divê ku mirov werêne ser ziman ku di temenê wê de hişmendîyek heya. Ev hişmendî, têgihiştinek di derbarê wan kevneşopîyan de jî bi xwe re dihêne ser ziman. Kevneşopî, hişmendiyak a. Her wusa kevneşopî, têgihiştineka ku mirov divê ku bi wê hişmendiyê re werêne ser ziman a.

Têgihiştina kevneşopîyê ku em weke hişmendiyê dihênin ser ziman, wê çerçoveya civatî bê. Her wusa, hişmendiya kevneşopî û rengên pêşketina wê jî, wê bi xwe re darazên têgînî jî werêne ser ziman. Daraza mirov, dema ku mirov bi nerînê re dihêne ser ziman, li gorî wê rastiyê ya. Di nava jîyane civatî de dema ku tê gotin ku "li gorî rastîya civatî hizirin´ û hwd, hinekî jî mirov dikarê vê temenê de werêne ser ziman. Têgîna kevneşopîyê, bi darêjkî, wê temenê têgîna darazê bi xwe re biafirêne.

Di nava jîyanê de rengê jîyanê ê ku pêşketî, her wusa li vir mirov dikarê wê werêne ser ziman. Ev heyîna kevneşopîkî dihêne ser ziman. Lê li vir, bi wê re jî, têgîna kevneşopîyê, bi rengê jîyane wê re dihê berçav. Di nava jîyanê de her wusa rengê jîyanê û rengê xwe adilandinê û hwd, weke aliyna ku mirov dikarê bi têgîna xweşikatîya kevneşopîkî re werênê ser ziman in. Xweşikatîya kevneşopîkî, li gorî rêzkarîya kevneşopîkî ya jîyanî ku mirov li wê dihizirê, mirov rengê jîyane wê re dibînê. Jîyane civatî, bi cil û bergên wê yên ku li xwe dike, bi rengê jîyanê ê ku bi wê dijî û her wusa raks û govendên ku dike re, wê xweşikatîya xwe ya civatî ya diafirêne.

Her govendek, bi hemû tevgerên wê yên ku hena re mirov divê ku li wê bihizirin. Her wusa her rengekî jîyanî ê kevneşopîkî, weke têgînekê ku mirov wê werêne ser ziman a.

Têgîna xweşikatiyê, her wusa, dema ku mirov di nava jîyanê re lê dinerê, weke hevbeşîyekê dihê berçav. Têgîna xweşikatiyê, li vir bi wê bi têgîna acibandinê re tê ser ziman. Lê li vir, dema ku mirov bahse acibandinê bike, mirov acibandinê divê ku weke nerîna mirovî werêne ser ziman. Mirov, bi xwe re xwediyê nerîna xwe ya. Nerîna mirov, daraza mirov a. Her wusa, kevneşopî jî, bi nerînî darazên mirovî na.

Di nava têgîna kevneşopîyê û heyîna xwezayê de têkiliya ku mirov dênê jî, mirov li vir divê ku dêne. Bi têgînî, rengê nerîna mirov û şenberîya wê, bi dîtina mirov a dervayî re xwe diafirêne. Her wusa, her rengê xwezayî, di vê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov bibêje ku xweza bi heyîna xwe re xwediyê levkirinîyeka têgînî ya. Reng û heyîna tiştên xwezayî, levkirina wan heya. Her wusa, ev levkirina xwezayî, bi pêşnûma û darêjka xwezayî re ew ahenga ku di wê de heya. mirov divê ku wê li vir kifş bike. Ev levkirina ku mirov bi mejî re kifş dike, wê têgînekê bide me.

Têgîna xweşikatiyê, bi darêjkî rewşên jîyanî ên bûyîna kifş dike û wan weke darêjkna têgînî salix dike. Li ser wê re jî, rewşna weke tîyatroyan ku dihên nivîsandin, têgînên çandî û bineterên nivîskî ên weke romanan û hwd, mirov dikarê werêne ser ziman. Ev nivîsandin û hwd, li ser hizirkirinê re afirandinên ku hatina kirin in. Romanak û ankû nivîsandinek bi heman rengî, mirov dikarê weke bineterna ku têgîna xweşikatiyê(estetism) jî werênina ser ziman. Ahenga di nava wê nivîsandina romanê û ankû bineterê de û hwd, levkirinek afirînerî ya ku bi levkirina teybetîyan re heya. Ew teybetî, bi levkirina wan re ew bineter hatîya afirandin.

Em dema ku bahse kevneşopîyê bikin, divê ku mirov bi reng û rêgezên têgînî re bahse wê bikin. Her wusa, em li vir pêşî divê ku li ser rêgezên têgînî bisekin in:

.

**Têgîna kevneşopîkî bi estetîsmê re**;

Rêgezên kevneşopîkî, dema ku em bahse wan bikin, divê ku em bi têgînê bahsê bikin. Têgînên ku tevgerên me di nava rewşê de didina kifşkirin, mirov bi kevneşopîyê re weke rêgezên têgînî wan dibînê. Di nava wan rêgezan de wê çawa were jiyîn û wê bi çi were jiyîn û hwd, di wê çerçoveyê de bi têgînî kifşkirinek heya. Her wusa, her gavavêtinên mirov di nava jîyanê de hatina kifşkirin. Kifşkirinên di nava jîyanê de ku hatina kirin, wê bi têgînên hizirkî bin.

Her wusa ev têgînên hizirkî, wê di nava jîyane hevbeş ya civatî de wê bi awayên pirr-alî werina xwandin. Her wusa, çend ku ew rêgezên çandî bi kifşkirina xwe re wê ´rengê´ jîyan mirov jî bidina dîyarkirin. Hizirkirina di nava wan rêgezan de wê bi têgînîyekê bê. Hizirkirina têgînî, çerçoveya wê ya ku heya wê kifşkarîya wê di jîyanê de xwe bide dîyar kirin.

Têgînên kevneşopîkî, mirov divê ku di çerçoveya jîyane hevbeş de werêne ser ziman. Wê ev têgînên kevneşopîkî, wê weke rêgezna hevbeş ên civatîtîyê jî xwe werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku di vê çerçoveyê de werêne ser ziman ku kevneşopî, têgîna jîyane şariştanîyê û dema wê ya. Em li vir, divê ku vê yekê bi teybetî werênina ser ziman. Di nava jîyane kurdên berê de mirov kifş dike ku giringîyek mazin didina kevneşopîyan. Ev kevneşopî, weke rêgezên destûrî ên temen in. Li gorî wan, di nava jîyanê de dihê jiyîn.

Em dema ku bahse kevneşopîyê dikin, em li vir bi têgîna hizrî em vê rastiyê kifş dikin ku kevneşopî, têgîna jîyane hevbeş a civatî na. Li Kurdistanê, kevneşopîyên ku berê hena, di serdema me de jî kifşkarîyek wan heya. Ev çi dide nîşandin? Ev, kifşkarîya têgezên kevneşopîkî weke destûrî dide nîşandin.

Kevneşopî, bi hebûna xwe re têgînek jîyanî ya. Ev têgîn, hişmendîya me re pêşketîya. Mirov, çendî ku bi hişmendî bû, êdî di nava jîyane xwe de serdestîya xwe bi têgînîya xwe re bidest xist. Ev têgîn, wê rengê jîyanê bi xwe re bide dîyar kirin. Rengê jîyankirinê, wê bi hizirkirine mirov di temenê afirandina mirov a bi jîyanê re êdî pêş bikeve. Kevneşopî û têgînîya wê, wê weke pergaliya vê bê.

Kevneşopî, bi rengê pêşketina xwe re wê hewirdora xwe bi rengên wê re esas bigrê û li gorî wan pêş bikeve. Di nava jîyane hewirdora me de di nava xwezayê de gelek reng hena. Rengên xwezayê, mirov bi hizra xwe ya di serê xwe de kifş dike.

Rengên xwezayê, wê di nava rengê têgîna jîyane mirov de bicih bin. Mirov, li wan dinerê û ji wan peyxamê digrê. Ew rengên xwezayê, wê bi wan bê bi reng kirin. Rengê xwezayê, wê têgînkirina wê re wê di nava jîyane mirov a ku dijî de were bicih kirin. Têgîna xwezayê, wê xwezayê werêne nava jîyane me.

Di nava kevneşopîyê de pêşketina têgînên çandî û hûnerî û hwd, mirov dikarê di vê temenê de werêne ser ziman. Her wusa, hûner, weke rengekî çandî ê têgînî ku mirov li vir li ser bisekinê ya. Têgîna estetîsmê, wê xwe bi adilandina hûnerî û hwd re bide li der. Peyxam, dîzaynkirin û

bi pêşnûmekirin, wê bi têgînî hebin. Peyxam, têgînek hişmendî ya. Bi zanebûna mirov re afirinerîya mirovî re mirov dikarê wê werêne ser ziman.

Kevneşopî, dema ku em li wê dihizirin, em dibînin ku weke birêgezkirina têgîna civatî bi wê re dihê dîtin. Di nava kurdan de, di serdemên berê de kevneşopî û rêzikên wê, weke rêzikên destûrî ên ku li gorî wan jîyan dihat adilandin bûn. Her wusa, giringiyeka kevneşopîyê heya. Kevneşoppî, di vê çerçoveyê de bi pergaliya xwe civatî mirov dikarê wê werêne ser ziman. Kevneşopî, bi têgînî, her wusa dema ku mirov li wê dihizirê, bi wan rêzikên wê ên têgînî mirov dikarê weke objeya têgînî a civatî jî li wê binerê û wê werêne ser ziman. Her wusa, têgîna kevneşopîyê, di nava demê de û her wusa bi demê re şenberîyek bi xwe re afirandîya. Dema ku mirov li wê têgîna wê dinerê, mirov li wê dinerê û mirov wê dihêne ser ziman. Mirov, ji wê têgînê û çerçoveya wê ya darêjkî, çerçoveya pergalî ya civatî jî kifş dike. Civatîtî, têgîna hevbeş a li jîyanê ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de, dema ku mirov bahse wê têgîna wê ya hevbeş bike, divê ku mirov vê yekê bi teybetî li ser bisekinê. Bo ku ev yek, weke mijareka teybet a ku divê ku mirov li ser wê bisekinê ya. Her wusa, rengê hizirkirina mirov, li gorî keseyetîyê dema ku mirov werêne ser ziman, teybetîyên wê ên bi keseyetîyê û tekanîya kesetîyê re hena. Mirov, hertimî bi xwe re xwediyê nerîna xwe ya teybet a. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Dema ku li jyanê dinerê, kifş dike û diacibêne jî, di vê çerçoveyê de bi nerîna xwe re wê dike. Mirov, xwediyê pêvajoyê pêşketinê ên bi xwe re ya.

Ev pêvajoyên mirov ên pêşketinê ên bi keseyetîyê re, rengê pêşketina mirov jî dide kifşkirin. Pêşketina mirov, her wusa her wusa, bi xosletî, bi keseyetîyê re bi sînor aliyên wê hena û her wusa di çerçoveya jîyane hevbeş de aliyên wê ên hevbeş hena. Ev jî, dema ku mirov li wan bihizirê, divê ku mirov bi teher(dîyelektika) di nava keseyetîyê û civatîtîyê û ankû vajî wê di nava civatîtîyê û keseyetîyê re mirov dikarê werêne ser ziman.

Keseyet, temenê heyîna civatî ya. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman. Keseyet, her wusa, bi deronî û civaknasîya xwe re li gorî wê hevbeşîya civatî xwe di mejî de diadilêne. Mejî, wê deroniyê ji xwe re weke temen jî bikardihêne. Ji serdema kombûna komikên piçûk ên mirovan û heta serdemên şariştanî ku bi civaketî û hwd re ku ev pêvajo bi vê re mirov dikarê werêne ser ziman.

Kevneşopî, dema ku mirov li wê dihizirê her wusa, di rengê destûrîyên wê jîyan hevbeş mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, kevneşopî, rengê wê, rengê jîyane şariştanî ya. Em vê yekê, dikarin bi teybetî binxat bikin û werêna ser ziman.

Kevneşopî, desûrîyên jîyanî na. Her wusa, di çerçoveya rêgezên wê ên destûrî de jîyane civatî xwe dihêne ser ziman. Têkiliya di nava jîyane civatî de bi têgînî li hevdû hoyandî ya. Her wusa, ev hoyandîtî, ji aliyê deronî û civaknasî ve jî ya. Têgîna deronîyê, li vir dema ku mirov li wê dihizirê, mirov divê ku di vê temenê de wê bi têgînîyeyk temenê ya civaknasî re werênina ser ziman.

Di darêjka têgîna kevneşoîyê de têgîna jîyanî a ku diafirê, bi rengên wê yên ku hatî bi çerçova kirin re mirov wê dibînê. Lê dema ku em bahse têgîna kevneşopî bikin, em nikarin tenê ji aliyekî ve werênina ser ziman. Her wusa ji aliyê deronî, ahlaqî û her wusa civaknasî û hwd ve jî werênina ser ziman.Mirov, dema ku di nava wan sînorên kevneşopî de dijî, ´ya rast´ ku di nava wê de ´xwe rehet hîs dike´ ew jîyane ku weke ´jîyane kevneşopîkî´ dihê bi navkirin a. Ev bi navkirin û ankû gotin, gotinên ku mirov bi wan rengê pêşketina xwe ya di jîyanê de ku dike û dixwezê ku werêne ser ziman a.

Jîyane kevneşopîkî, dema ku mirov li wê dinerê, wê bi rengên ku bi wê dihê salixkirin re wê were ser ziman. Cil û bergên ku li xwe dikin, rengna têgînî ên wê kevneşoîyê na ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê û di vê çerçoveyê de werênina ser ziman in. Her wusa, bi wê re jî, têgînên ku mirov di mejî de afirandîya di nava wê têgîna kevneşopîyê de, wê weke têgîna şûbjeyî wê hebin. Her wusa, ew cil û bergên ku bi rengînî jin û mêr di nava wê jîyanê de li xwe dikin, wê weke têgînek objeyî ya wê têgîna şûbjeyî ya ku hatî bihişkirin bê. Em li vir, divê ku wan cil û bergên ´kevneşopîkî´, li vir, bi teybetî li ser wê bisekinê. Ew cil û berg, têgînna objeyî na. Her wusa, em dikarin, bi gotina estetîsmê re werênina ser ziman ku ew têgînên şûbjeyî ku hatina bidarêjkkirin in.

Em li vir, vê yekê, li vir bi teybetî divê ku werênina ser ziman ku cil û bergên kevneşopîkî, ew têgînên civatîkî ku em bi têgînî wê kifş dikin, weke darêjkna wê na. Her wusa, darêjka têgîna civatî a şûbjeyî, bi wan rengên li ser cil û bergan, motiv û naqşkirinên ku hatina çêkirin û her wusa bi rengê li xwe kirinê û hwd re komposizyoneka estetîkî bi xwe re diafirêne. Vê, weke têgîna jîyanî a estetîkî jî mirov dikarê werêne ser ziman. Her motivek, di vê çerçoveyê de, divê ku mirov werêne ser ziman ku têgînek estetîkî ya ku li jîyanê hatîya salixkirin a. Têgîna estetîsmê jî,

dema ku mirov di vê çerçoveyê de û ji vê aliyê ve ku mirov li wê dinerê, mirov weke têgînekê û hişmendiyekê wê kifş dike. Ev têgîn, li jîyanê dîzaynkirinê bi xwe re diafirêne. Estetism, adilandin a. Adilandin jî, rastkirin a. Rastkirin jî, têgîneka darêjkî ya. Li vir, dema ku mirov li wê darêjkiya rewşî binerê, divê ku mirov werêne ser ziman ku aliyekî wê yê ku mirov bi wê heyîna wê ya afirî a objeyî re ku bi têgîna estetismê re werêne ser ziman heya.

Têgîna estetismê, têgîneka ku bi wê têgîna darêjkê xwediyê afrînerîyeka têgînî ya bi şûbjeyî ya xwe re ya. Di vê çerçoveyê de mirov fahm dike ku têgîna estetismê, her wusa di wê çerçoveya afrînerîya xwe de heya.

Di nava jîyanê de xweza, her wusa xwediyê adilandinaka xwezayî ya bi xwe re ya. Her wusa, di nava xwezayê de, her tiştê ku heya, mirov dema ku li wê objeyî ya wê ya hebûnî nerî, mirov wê darêjkîya wê ya ku heya bi wê re kifş dike. Ew darêjkîtî bi tiştî û ankû bi hebûnî li berçav ′heya′ û mirov wê dibînê, êdî ji wê têgîna wê ya şûbjeyî jî mirov kifş dike. Mirov, bi wê têgîna wê ya şûbjeyî êdî wê darêjkê dikarê wê afrînerîya wê werêne ser ziman.

Di aslê xwe de afirînerîya darêjkê bi hişmendî bûyîna şûbjeyê re dibê. Ya ku wê têgîna wê dike ku were afirandin ev a. Her tişta ku di derbarê wê de têgîna hişmendî afirîya, êdî temenê wê yê afirandinê bi wê re heya. Her wusa, li vir, dema ku em li têgîna estetismê dihizirin, em kifş dikin hişmendî, weke temen, hîm û rastîyek bingihînî a afrîner a. Her wusa, têgîna şûbjeyî, bi hizirkirina xwe ya bi hişmendî re êdî dikarê bi afirêne. Em dema ku li hizirkirinê dihizirin, em di vê temenê de bi rastîyekê re wê kifş dikin. Hizirkirin, di dema hizirkirinê de bi ram(çerçova)a. Ev rama wê, êdî mirov dema ku wê kifş dike, her wusa êdî wê di têgîna darêjkî de biafirêne.

Her hizirkirin, bi xwe re teybetmendîyeka wê ya afrînerî heya. Em dema ku bahse hizirkirinê bikin, em divê ku pêşî ji vê aliyê ve wê kifş bikin. Bi hizirkirinê, mirov dihizirê û bi wê hizirkirinê de bineterekê dinivisîne. Ew binetera ku hatî nivîsandin, êdî wê nivîseka bi çerçova bê. Di vê çerçoveyê de ew nivîs piştî ku hat nivîsandin û pê de, êdî ew darêjkeka wê ya ku em bi wê çerçoveya hebûna wê nivîse re kifş bikin. Ew nivîs, bi hebûna xwe re têgîneka ku hatî afirandin a. Her wusa, di jîyanê de ti tiştê ku mirov bi wê şenber bike jî tûna ya. Em tenê dikarin wê bi wê re şenber bikin û werênina ser ziman. Ev şenber kirin û pê de, wê êdî hişmendîya wê nivîsê a di derbarê wê de di mejiyê mirov de

biafirêne. Piştî ku ev hat û afirî û pê de, wê êdî nivîs, weke ´hebûnekê´ û ankû ´tştekî´ ku di jîyanê de wê kifş bikin.

Têgîna şûbjeyê ya nivîsê, wê di derbarê nivîsê de têgînekê bide me. Lê pêşî berî ku em wê têgîna di derbarê wê de fahm bikim, em wê têgîna darêjkî ya çerçoveya hundurînî a nivîsê fahm bikin. Ew têgîn, wê bi hişmendîya wê re, wê li gorî navaroka wê salixkirina wê ya bi tiştî wê were kirin. Wê dîzaynkirin, wê li gorî wê hundurînî were kirin. Her wusa, ev jî, wê êdî weke rengekî hizirkirinê ji wê binetere nivîskî ku bi ber tiştîtîyê ve çûyinê dihêne ser ziman a. Ev, têgîna pêşî a nivîskî, weke têgîneka razber a nivîskî ya. Lê bi hişmendîya wê re di mejî de şenberîyek wê bi wê re biafirê. Ew şenberî û ankû ew têgîna hişmendî a di di derbarê navaroka wê nivîsê bi hebûna wê re jî bike weke ´tiştekî´ û ankû weke heberîyeka madayî. Ev jî, wê were dîtin. Lê bi heyînîya wê ya nivîskî re nivîs, çend ku weke ´tiştekî´ hebe jî, lê weke têgînek nivîskî jî, razberîyek wê ya heyberî a li berçav wê hebe. Em li vir, dikarin rewşa nivîsê, weke têgînek razber a şenber jî werênina ser ziman.

Têgîna nivîsê, wê nivîsê, di mejiyê me de, di derbarê wê de têgînekê biafirêne. Ev têgîna di derbarê wê de ya şûbjeyî, wê nivîsê weke tiştekî bide şenber kirin. Lê dîsa ew razberîya nivîskî, wê weke sawêr(xiyal)ekî wê li ser wê re hebe. Çendî ku mirov li wê nivîsê hizirî, wê ew razberîya wê ya ku di mejî de şenber dibe wê xwe bide dîyar kirin. Ev dîyarkirin di mejî de, wê bi şûbjeya têgînî ya di derbarê nivîsê de wê xwe werêne ser ziman. Lê ev jî, wê weke aliyekî giring ku mirov dikarê werêne ser ziman. Têgîna şûbjeyî ya di derbarê nivîsê de, nivîsê dike têgînek şenber ya nivîskî. Lê ev nivîs jî, bi hizirkirinê hatîya bidest xistin. Ev nivîs, bi hizirkirinê bi çerçova kirinê têgînê re, wê ew were bi pêşnûma kirin. Pêşnûma kirina nivîsê, weke têgînek şenber mirov wê dihêne ser ziman. Her wusa, ew nivîs, ku êdî bi navaroka wê re, nivîsek çandî û ankû hûnerî û hwd bê, wê li gorî wî lîstika ku hatî kirin û ankû afirandina ku hatkirin, wê weke afirandina ji wê bê. Her wusa, ew tişta ku di jîyanê de bi dest hat girtin, wê çend ku ji wê nivîsê jî bê, di kirinê de wê piştre, bi xwe re têgînekê werêne li holê. Hizirkirina di derbarê wê lîstik û ankû tişta ku ji wê nivîsê hat afirandin, wê bi nerîna li wê re wê hizirkirina di derbarê wê de biafirê.

Têgîna nivîskî, wê bi çerçoveya wê ya nivîskî re wê şenber û ´mayîdatîyeka´ wê ya demî wê hebe. Lê ev nivîs, tenê bi wê çerçoveya xwe ya ku ji wê bûya re heya. Çend ku weke hizreka ku di dema nivîsandina wê de ji nerînekê û ankû ji tiştekî payxam bûbê jî, wê piştî

wê nivîsandina wê re wele binetereke bi serê xwe ku em dikarin wê tenê bi wê re werênina ser ziman bê. Ne nerîn, dikarê du caran weke hevdû bibînê û ne jî dikarê di heman rewşan de bibînê. Gûharîna bi demê re, her tişta ku afirî razber dike. Li vir, dema ku em gûharîna bi demê re li berçav bigrin, em bi wê re dema ku wê razberîya hildina li dest, emê wê baştir fahm bikin.

Li vir, bi çend gotinan jî bê, divê ku mirov bahse gûharîna bi demê re bike. Gûharîna bi demê re a dayîmî, têgîna şenber a demkî bi buhurîna ji demê li demê re razber dike. Her wusa, fektora demê, giringa ku mirov li vir wê hilde li dest û werêne ser ziman. Gûharîn, bi demê re çawa ya? Ew jî, weha ya ku buhurîna bi demê re wê binetera nivîskî û ankû tişta ku afirî, têkiliya wê ya bi demê re ku heya razber dike. Ev jî, wê êdî di çerçoveya têgînek ´ne dîyar´ de wê bi demê re xwe bide dîyar kirin. Her wusa têgîna gûharînê li vir, bi buhurîna ji demê li demê re wê razberkirinê biafirêne.

Di demê de ew têgîna nivîsê, bi darêjkî, dema ku mirov li wê dihizirê, weke binetereka ku bi hebûna xwe re şenber lê ku bi demê re razber a, mirov wê kifş dike. Li vir, rastîya demê, dema ku mirov li wê dihizirê, ew nivîs û ankû hebûn, wê weke ku dervî demê hebe wê di kêlîkekê de di mejiyê mirov de xwe bide dîyarkirin. Lê ew tişt û ankû hebûn, wê bi pêvajoyên xwe yên jîyankirinê re hebe. Têgîna demê, gûharînê weke destûreka nebe nabê dide dîyarkirin. Her wusa, dema ku mirov nikaribê, pêşîya pîrbûnê û ankû kalbûna zindiya bigrê, mirov wê nikaribê wê destûra têgîna demkî red bike. Her wusa, her tişt, di vê çerçoveyê de wê hebe. Fektora demê, bi heyîna jîyanî re şûbjeyeka wê ya objeyî heya. Ev jî, bi demê re ya.

Têgîna gûharîna bi demê re dikarê fahmeka giring bide me. Ev fahm jî, dikarê me têgîna razber a nivîsê jî, bi me re bide fahm kirin. Her wusa, ev têgîna nivîsê, ku mirov ew bi hizirkirinê ew di mejiyê xwe de afirandîya û rijandiya ser rûpel, wê di derbarê wê de fahmekê bi me re bi hebûna wê re bide çêkirin. Her wusa, ya ku razberîyê di derbarê nivîsê de diparêzê jî, fektora demê ya. Her wusa, têgîna demê û têgîna guharînê, weke du têgînên ku em divê ku bi hevdû re li wan bihizirin û wan fahm bikin. Ev herdû têgîn giring in ku mirov divê ku wan baş fahm bike na.

Gûharîn, bi dulingan dibe. Yek, bi hebûna demê re ku di buhurê ji demê li demê ya. Lingê duyemîn jî, bi hebûna tiştê re ya. Pêvajoyên bûyîn, mazinbûn, gihabûn, balixbûn û pîrbûn ên bi hebûna tiştê û hwd re, ew lingê duyemin dihê ser ziman. Dîtbarîya demê, her wusa, wê rewşa

wê ya ku em bi van rewşan re kifş dikin re di temenê têgîna gûharînê de dihêne li holê. Her wusa têgîna gûharînê ên weke bûyîn, mazinbûn, gihabûn, balixbûn û pîrbûn ên bi hebûna tiştê û hwd re wê dîtbarîya demê bi xwe re şenber jî dikin. Lê ew dîtbarîya wê, hertimî weke destûreka wê ya heyînî heya ku mirov divê ku wê werêne ser ziman a. Weke hijmartina bi demê re û her wusa pêvajoyên bi demê re ji destpêkê û heta dawiyê ên weke bûyîn, mazinbûn, gihabûn, balixbûn û pîrbûn ên bi hebûna tiştê û hwd re ev destûrîya demî xwe dide dîyarkirin.

Em li vir, dema ku bi demê re gûharînê dihênina ser ziman, her wusa bi gûharînê re jî demê dihênina ser ziman. Weke ku çawa ku heta ku dem heya wê gûharîn hebe, bi heman rengî heta ku gûharîn hebe, wê dem jî hebe. Ev herdû, weke du têgînên ku dîsa bi demê re weke laşekî ku hena na. Mirov, bi demê re gûharînê dibînê û bi gûharînê re jî demê kifş dike. Bi hevdû ve girêdayî na. Gûharîn û dem, di vê çerçoveyê de dema ku mirov li wan dihizirê, mirov  bi hevdû re wan kifş dike. Her wusa, li gorî nerîneka ku em wê kifş dikin, weke laşekî bi gîyane xwe re ku heya ya. Her wusa, mirov vê yekê bi wê re bi dîyarî dibînê û kifş dike. Dem û heyîna demê, mirov wê çawa kifş dike? Mirov bi gûharînê re heyîn û hebûna demê kifş dike û salix dike. Her wusa bi heman rengî, bi demê re gûharînê dijî. Dem, weke destûreka ku bi her tiştî re di buhurê ya. Em vê yekê, di serî de divê ku kifş bikin a. ..

Dema ku mirov bahse demê bike, mirov divê ku vê yekê jî fahm bike ku bûyîn û hebûnên tevgerî ên di demê de şenberîyekê bi pêvajoyên xwe yên jîyankirinê re û bi demê re didina nîşandin. Gûharîn di hundurê demê de dibê. Her wusa, salixkirina wê ya di hundurê demê de jî, weke aliyekî din ê ku mirov divê ku bi teybetî li ser bisekinê ya. Di hundurê demê de salixkirina tiştê a bi demê re dema ku mirov li wê dihizirê, mirov bi wê re pêvajoyên ku bi wê re buhûrîna bi wan re, buhûrîna demê kifş dike. Têkiliya madeyê û demê ya bi hevdû re bi jîyandina bi hevdû re heya. Lê tişt, ew pêvajoyên wê yên ku bi demê re di buhûrînê jî, di çerçoveya heyîn û hebûna xwe de di buhurêne. Gûharîn, di vê çerçoveyê de çendî ku di hundûrê demê de jî bê, serxwebûnîyeka wê ya bi xwe bixwe re jî heya. Ev jî, êdî têkiliya demê û madeyê, dike ku mirov bi serê wê re kifş bike.

Dem, dema ku mirov li wê dihizirê, weke têgînaka ku ´dayîmî heya´, mirov di mejîyê xwe de di derbarê wê de digihijê têgînekê. Dem, di vê çerçoveyê de bi vê têgînê re têgînaka pêwîstînî bi xwe re di mejiyê mirov de salix dike. Êdî dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa ev têgîn dihê

berbîra me. Têgîna sihêrbaziyê(efsûnkarîyê) têgînek xweşik li vir bo baş fahmkirina rastîya demê ya di vê çerçoveya têgînîya pêwîstînîyê de hanîya ser ziman. Ew jî, ´´vegerîna li demê´ û ankû ´bi şûn ve vegerandina demê´ û hwd a. Di çerçoveyê de dema ku li demê dihizirê, her wusa, weke ku dema ku bi gotinê re bibêje ku ´bila ew kêlîka ku jîyan bûyî, vegerihê sêhra xwe ya berê´, wê demê vegerihê sêhra berê û ew kêlîka ku jîyanbûyî, weke ku jîyan nebûyî wê lê werê. Li dûv vê têgînê, ew têgîn jî, dihê kifşkirin di mejî de ku ´ew dema ku mirov ji wê li şûn vegerîya û weke ku me ew nejîya ya, êdî weke ku hîç ne hatibê jîyandin wê lê werêne, di mejî de. Di vê çerçoveyê de ew têgîn, êdî wê werê dîtin. Ku daraza gotinê a bi hikmî heba û dema ku gotiba ´bibe!´ û ku bûba, wê hingî di vê çerçoveyê de ev têgîn hatiba piştrast kirin. Lê ev têgîn, di vê çerçoveyê de, dema ku mirov li vir wê her wusa werêne ser ziman bi gotinê re, wê tenê weke darazaka bi gotinê re bimêne.

Têgîna demê, li vir dema ku mirov li wê dihizirê, di vê çerçoveyê de mirov wê rastiyê bi wê re kifş dike ku dem weke rastîyekê heya. Pêvajoyên jîyankirinê ên buhurînê tabîî demê û destûra demê na.

Têgîna gûharînê, li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, têgînek din jî di serê mirov de diafirê. Ew jî, ew a ku gûharîn, rastîya demê salix dike û ankû dem wê rastîya gûharînê bi xwe re dihêne? Dema dema ku li demê dihizirin, em vê pirsê bi herdû aliyan re bi bersiv dikin. Lê çendî ku bi hevdû re girêdayî salixkirina wan dibê jî, weke dîmenekî duyemin, wê rastîyaka wan ya xwe bixwe re jî wê hebe. Ev jî, weke rastîyekê divê ku mirov wê werêne ser ziman. Gûharîna bi madeyê re, wê tenê weke têgînekê nemêne. Her wusa, bi gûharînên bi madeyê re salixkirinekê bi xwe re bide çêkirin. Ev salixkirin, êdî wê weke piştî salixkirinê û pê de, wê tenê weke gûharînek bi madeyê re bimêne. Lê ew gûharîn, di hundurê demekê bûya. Ya ku êdî bi têgînî dihê kifşkirin ev a.

Têgîna demê, salixkirina wê ya bi gûharînê re wê madeyê, bi pêvajoyên wê ên gûharîna wê ya bi demê re werêne ser ziman. Her wusa, dema ku em têgîna gûharîna madeyê, ji têgîna demê cuda hildina li dest, wê çaxê, mirov wê karibê ku bibêje ku gûharîn, ne tabîî demê ya. Yanî, di demê de mirov dikarê wê gûharînê tenê ji demê û têgîna wê qût werêne ser ziman. Li vir, têgîna ku dihê li holê û dîtin, ew a ku têgîna gûharînê a di hundurê demê de bi hişkirina wê re gûharîn xwe ji demê weke ku cûda bide nîşandin, wê rewşekê bide li berçav. Lê ew rastîya wê ya gûharînî a di hundurê demê de jî, wê weke xwe bimêne. Li vir, du birayên ku di heman rojê de ku ji dayikekê hatina dunyê û ku yek li

deverekê dunyê mazin bibe û yek li devera din a dunyê ku heya wan ji hevdû tûna ku mazin bibin jî, wê dem weke pêvajoyên jîyankirinê bo wan buhûrînar bê. Lê wê di jîyane xwe de li gorî şert û mercên demê wê pêvajoyên ji hevdû cuda wê bijîn. Ew pêvajoyên cuda ku wê dijîn jî, wê cuda jî bide nîşandin. Li vir, bi demê re dema ku mirov bahse gûharînê dike, mirov dibînê ku cudahîya gûharînê ya bi demê re li gorî mekanê cudahîya wê dihê dîtin. Şert û merc û mekan, di wê rastîyê de weyn dileyizin.

Gûharîna tiştê a dijîyanê de nîşanakaka jîyanê bixwe jî ya. Ev dide nîşandin ku her tişta ku di jîyanê de bi wê re gûharîn heya. Lê her tişta ku di jîyanê de jî ya, xwedîyê wesifên xwe yên jîyanî ya. Têgîna gûharînê, li vir, dema ku em bi vê gotina jîyanê de werêna ser ziman, em bi rastîya têgîna gûharînê re wê dînamisma ku kifş dikin ku bi wê heya, emê bi wê re heyîna pêvajoyên gûharînê kifş bikin. Dînamism, weke fektoreka giring ya di hîmê têgîna gûharînê de ya bi demê re. Her wusa, dînamism, rastîyeka jîyankirinê jî ya.

Têgîna demê, li vir, dema ku em bi wê re li dînamismê dihizirin, em dibînin ku di hundurê demê de bi her tiştê ku ´heya´ re ew dînamism heya. Yanî, dînamism, weke destûreka heyînê ya hebûnî ya di jîyanê de ya. Dînamism, reng û rastîya gûharînê ya. Her wusa, ew gûharîna di nava demê de ku bi jîyankirinê re heya, salix dike.

Di jîyanê de dînamisma zindiyî a ku heya, wê weke têgîneka di temenê têgîna gûharîna de jî bê. Li vir, dema ku em gûharînê hewl didin ku fahm bikin, bi dînamismê re tiştê mirov dihilde li dest û bi wê dike ku fahm bike.

Dem, dema ku gûharînê, em di hundurê wê de kifş dikin, êdî em demê jî weke destûreka giştî ya serdest wê herê dikin. Têgînek bi vê rengê dihê berbîra me. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku çendî ku mirov hewl dide ku têgîna demê bi gûharînê re fahm bikin jî, her wusa dervî wê gûharînê jî, bi demê re fahm dike. Lê li vir, em nikarin tenê gûharînê bi demê ve girêdayî werêne ser ziman. Gûharîn bi tiştê re heya. Yanî bi madeyê re heya. Dema ku rastî ev bê, wê çaxê, divê ku mirov êdî bi wê tiştê re li wê bihizirê. Ya ku wê gûharîna bi tiştê re bide dîyarkirin, wê şert û mercên tiştê jî bin di hundurê demê de.

Li vir, têgîna tiştê, giringa ku mirov wê kifş bike û fahm bike, her wusa têgîna gûharînê ku di çerçoveya tiştê de heya, wê bi tiştê re ew gûharîn bibe. Li vir ew dînamism bi tiştê re heya. Tişt, heta ku heya wê ew

dînamisma wê jî hebe. Dinamisma wê, nîşanaka heyîna wê ya di jîyanê de jî ya. Her tişta di jîyanê de dînamisma wê ya jîyanî heya.

Têgîna tiştê, xwe li vir bi xwe re salix dike. Tişt, dema ku bi têgîna ´heya´ re hat dîtin û kifşkirin, êdî bi wê hebûna xwe ya ku heya re êdî ew dihê ser ziman. Li vir, tişt weke rastîyekê divê ku mirov wê werêne ser ziman ku xwediyê heyînekê ya. Tişt, di demê de heya. Di hundurê de ´heya û tûna ya´. Yanî, di demekê de heya û di demekê piştre de jî tûna ya. Di vê çerçoveyê de têgîna tiştê ya di hundurê demê de bi vê rengê heya. Dînamism, têgîna gûharînê, ji têgînekê derdixe û dike şenberîyek jîyanî. Ev jî, êdî gûharînê bi xwe re weke rastîyaka ku mirov dikarê wê şenber bike dihêne li berçavên me.

Li vir, dema ku mirov hewl bide ku gûharînê bi şenberî fahm bike ku divê ku mirov wê destûreka wê ya jîyanî dinamismê fahm bike. Bi dînamismê re gûharîn û ankû têgîna gûharînê xwe digihêne heyberîyek şenber ya mirov dikarê mudahaleyê lê bike ya. Di nava kifşkirina atomê de qatkên wê yên ku tên kifşkirin, dema ku mirov li wan dihizirê, mirov vê rastiyê kifş dike. Di hundurê atomê de qatkên weke elektronê, netronê û protonê û dendika wê û hwd, her wusa, dema ku mirov li wê dihizirê, weke ahengîyeka wê heya. Lê dema ku bi ´îyonkirinê´ hwd re mudahale lê hat kirin, wê ew ´dinamism´a wê were çêkirin. Yanî li vir, ew dînamism, bi tiştê re ku heya, di çerçoveya tiştê de dihê salixkirin û dihê afirandin. Ev jî, têgîneka gûharînî ya bi tiştê re di mejiyê mirov de bi xwe re salix dike. Têgîna gûharînê, bi hebûna dînamismê re xwe di jîyanê de didê li der. Li vir, têgîna gûharînê, weke têgîneka jîyanî ya dinamismî ya. Dinamism, heyîna jîyanê bi jîyandina wê re û her wusa bi heyîn û hebûna wê bixwe re dike temen û hîmê xwe de. Di vê çerçoveyê de, mirov divê ku wê jî werêne ser ziman ku têgîna dinamismê, wê weke heyîn û hebûna jîyanî bê. Têkiliya heyîna dinamismê û jîyanê bi hevdû re di çerçoveya jîyanê de bi hevdû re heya. Her wusa, ew gûharîna jîyanê jî, bi wê têkiliya jîyan û dînamisma wê re heya. Dema ku mirov bahse gûharîna jîyanî bike, divê ku mirov têgîna dînamîsmê weke têgînek hîmî li pêşîyê dêne û li ser wê re hewl bide ku werêne ser ziman. Li ser wê re jî jîyanê jî salix bike. Her wusa, tevgerîya dinamismî, di vê çerçoveyê de tevgerîyek jîyanî ya. Jîyanê, li vir, mirov dikarê bi du rengan werêne ser ziman. Rengek bi heyîna tiştê re ku heya ya. Rengê din ê duyemin jî, bi heyîna zindiyî re ya. Ev jî, bi wê re êdî jîyankirinê xwe re pêş dixe. Piştre ew hişmendîya jîyanê, wê bi wê zinditiiya zindiyî re biafirê.

Hişmendîya jîyanê, wê bi zindiyê re biafirê. Hişmendî, wê karîna gûharînê bide çêkirin. Hişmendî, di temenê gûharandin û afirandinê de jî ya. Dema ku mirov hewl bide ku li vir, hişmendiyê weke fektoreka temen ya gûharînê werêêne ser ziman, wê hingî bi zinditiya jîyanî re bê. Di xwezayê de jîyan, bi heyîna xwe re bi reng û adilandinaka xwe re heya. Ew jî, bi xwe re afirîya. Têgîna li ser wê afirandina xwezayê a adilandî, hertimî bûya mijara nîqaşên felsefîkî jî. Xweza, wê dîzaynkirina xwe ji kûderê girtîya? Ev weke pirseka ku hertimî di keviya mejiyê mirov de heyîna xwe parastîya.

Di nava naqaşên felsefeyê de hizra adilandinê, weke têgînekê îdealismî wê xwe werêne ser ziman. Li vir, dema ku em bahse wê têgînê bikin, divê ku mirov li vir, hinekî din jî bi têgîna adilandinê re kûr û dûr herê. Li vir, têgîna adilandinê, weke têgîneka xwezayî ku pêşketîya, bi xwezayê re heya. Ev jî, piştî ku hiş pêşket û pê de êdî li ser wê serî hat wastandin ku ew were fahmkirin ku ew adilandin bi çi têgînê bûya. Ev têgîn, wê têgîneka pirr felîte(dînamîk) bê. Wê mejî, bi xwe re pirr zêde bide hizirandin.

Ew têgîna di hîmê wê adilandina xwezayî de ku heya, ji kûve tê, li ser wê serî dihê wastandin. Ev hizir û ankû lêgerîn, wê hizirkirina bihişî, di nava xwe bixwe de jî bike nava dînamismekê de. Mirov bi hizra xwe de dixwezê ku wê adilandinê û têgîna di hîmê wê de fahm bike. Bo vê yekê, serî pirr li ser wê diwastêne. Têgîna felsefîkî a ku bi hişkirinê re afirîya ya bi rengê ´ her adilandin, mirov wê bi aqilê xwe re dike´ re jî, dema ku mirov wê çerçoveyê de lê dihizirê, êdî li wê adilandina xwezayî û yê ku li piştê ya û ew kirîya li wê dihê lêgerîn. Ev jî, wê weke têgîneka hizirkî ku wê di temenê wê lêgerîn û lêkolîna hizirkî de bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku têgîna adilandinê, bi hiş re pêş dikeve. Hiş, wê hiş dike ku biadilêne. Lê ev hizra adilandinê, wê bi demê re jî, êdî li darêjka xwe ya navendî jî bigerihê. Li vir, weke têgînekê têgîna adilandinê di hundurê de ku dembuhûr a, wê bi tiştê û ankû madeyê re di hundurê de bibe. Her tişt, bi heyîna xwe re xwediyê dîzayn û ankû adilandînîyeka bi xwe re jî ya. Em divê ku vê yekê pêşî fahm bikin. Darêjka tiştê, her wusa bi hişkirina di derbarê wê de ya şûbjeyî re vê hizrê didê me. Têgîna heyîn û hebûnî ya tiştê ku em bi şîrove(dahûr)yê re werêna ser ziman a. Lê têgîna wê ya şûbjeyî jî, wê weke têgîneka ´rengê´ wê bê ku wê were kifşkirin bê. Li vir, di navaroka vê têgînê de darêjka tiştê heya.

Darêjka tiştê, her wusa bi adilandina xwe ya bi darêjkî re heya. Em dema ku vê yekê di serî de kifş bikin, w hingî bi têgîna adilandinê re me bi xwe re bigihêne têgînekê. Têgîna adilandî a xwezayê, her wusa weke refaranse têgîhiştî ya adilandî ya. Ev têgîna xwezayî, bi hişkirinê re hatîya bidest xistin. Ev hizirkirina wê têgîna adilandî ya xwezayê ku hatî têgihiştinkirin, wê weke têgînek şûbjeyî bê. Têgîna şûbjeyî, hertimî wê karînaka adilandinê bi xwe re biafirêne. Ev jî, ji rastî û teybetîya wê ya sereka ya.

Hizirkirina şûbjeyî, bi hizirkirinê re afirandinê ji xwe re dike hîm. Di jîyanê de dema ku mirov hizirî li tiştê, mirov wê bi wê têgîna ´tiştê´ re êdî têgîna wê ya çerçoveyî jî fahm bike. Her tişt, di mejîyê mirov de bi hizirkiirnê xwe ya şûbjeyî re afirandinê dike. Li vir, bi vir ve girêdayî, mirov dikarê vê yekê jî werêne ser ziman ku her tişta heyî, weke têgînekê jî di wê rastîya hizirkirinê de weke darêjkekê wê hebe. Ev, darêjk bi hizirkirinê re wê were kirin. Di têgîna û aqil de ´zanebûn´ di kurdî de ku weke gotinaka bi têgîna dahûrkirinê re rengê hizirkirinê dihêne ser ziman, her wusa bi heman rengî ´naskirin´ jî, dîsa bi heman rengî gotinaka ku nasîna wê bi şûbjeya wê bi mejiyê mirov re dike. Di temenê têgîna nasînê û ankû naskirinê de hişkirina şûbjeyî heya. Ev rengê hişkirinê, di derbarê wê darêjkê de mirov digihêne têgîna wê ya heyînî. Di aslê xwe de têgîna ´naskirinê´, wê weke têgînek şûbjeyî ya ku mirov dikarê wê têgîneka adilandinê jî werêne ser ziman jî bê. Karîna adilandinê, wê bi têgîna şûbjeyî ya hişî re bê. Em vê rastiyê di serî de divê ku ji bîr nekin û fahm bikin. Têgîna şûbjeyî, têgînek afrîner a.

Têgîna şûbjeyî, dema ku mirov li xwezayê û ankû tiştê dihizirê, mirov bi wê hişkiirna xwe re wê dike. Ew fahma me ya di derbarê de, ew têgîna me ya. Ev têgîn, weke hizirkirinê ku çendî ku dihê ber me jî, weke têgînek bi navarok û darêjk, mirov divê ku wê werêne ser ziman. Li ser vê rastiyê re mirov êdî hizirkirinê dike. Minaqe nivîsê û hişê di derbarê wê de û hizirkirina li ser wê re me li jor dabû bû. Her wusa, li vir, bi vir ve girêdayî mirov dikarê car din wê bibîr bike.

Bi têgîna naskirinê re mirov wê tişta ku mirov weke ´heyînekê´ ku li wê hizirî nas dike. Ew naskirin, weke hizrekê û ankû têgînekê, wê di mejiyê me de şenber bibe. Ev şenberî, wê bi têgînî bibe. Her wusa, çendî ku ew ku hizir û ankû têgîn ji wê tiştê ya jî bê, wê piştî hildana me ya bi mejî re, wê weke têgînek serbixwe jî wê hebe. Ev jî, wê êdî wê têgînê, weke têgînek şûbjeyî ya afrîner bike ku biafirêne. Her wusa,

teybetmendîya hizirkirinê, di temenê vê rastîyê de ya. Mejî, bi hizirkirinê re wê rastiyê bi xwe re diafirêne.

Têgîna hizirkirinê, weke têgînek şûbjeyî, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa wê weke têgîne afirîner jî wê hebe. Ev têgîna şûbjeyî ya afirîner, bi hizirkirinê re û bi çerçova re wê weke têgînek adilandî jî wê were ber dîtin û bîra mirov. Dema ku mirov bi bîrkirina xwe re li wê dihizirê, mirov wê rastîya adilandinî ya wê kifş dike. Ev rastîya têgînî ya adilandinî, weke têgînekê, wê bi mejî re çerçova kirina wê bibe.

Her çerçova kirin, wê weke afirandinaka darêjkî bê. Bi têgîna adilandinê a şûbjeyî re wê darêjk xwediyê afirandineka afirînerî jî bê. Darêjk, li vir, bi wê çerçova kirina bi bitêgînî re êdî şenberîya ku stand, wê li ser wê re afirandina li jîyanê jî bibe. Her têgîna tiştê bi çerçoveya. Her wusa, mirov dikarê bêje ku adilandî jî ya.

Têgîna darêjkê a şûbjeyî ya derbarê wê de vê rastiyê weke rastîyek têgînî dihêne ber me. Em dema ku vê rastiyê fahm dikin, em bi wê re bi wê têgîna bi çerçova ya afirandî êdî di hizirkirina xwe de bi çerçova dikin. Lê her çerçovakirina bi têgînî, ku çendî ku bi şûbjeyî jî bê, di temenê wê de girtinên me yê xêvî hena. Em divê ku vê yekê jî, baş fahm bikin. Dibê ku ew gotina gîyane nemir a zerdeşt, mirov li vir dikarê bi nav bike û bibîr bike. Mirov, çendî ku xwediyê temenekî di hundurê demê de jî bê, wê bi xêva mirovî re mirov bi demê re weke zindiyekî sermedî bê. Xêva mirov, ew rakendîtîya wê ya bi demê re ku didomê û heya, wê li ser wê re ew rewş hebe. Temenekî têgîna gîyanê ya bi gotina sermedî ku dihê ser ziman jî ev a. Xêva mirovî, têgînek bêdemî jî ya.

Têgîna adilandinê jî, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov divê ku werêne ser ziman ku bi wê re û her wusa di hîmê wê de ev têgînên xêvî hena. Her wusa, rewş û dîmenên ku mirov berê bi çavî dîtin û ankû bi rewş û rêyna din hildana mejiyê xwe re, ew jî, weke çerçoveyna demî ên têgînî na. Lê mejî, dema ku hizirkirinê dike, wan diadilandê. Ew têgîn, tenê, weke çerçoveyna hena. Mirov, wê bi sînorê wê re bê. Heta ku mirov dibnê, mirov wê hiş dike û bi têgîn dike. Ev jî, weke aliyekî din ê vê têgînê ya ku divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê ya. Lê hîskirinên mirov û hêstên mirov jî, weke gîyanna dervî demê ku dijîn, wê têgînna bi me re bidina hîskirin. Mirov, bi hêza hişê xwe re êdî wê bitêgîn dike. Hîskirinek û ankû xiyalkirinek, her wusa, di vê çerçoveyê de têgînna ku mirov divê ku bi hêst û hîskirinê re werêne ser ziman jî. Aliyekî wan ê bi vî rengî heya. Têgîna xewnê, giringa ku mirov li ser wê bisekinê. Xewn, çerçoveyek wê heya. Ew çerçova, çend ku ji gelek ´qatkên têgînan´ pêk

tê jî, mirov divê ku di çerçoveya adilandinek şûbjeyî de li wê bihizirê. Xewn, minaqe adilandinek şûbjeyî ya estetikî ya bêminaq a. Xewn, dîzaynek mejiyê me ya. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî di serî de kifş bike. Mejiyê me, wê adilandinê bi rastkirinekê(dîzaynkirinekê) dike. Ku em bahse minaqek şûbjeyî ya afirîner bikin, em minaqek ji xewnê baştir nabînin. Rastîya xewnê, ku mirov li ser wê dihizirê, mirov di temenê afirandin bûyîna wê de gelek têgînên ku bi bandûra wan re afirîya û hena dibînê. Ev têgîn hemû jî, bi hevdû re çerçoveya wê xewnê diafirênin. Xewn, piştî ku afirî û pê de, êdî çerçoveyek dîzaynkirî ya. Ev çerçova, xêva me bi mejiyê me re weke afrînerê wê ya. Ew xewna ku hat dîtin ku bi reng û dîtin û çerçoveya wê re were qaydkirin, wê were dîtin ku ew xewn bi hîm xwediyê têgînna girtî ku mejî ew dîzaynkirina na.

Xewn, weke têgîneka ku di temenê wê de gelek têgînên bi demê re ku mejiyê me girtina hena. Xewn, ew çerçoveya wê ya ku mirov li wê dihizirê, mirov dikarê bibêje ku xwemalîtîya wê heya. Xewn, têgînek adilandî ya xwemalî a mejî ya. Mirov, dikarê xewnê di vê çerçoveyê de weke têgîneka bi wl xwemalîya mejî re mirov dikarê wê werêne ser ziman.

Xewn, di dema ku mirov di razihê de mirov wê dibînê. Di dema xewnê de ku mirov wê xewnê dibînê jî, mejî di xwe pirr zêde di dinamismekê de ya. Tevgerîya di mejî de, pirr zêde heya. Ya ku wê tevgerîyê çê dike jî, ew çerçoveya xewnê ya. Xewn, weke ku mirov di xewnê de ya weke ku dervî hişê me ya. Lê di aslê xwe de, di hundurê mejiyê me de, di çerçoveya têgînaka ku mirov ew têgîhiştî ya.

Xewn, cudahîya wê ya ji xiyalê ew a ku weke ku ´dervî sînorê hişê me ya.´ Mirov, di wê dema ku razahî ya wê xewnê dibînê. Di wê çerçoveyê de xewn, giringîya wê bi adilandînîya wê re mirov divê ku wê fahm bike. Her wusa, karîna çekirina adilandiniyê ya mejî, bi xewnê re mirov dikarê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê xewnê, weke teybetîyaka afirandina şûbjeya mejî mirov jî bihasibêne û werêne ser ziman.

Mirov dikarê xewnê, ji hin aliyna ve weke şûbjeya mejî jî, werêne ser ziman. Xewn, bi afirandina mejî re diafirê. Her wusa, mejî, li wê hizirê, çerçoveya wê çêkiriya û bi wê re ew hanîna li holê. Refaransên ku di temenê afirandina wê xewnê de ku çi bin bila bibin, lê divê ku mirov vê yekê ji vê aliyê ve weke têybetîyek afrîner a şûbjeyî ya hizirkirina mejî jî werêne ser ziman.

Her wusa, xewn, çend ku car bi car di jîyane xwe de me hanîya ser ziman û gotîya ku rengekî ´xiyalkirinê´ ya jî, lê li vir, mirov nikarê bi tememî bi wê re werêne ser ziman. Lê di çerçoveya hizirkirin û afirandina bi mejî re weke şûbjeyek xiyalî mirov dikarê xewnê werêne ser ziman. Lê ji wê zêdetirî, mirov dikarê di xewnê de bibînê di çerçoveya wê pêşnûma, çerçova, têgînên ku di temenê wê de ku wê diafirênin.

Li vir, dema ku em bahse xiyalê bikin, divê ku mirov, bi şûbjeya mejî re werêne ser ziman. Xiyalkirin, rengekî her li berçav ê şenber ê ku şûbjeyî yê hizirkirinê ya. Hizirkirin, bi xiyalkirinê re dest pê dike. Xewn, piştre bi xiyalkirinê re dest pê dike. Xiyalkirin, wê di temenê dîtine me de bê. Her wusa, xiyalkirin, ku em ji destpêka wê ve hildina li dest, mirov dikarê weke destpêkek afirînerî, ku piştî xêva me bidest girtinê kir û pê de ku pêş dikeve jî, werêne ser ziman. Her wusa, xiyal, di vê çerçoveyê de, şûbjeyek zindiyê ya bihiş ya herî giring a. Mirov, dema ku xiyal dike, têgînên ku di temenê wê xiyalkirinê de na, ew jî, bi dîtin û dîmenên ku ji jîyanê girtina na. Lê mejî, wan bi ji şîrovekirinê re dihêne li holê. Em çendî ku nikaribin xiyalkirinê ji dîtin û dîmenên hatina girtin cûda şîrove bikin, bi heman reng em nikarin xiyalkirinê bi dîtin û dîmenên ku mirov wan dibînê re jî werêne ser ziman. Yanî, wateya vê gotinê ew a ku pêşî bi dîtin û dîmenan re girtin dibê. Mejî, wan şîrove dike. Piştre jî mejî ji wê, hizirkirinê pêş dixe. Piştî wê hizirkirinê pêşxistina wê, wê êdî afirandina bi wê hizirkirinê bi şîroveyên mejî re wê bibin. Ev şîrove, çerçova, pêşnûma û darêjka wan bi wê çerçoveya wan re heya. Xiyalkirin, vê bi vî rengî, wek rengekî hizirkirinê jî bê. Mirov dikarê, xiyalkirinê weke rengekî hizirkirinê jî werêne ser ziman. Serdemên mitolojiyê, ev serdemên bi xiyalkirinê ku pêşketina na. Her wusa, bi wan xiyalkirinan, çi tefsîr û tefkîr hatina çêkirin û kirin, wê di jîyanê de hewl bê dayîn ku werina bi laşkirin. Mirovê ku serê wî serê şêrekî ya, şêrê ku baskê eyloyekî lê hena ku dikarê bifirê, haspê ku bi nikilê eyloyekî ya û parr(bask)ên wî hena, mirovê ku bi bask ku dikarê bifirê û hwd, çend ji wan minaqên ku mirov dikarê werêne ser ziman in. Ev, rewş û gelek rewşên din ên mitolojîkî ku mirov dikarê li vir werêne ser ziman, rewşna bi hizirkirinê hatina adilandin in. Di temenê bi wê rengê adilandinê de jî, çi têgî n heya? Ew têgîn heya ku bi xosletên ku hatina têgihiştin re hewl hatîya dayîn ku levkirinekê bi wê adilandinê re li ser xosletan re bidina çêkirin. Ji xwe her adilandin û ankû dîzaynkirin, bi têgîna levkirinê û levhanînê dihê çêkirin. Têgîna levkirinê û levhanî, weke têgînek

adilandinê ya estetîkî ya ku mirov divê ku wê bi teybetî hilde li dest û fahm bike ya. Bi wê re jî, bi têgînê werêne ser ziman.

Li vir, dema ku levkirin li ser levkirin û levhanînê re bê, wê çaxê, mirov dikarê bipirsê ku çi ya ya ku hatî levkirin û levhanîn? Her wusa, li gorî çi xwestekê dihê levkirin. Her wusa, dema ku em di asta zanebûnê de werênina ser ziman, di temenê têgîna levkirinê û levhanînê de xwestek heya. Ev jî, weke aliyekî din a. Xwestek jî, ya ku mirov bi têgînî ji xwe re rast dîtîya. Li çkirin û xwekirina cilan, avakirina malan û di wan de bicihbûn û jîyankirin û hwd, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Têgîna levkirinê û levhanînê, wê di nava jîyanê de weke têgînek şûbjeyî ya ku mirov divê ku wê bi teybetî kifşbike û li ser wê bisekinê ya. Di aslê xwe de têgîna levkirinê û levhanînê, weke têgînna estetismê ên adilandinê ên afrîner in. Her wusa, têgîna estetismê, ji vê yekê mirov dikarê gav biavêjê û wê weke têgînek afrîner ya şûbjeyî jî werêne ser ziman.

Têgîna levkirinê û levhanînê, wê li ser xoslet û teybetîyan re wê were kirin. Ev jî, di temenê wê de hiş heya. Têgîn heya. Fahmkirin heya. Naskirin heya. Fahmkirin, bi têgîna dahûrî(analitikî) re ku mirov fahm dike dihêne ser ziman. Lê Naskirin, fahmkirineka şûbjeyî ya ´sentetîkî´ ya. Divê ku mirov vê yekê jî, li vir di serî de werêne ser ziman. Naskirin, têgîneka şûbjeyî ya. Naskirin, di temen û hîmê wê de hişkirin heya. Di jîyane asayî de, dema ku kurdên berê digot ku ”.. ew ne hat bîra min”, ”... Ez ne di farqê de bûm”, ”... li ser zimanê min bû ku ez wê bênima bîra xwe. ..” û hwd, weke têgînna şûbjeyî ên ku mirov dikarê bi têgîna naskirinê re werênina ser ziman. Têgîna naskirinê, her wusa, weke têgînek şûbjeyî ku mirov divê ku wê bi têgîna hizirkirinê ya hizrî re werêne ser ziman a. Naskirin, di farqê de bûn û di hişkirinê de bûn a.

Em dema ku her wusa têgîna naskirinê dihênina berbîra xwe, li vir, xiyalkirina me dihê berbîra me. Di serdemên mitolojiyê de ku weke serdemna di bin kifşkarîya xiyalê de pêş dikevin bin, wê têgîna naskirinê di hîmê wê kifşkarîya wê de bê. Her wusa, her aferînderîyên mitolojikî, wê bi têgînekê bin. Ew aferînderî, çend ku weke weke ´zindiyna dijîn´ jî bin, wê bi aqil bin û bihizirin. Ev jî, wê êdî weke şûbjeya wan aferînderîyan bin. Her aferînderî, piştî ku salixkirina wê bû, sifat stand û her wusa bi hebûn bû, wê şûbjeya wê biafirê. Ev jî, wê weke afirandinaka hizirkirinî bê.

Têgîna şûbjeyî, her wusa, piştî ku afirî bû û pê de, êdî mirov dizanê ku di hîmê wê de objetîyek heya. Her wusa her têgîna şûbjeyî li ser têgînek objeyî re diafirê û pêş dikeve. Têgîna objeyî, li vir weke têgînek ku li ser wê re pirr hizirkirin hatîya kirin. Gelek hizirvanên ku weke ´filosof´ hizirîna, li ser wê ´têgîna objeyî´ û şenberîya wê û ne şenberîya wê hizirî na. Her wusa, salixkirina wê ´hebûna wê´ ya heyînî, weke mijaraka hizirkirinê bûya. Her tişta bi hizirkirinê re ku weke têgînekê ya, wê ´tiştê´ li ser têgîna ´darêjkê´ re salixkirina wê ya heyberî bike. Têgîna objeyî, li jîyanê, tişta ku ez dibînin, destlêdidim û ji wê sûd digirim a. Minaqe sêvekê mirov dikarê bide. Mirov dirajihê sêv, destlê dide, bêhna wê dike û wê dibînê. Ev sêv, dema ku mirov van kirina bi wê re dike, mirov bi wê re têdigihê ku ew heya. Ew hebûna wê sêv, ne hebûnek mayînda ya. Em ne mayîndabûna wê, dike ku ew weke têgînek objeyî a bi demê re ku afirî ku mirov wê bibînê. ..

Sêv, piştî ku tûnabû û ji berçav çû, wê bi têgînî ew hizra wê ya ku me bi zêhnê xwe re hildayî wê bimêne. Ya ku wê, weke heyîna sêvê ya objeyî bê, wê ev bê. Objetîya vê têgîna hizrî ji kûderê tê? Ji wê darêjkîya wê ya ku hatî têgîhkirin tê. Ew dîzayna wê ya adilandî ya weke sêvekê wê di mejîyê me de wê hebe. Ew navê ´sêvê´, wê weke navê ´sêvan´ bê. Yanî, dema ku mirov bahse ´sêvê´ kir û pê de, wê sêv werina bîra me. Ev di mejiyê me de bi wê dîzayna wê ya adilandî re heya. Em li ser wê têgînê re wê dibêjin. Têgîna objeyî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê werêne ser ziman ku ew darêjka wê ya salixkirî, wê hîmê wê bê. Li vir, em bi hizirkirinê re li wê sêvê dihizirin, wê di serê xwe de diafirênin, her wusa mirov dikarê ku bi naqşkirinê wê sêvê weke wê li ser paç çê bike. Ev, têgînek şûbjeyî ya hatî objekirin a. Di vê çerçoveyê de darêjkirina bi naqşê re, wê têgîna şûbjeyî bide salixkirin û bigihêne afrînerîyekê. Têgîna afirandinê, li vir, weke têgînek hemû deman ya aferîner ku mirov dikarê bi têgîna adilandinê re werêne ser ziman a.

Têgîna afirandinê, weke teybetîyek hizrî, li vir, bi têgîna estetismê re emê li ser wê bisekin in. Di nava rengên bawerîyan de dihê gotin ku ”afirandin, karê yazdan a.” Lê têgîna afirandinê, her wusa karekî yazdanî dike. Di vê çerçoveyê de bi hizirkirinîya wê re divê ku mirov wê hilde li dest. Têgîna estetismê, li vir, dema ku mirov wê hilde li dest û hewl bide ku wê werêne ser ziman û fahm bike, wê mirov bigihêne têgînek şûbjeyî ya afirandinê.

Li vir, dema ku di çerçoveya têgîna adilandinê de dihizirin, emê cardin hinekî vegerina destpêka mijarê û hinekî din li ser ´kevneşopîyê´

bihizirin. Kevneşopî, dema ku em wê hildina li dest di çerçovwya têgîna civatî de, mirov dikarê bibêje ku kevneşopî astaka têgînî ya bizanîna mirov ya civatî re ya. Adilandina di nava têgîna kevneşopîyê de, wê adilandinaka jîyanî ya ku di temenê hemû adilandinên piştre ku bi jîyane civate tên de bê. Bi rewş, têgîn, gotin û dîmenîya li hevdû hatî re bê. Her wusa, adilandina kevneşopîkî, giringa ku mirov wê hilde li dest.

Adilandina kevneşopî, weke têgîneka estetikî ya têgînî ya. Di nava jîyane civakê de ku wê, jinek û ankû mêrek ku wê cilûbergên xwe yên civatî wê li xwe bikê û xwe bi wan biadilênê û bikê ku wê xweşik bikê wê, bi wê re wê, weke ku wê, dîmenekê wê têgîna xweşikatîya wê jî wê bikê ku werênê li berçav. Her cilûberg bi rengên ku ew li xwe dikê wê bikê ku ew lev werin. Wê, di wê rewşê de wê, xwediyê rewş û rengekê têgînî ê dimejiyê xwe de jî bê. Di aslê xwe de wê dema ku ew xwe di adilênê ku ew jin bê û ankû mêr bê wê, pêşî wê weke têgînekê wê di mejiyê wan de wê hebê. Wê li ser wê re wê qalibên dîtbar ên heyî wê li berçav bigirê û wê bi wan re wê, ew wê, levkirinê bi **lixwekirinê wê bikê**. Di nava rêgezên kevneşopîkî de kifşkiirna bi têgînê re ku hatîya kirin, wê weke adilandineka bitêgînî bê. Her wusa, aqil çawa adilandinê di nava jîyanê de dike, mirov dikarê bi têgîna kevneşopîkî re wê kifş bike. Aqil, afirandina wê ya ku heya, wê giring bê. Li vir, dema ku mirov wê dihêne ser ziman, mirov vê rastiyê bi vî rengî dikarê werêne ser ziman.

Kevneşopî, hevkomîya rêgezên komî ên civatîkî bi xwe re dihêne ser ziman. Yanî, bi gotinaka din, têgîna komî ya bi rengê jîyan civatî re bi xwe re dihêne ser ziman. Civaknasîtî û hwd, wê bi wê re werina ser ziman. Bi keseyetîyê ku dihê ser zman deronnasî, wê weke aliyekî têgînî ê hoyandî ê vê têgîna kevneşopî jî bê. Em li vir, di serî de divê ku vê yekê werînina ser ziman. Têkiliya di nava zêhn û laş de, wê bi deronnasîyê re werê ser ziman. Her wusa, têkiliya aqil û jîyanê jî, wê were ser ziman. Deronî, li vir dîmenekî bi aqil dide me ku em fahm bikin ku adilandinekê di nava mejiyê mirov û wê jîyane ku mirov wê dijî de dide çê kirin. Her wusa, di wê çerçoveyê de hewldana dane fahmkirinê, bi xwe re dihêne ser ziman.

Dema ku em deronnasîyê hildina li dest, divê ku mirov wê têkiliya bi zêhn û laş re ya bi wê re ku mirov wê werêne ser ziman, mirov bi wê re kifş dike ku mejî, di nava xwe de pêşnûmeyên hizirkî çawa çêkirina ku li mirov serwer û serdest in. Mejî, hewl dide ku wan fahm bike. Mejî, wan

di nava xwe de bi fahmakê bicih kirina. Lê deronî, hişekê di derbarê wê de bi mejiyê mirov re dide çê kirin.

Mejî, li vir, weke heyîna hebûnî ya giring a ku mirov divê ku wê bi teybetî hilde li dest û fahm bike. Aqil bo mejî, dibê, têgînek şûbjeyî ya sentetîkî jî. Yeka ku ew li xweşa mirov çû wê, mirov wê bixwezê bijî. Li xoşê çûyin wê temenekê arzûkirinê û ajoya wê re jî wê hebê. Hêsta bi hewldana hertimî ku mirov xwe bigihênê ya hê-xweşiktir wê, hertimî wê ya li ser ya bûyî re wê, weke têgîneka sûbeyî wê, bijî. Di temenê wê hêstê de wê, hebûna jîyanî wê hebê. Jîyane bixwe jî wê arzûyeka wê ya ajoyî a bi xwestinê wê hebê. Ya ku dijî wê bixwezê ku ew bijî. Wê berê wê jîyandinê jî wê, li ya heya û levkirî, xwestin û xweşikdîtî re ve bê. Bi wê rengê wê, jîyan wê xwe bixwe weke têgîneka sûbeyî jî wê bide dîyarkirin. Jîyane ku ew xwediyê hebûnê jî bê wê, ew wê rastîya wê ya sûbeyî a bi jîyandinê re wê, nikaribê wê, ji berçav dûrbikê. Têkiliyeka jîyanî hem bi hebûnî û hem jî bi jîyanî bi ya levkirî re wê ji temen ve wê hebê. Di wê warê de wê, hîs, hêst, zêhn û xwestên mirov û hwd wê, xwediyê temenekê **heyînî bê.** Em di vê çerçoveyê de dikarin werênina ser ziman ku aqil, bi hişkirina mirovî re ku pêşket û pê de, wê êdî wê êdî serdest bibe. Ew aqil, piştî ku bi keseyetîyê re afirî û pê de, wê bi têgînekê, xwe bi hebûna wî mejiyî re werêne ser ziman. Her wusa, mirov dema ku li mejî hizirî wê ew hizir werê bîra me û ew hizirkirin bibe. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ew hizirkirin, wê weke têgîneka mejiyî ya giring bê ku mirov dikarê bi wê re mejî jî fahm bike.

Em cardin vegerihina ser wê têgîna deronnasiyê ya di mejî de. Deronnasî weke têgîneka ku wê bi pêşnûma bê. Her têgînên deronî, wê weke têgînna bi pêşnûma bin. Ya ku bi hoyandina wan re li mejî serdestkirina wê zêdetir bike jî wê ev bê. Em li vir, dema ku vê rastiyê her wusa dihênina ser ziman, em vê yekê weke aliyekî giring wê kifş dikin. Têgîna deronîyê, têgînek aqilê zelal a. Her wusa, em divê ku çerçoveyê de, weke ku çawa me li jor bo xewnê hanî ser ziman ku weke têgînek şûbjeyî ya afrînerîya mejî ya, bi heman rengî têgîna deroniyê jî, afrînerîyek wê ya teybet ya bi aqil û hişkirinê heya. Deronîya mejî ya fêrkirinê bi wê re mirov dikarê fahm bike. Her wusa bi wê re jî, mirov dikarê deronîyê, bi serê xwe weke têgînek şûbjeyî wê werênina ser ziman. Ya ku têgînên deroniyê obje dike jî, bi kifşkirina wan têgînan re ew hişmendîya ku derbarê wan de diafirê ya. Deronî, ew têgînên ku mejî ew bi afrînerî afirandina û her wusa di çerçoveya xwemalitiyekê de ew

kirina malê xwe na. Bi wê re jî mejî, wan têgînan hîs dike. Hoyandina di nava têgînê û rewşê de ku dibê, çend ku weke mijereka deroniyê jî bê, wê mejî wê rewşê hertimî bike.

Têgîna deronîyê, ew adilandinaka wê ya bi zêhnî û rewşî ya adilandî a di mejî de heya. Em dema ku vê rewşê hewl bidin fahm bikin, em wê adilandinê fahm bikin. Bi vê têgîna adilandinê re, mirov fahm dike ku têgînên ku hena, bi çerçoveyî na. Her wusa, li vir, mejî, wan têgînên bi çerçoveyê û pêşnûma, bi wan xwe dihêne

Hizirkirina di mejî de, her wusa wê di rengê xiyalkirinê de bê. Ev di rengê xiyalkirinê de hizirkirin, wê bi çerçova û pêşnûmaya xwe ya têgînî wê biafirê. Ew têgîn, çawa dibê têgînek objeyî. Kengî ku derbarê wê de di mejî de hişmendî afirî û pê de, mirov dikarê bahse wê bike.

Di nava têgîna kevneşopîyê de, rêgezên ku li wan bê nerîn û li gorî wan were jîyandin hena. Ew rêgez, têgînna jîyanî na. Di nava kevneşopîyê de weyn û rol û sînorê jîyandinê ê mirov bi gotinan hatîya kifşkirin. Mirov, dernakevê dervî wan. Dema ku derket dervî wan û pê de, wê êdî weke ku derkeve dervî wan têgînên ku di mejî de hatina bihiş kirin bê. Ev jî, wê were dîtin. Mirov, di nava wan têgînênn kevneşopîkî de, weke di nava lihêfekê de xwe germkirî ya. Dema ku derkeve dervî wê, wê êdî bi cemidê. Wê xwe bi tenê hîs bike. ..

Têgîna kevneşopîkî ya adilandî, her wusa giringa ku mirov li wê hizirê. Ev têgîna kevneşopî ya adilandî, weke têgînna hizrî yên biaqil û asta aqil jî na ku mirov dikarê wusa werêne ser ziman. Her wusa, rengê şenber ê kevneşopîyê li ser gotinan re hatîya kirin. Di çerçoveya wan gotinan û ankû têgînan de jîyan dihê dîtin û kifşkirin. Ev, jîyane ku hatî kifşkirin jî, jîyane bi têgîhiştin a.

Têgînên kevneşopîkî ên adilandî, wê di rengê jîyanê de, di cilên ku dihên li xwekirin de û her wusa di rengên wan ên ku dihên bikarhanîn û awayê dîzaynkirina wan de werina dîtin. Ev jî, bi serê xwe dide nîşandin û fahmkirin ku kevneşopî, têgînna felsefîkî ên jîyanî na jî.

Her têgîn, bi çerçoveya wê ya hizrî re heya. Her wusa, dema ku mirov di kîjan beşên zanînê de lê binerê û werêne ser ziman, wê ev yek wua bê. Her wusa, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna zanebûnê, bi aqil û feslefeyê re dihê dîtin. Têgîna deronîyê bi keseyetîyê, zêhn û laş re dihê dîtin. Têgîna civaknasiyê jî, her wusa di nava wan têkiliyên kevneşopîkî ku me bahse wan kir de mirov wê dibînê. Têkiliyên jîyanî ên civaknasî, bi aqil in. Her têkilî, weke rêyeka aqil ya di mejî de di buhurê ya.

Di nava têkiliyên civaknasîkî de, ya ku weke ahengekê ku li wê dihê lêgerîn û her wusa li wê tê lêkolîn jî, ew a ku wê çawa di nava levkirin û levhanînê de bin. Ev jî, dema ku mirov bi aqil re kifş dike, mirov nêzîkî têgîna deronîyê bixwe jî dike. Têkiliya di nava têgîn deronîyê û ya civaknasiyê de, di nava hevdû de ya. Têkiliyên ku bi civaknasîkî hatina hişkirin, salixkirin û hwd, wê bi rengê hişkirina deronîyê jî bi rengekî din werina salixkirin û hişkirin. Ev jî, wê bi xwe re weke aliyekî din bê. Deronî, wê ji keseyetîyê destpê bike. Lê civaknasî, wê ji komîya civatî ya mirovan a bi têkiliyên wan ên bi hevdû re dest pê bike.

Em dema ku bahse têgîna adilandinê dikin, em li vir, vê yekê bi van herdû têgînan re jî dibînin. Her wusa, têgîna civaknasiyê, wê li ser wan rêgezekên civakî re şenberkirinaka hişî bi têgînî bike. Wan, wê rengê jîyanê kifş bike. Her wusa, piştî ku ev kir û pê de, wê bi hiş bike. Bi hişkiirna civaknasiyê, wê têkiliyên civatî jî salix bike. Her wusa her têgîna bi hişbûyî, weke ku me li jor hanî ser ziman, wê karibê afrîneriyekê bi çerçoveya xwe ya têgînî re bide nîşandin. Piştî ku civaknasîtîyê de kifşkirin kir û pê de, êdî bi dest hizirkirina ku wê têkiliyên civatîkî çawa bin kir. Ev jî, nîşanaka hizirkirina wê ya.

Em li vir, divê ku vê yekê bi başî werênina ser ziman ku têgîna civaknasiyê, wê bi têgînî di nava xwe de bi wê dîzaynkirina xwe ya ku kirî re wê adilandinê bike. Ew rengê civakîtî ê jîyanê ku kifş kirî, wê piştre li ser wan re bihizirê ku ka ew çawa na. Di wê çerçoveyê de, wê li wê hizirê ku çerçoveyek ku di wê de kêmesî û vajîbûn nebê biafirêne. Ev jî, wê di çerçoveyekê û bi têgînekê wê bike. Piştî vê re, êdî ew têgîna civaknasî, wê êdî bidest afirandina têgîna têkilitiyê jî bike. Ev weke xaleka ku mirov divê ku wê bi teybetî kifş bike û werêne ser ziman a, ku têgîna civaknasî têgînek felîte(dinamîk) ya. Bi jîyanê û jîyandina jîyanê re ew xwe bi tevger û felîte heya. Civaknasîtî, pêşnûmaya wê ya aqilî û ankû têgînî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê weke çerçoveyeka adilandînî werênina ser ziman.

Hizirkirina mirov a di jîyanê de wê weke aliyê mirov ê şûbjeyî û afrîner bê. Mirov, piştî ku bidest hizirkirinê kir û pê de, bidest afirandinê kir.

Di nava jîyanê de mirov, bi hizirkirina xwe re bidest hizirkirinê kir. Bi hizirkirinê bidest dîzaynkirina jîyana xwe kir. Her wusa, bi hizirkirina xwe bidest çêkirina fahma xwe kir. Bi hizirkirinê re têgînên weke têgînên hûnerî têgînên çandî û hwd afirand. Ev têgîn hemû jî, wê têgînna ku mirov li vir di çerçoveya têgîna estetismê de werênê ser ziman bin. Bi

nerînê re wê dîtin pêş bikeve. Tişta ku mirov wê dibînê, mirov wê di çerçoveyê de dibînê. Her wusa, dema ku çerçoveyek çandî û ankû çerçoveyek hûnerî û hwd de wê ew pêşketin û dîtin bibe. Hûner û ankû çand, aliyekî wê yê giring ê bi têgîna estetîkê re heya. Ew jî, ew a ku bi hizirkirinê re û her wusa bi hizirkirina xiyalî a şûbjektîf re ew afirandin bûya. Her wusa, li vir aliyê vê afirandinê ê giring ew a ku çerçoveyek adilandî ya wê heya. Minaq, dema ku tîyatroyek dihê leyistin, berî ku ew tîyyatro were leyistin, wê çerçoveya têgîna wê were afirandin. Wê binetera wê were nivîsandin. Kî wê çi bibêje ew dihê nivîsandin. Li ser wê nivîsandinê re êdî şenberkiriya di kirinê de dihê kirin. ..

Bi wê re jî, êdî piştî ku ew bineter hat nivîsandin û pê de, wê ew bineter weke binetereka têgîhiştî bê. Wê piştre weke listikê wê were dîzaynkirin. Wê çerçoveya wê were afirandin. Gotinên ku di wê de ku wê werina gotin û wê çawa û bi çi rengî werina gotin, wê were bijartin. Her wusa, di wê çerçoveyê de bi şenberkirina bi gotinê re rengên hêstî jî wê hebe. Ew jî, wê werina dîyarkirin. Ew binetera nivîskî, tenê û tenê, piştî ku hat nivîsandin û pê de wê hebe. Berî wê nebûya. Di jîyanê de rewşek jîyanî ya bi wî rengî ne afirîya. Afrînerîya têgînî ya bi hizirkirinê ev a.

Li vir, dema ku ew leyistik hat leyistin, wê ji cil û bergên ku li gorî wê rewşê ku hena, wê werina li xwe kirin. Minaq, leyistik, di kîjan demê de di buhurê, yanî bo kîjan demê û ankû serdemê hatîya çêkirin, wê li ser wê bê hizirîn. Di wê demê de mirovan cilên çawa li xwe dikirin. tever, xû û kevneşopîyên wan çawa bûn, wê bi gelek aliyên din re di wê leyistikê de werina li berçav girtin. Di wê çerçoveya leyistikê de, wê wê bi vê rengê levkirin levhatinak bi levhanînê re wê bê çêkirin. Di leyistikê de, levkirin, levhatin û levhanîn, weke xoslet û teybetîyên wê çerçoveyê na. Her wusa, di leyistika tîyatroyî de bi demê û mekanê re levkirin, levhatin, levhanên û ankû lêhatin û hwd wê werina kirin. Ev, wê di çerçoveya têgînek adilandinê de wê werina kirin. Ev hemû bi hizirkirinê re wê werina kirin. Metna nivîskî ya ku heya, bi xiyalkirinê hatîya nivîsandin. Her wusa, piştî ku ew hat layistin, wê êdî levkirineka wê ya kirinî wê hebe.

Ev levkirina di binetera leyistikê de, wê di çerçoveya wê de bibe. Her wusa, ew adilandin, wê weke adilandinek bi têgînî bê. Ev adilandina ku em bahse wê dikin, di wê çerçoveyê de wê gelek alî bi hevdû re li berçav werina girtin bo çêkirina wê. Bi dem û mekanê re wê di çerçoveya kompozisyona wê de levkirin, levhatin, levhanîn û lêhatin wê werina çêkrin. Ev rewşên ku bi afirandina wê binetera têgînî ya nivîskî ya

tîyatroyê de ku dihên kirin, her wusa wê bi hevdû re di çerçoveya leyistikê de di ahengekê de bin bi hevdû re.

Ev rewş, di nivîsandina romanekê de jî wusa ya. Di dema ku roman hat nivîsandin de, weke ku jîyanbûyî de wê çerçoveya wê ya pêşnûmayî wê were û bi afirê. Ev jî, wê weke aliyekî wê yê giring bê. Di vê çerçoveyê de wê xwediyê vaca xwe ya bi têgînî bê. Romanak, têgîneka. Her wusa, romanak hizreka ku kirina wê di jîyanê de weke wê nebûya ya. Weke hizrekê ya. Ew hizir, her wusa, bi xiyalkirin û hizirkirinê û nivîsandina wê hizirkirinê re hatîya bidest xistin. Di vê çerçoveyê de, dema ku ew roman hat nivîsandin, wê weke xalên ku li berçav werina girtin, wê levkirin, levhatin, levhanîn û lêhatinîya wê li berçav werê girtin. Ev rewş, hemû, bi heyîna wê ya hebûnî re wê di çerçoveya vacakê de wê hebe û bi afirê. Rengê têgînî ê romanê, di vê çerçoveyê de bi jîyankirina ku hatî pêşnûmakirin di wê de re wê were şenber kirin. Ev weke hizreka ku ne hatî jîyankirin a. Çend ku dem bi dem serborîyên mirov ên ku buhurîna darêjka wan li berçav hatibê girtin jî, lê dîsa mirov nikarê bi tememî kirinîyeka wê ya jîyanî bike. Şûbjeya wê têgîna romanî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bahse wê bike. Her wusa, ew têgîna romanî, dema ku mirov bahse wê dike, di vê temenê de divê ku mirov bahse wê levkirin, levhanên, levhatin û lêhatînîtîya wê ya ku hatî çêkirin bi wê re bahse adilandinîya wê bikin.

Her romanak, têgîneka hizrî ya şûbjeyî ya.Her wusa, divê ku mirov bahse wê bike.Ev têgîn, weke têgînek bi hizrî hatî afirandin a. Têgîna afirandinê ya bi hizirkirinê û hwd, li vir wê li ser wê nivîsandina romanê re xwe di jîyane têgînî de bi wate bike.

Çend ku di nava romanakê de serborîyên ku hatina bi pêşnûma û ankû çerçovakirin ku ne hatibibina jînkirin jî, ew bi serê xwe xwediyê darêjkna ku di jîyanê de bi jîyankirinê re afirîna na.Ev divê ku li vir, vê yekê bi teybetî werênina ser ziman ku, têgîna romanî, li vir, weke têgînek wêjeyî û çand ya. Ev têgîna wêjeyî, weke têgînek jîyanî ya adilandî ya. Em vê têgîna adilandi, dema ku wê fahm bikin, emê têgîna estetismê ya adilandinê fahm bikin. Li vir, estetism, weke rastkerê jîyanê mirov dikarê bi nav bike. Ya ku wê, dihêne vê rewş, ew şûbjeya jîyanî ya ku bi wê re xwe dihêne ser ziman a.

Dema ku em bahse şûbjeya jîyanê dikin, em bahse bi hizirkirina wê dikin. Em bahse bi hizir bi dîmenkirina wê dikin. Ev jî, weke dîmenekî dinamîk ê têgînî ya. Dîmenê estetîkî ê ji jîyanê, dîmenekî têgîhiştî adilandinê ya.

Gotina adilandinê di kurdî de wate wê, ew a ku tişta ku bi têgînî hatîya rastkirin, rayistin, levkirin, levhanîn, levhatin û lêhatin û hwd a. Di vê çerçoveyê de weke gotinaka ku dikeve şûna gotina estetismê de jî.

Adilandin, dema ku mirov bahse wê dike, her wusa bi darêjkî mirov dikarê bahse wê bike. Bi wê re jî, divê ku mirov bi têgînî bahse wê bike. Her gotina adilandinê weke ku di kurdî de mirov dikarê bahse wê bike, bahse rastkirin, rayistin, levkirin, levhatin, levhanîn û lêhatinî û hwd ku bi xwe re bi wate dike, di temenê têgîna bi darêjkkirinîyê de jî xwe bi wate dike.

Adilandina bi darêjkî, weke teybetmendiyek gotina adilandiyê ya. Her wusa dema ku mirov bahse wê dike mirov ji vê aliyê wê fahm dike ku bi têgînek adilandî a bi hiş re ew dihê ser ziman. Rastkirina darêjkî, mirov wê bibînê bi hizirkirinê. Awadanîya malî ku piştre dem bi dem zêdetir pêş dikeve, wê weke minaqek wê ya giring û bi wate bê. Her wusa, bi awakirina tiştê, wê weke teybetîmendiyek vê têgînê bê. Bihizirkirinê, çêkirina pêşnûma(proje) ya wê têgînî û piştre ji wê di jîyanê de levkirina afirandinî ya bi avakirinê û hwd, wê weke aliyekî vê têgînê bê. Her wusa, têgîna şûbjeyî ya hizirkinî ku êdî bi wê avakirina ji têgînê bi ber kirinîyê û hwd de, wê pêvejoyên afirandina hizirkirinê bin. Estetism, di vê çerçoveyê de têgîneka wê têgîna şûbjeyî ya ku ji wê hatî afirandin bê.

Em dema ku bahse vê rastiyê dikin, em divê ku werênina ser ziman ku em bahse afirandînîya têgîna şûbjeyî ya hizirkirinê dikin. Estetism, weke têgîneka felsefîkî ya afirandina hizirkirinê ya. Her wusa, divê ku mirov wê salixkirina wê bike. Ev, piştî ku hizirkirin pêşket û pê de, bû. Lê di temenê wê de astak û radayek têgînî ya ku afirî bi xêvî heya. Ev ast û rada, wê têgîna afirandinê bi hizirkirinê hin bi hin zêdetir dike. Çendî ku afirandin bû û pêşket û cihêrengîtî jî pêşket û pê de, wê êdî ew asta afirandinê bi xwe re pêvajoyên nû ên afirandinê bi ser xwe re bêne. Ev jî, weke teybetîyek pêşketinê û pêşveçûnê ya bi demê re ya.

Têgîna estetismê, wê temenê fahmkirina şûbjeyî ya bi demê re jî bê. Her wusa, çendî ku  ew hêza estetismê pêşket wê ev jî bi wê re bibe. Estetism, bi xwe re hîs û hêstên ku wan bi kardihêne û ankû ji wan sûd digirê, wê bi wan re di nava jîyanê de xwe pêş ve bibe. Estetism, rengê wê yê şûbjeyî, bi hêstîyarî û ankû aqilê hêstîyarî û hwd re wê bibê. Ev jî, wê weke rengekî wê yê pêşketinî bê. Hîs û hêst, li vir, divê ku bi teybetî, weke mijarna teybet ên li bin sêwane vê mijarê de ku werina hildan li dest bin. Hêst, her wusa, dema ku di jîyanê de bi tevgerên ku hatina bi

wênekirin û hwd re ku hatina dîtin, wê hingî weke aliyekî têgînî ê bi ast û rad ê adilandina estetikî jî bi wê re werina dîtin. Têgîna estetikî, her wusa bi wêna kirina hêstên ku hena re, her wusa têgînna jîyanî jî bi xwe re di jîyanê de dihêne li holê. Ya ku li gorî xwestekê ku hatî çêkirin ku çi ya, wê ew weke binetereka têgînî ku xîtabî wan hêstan bike bê. Çendî ku xitabî, wan hêstan dike, hingî, lêhatînî, levkirinî, levhatinî û levhanînî û hwd, wê were afirandin bi wê adilandinê re.

.

**Reng, zayendîtî û rastîtî.** ..

Ku mirov bahse têgîna estetîkê bike, divê ku mirov her wusa li ser wê rastîyê re werêne ser ziman ku rastî, ya ku hatî hizirkirin a. Estetîk wê her tiştê heyî wê bi nerîna sûbeyî wê bikê ku wê xweşik û spahî derk bikê. Wekî din wê, ya dîti wê, bi hişmendiya xwe re wê, karibî dem bi dem xiyalên xwe jî tevlibikê û wê hê xweşiktir jî bikê. Minaqe wê jî wê ew bê ku tiştekê ku mirov xweşik dît wê, ku mirov hinekî li ser ponijî wê, çawa xweşiktir bibê wê mrov wê hizran wê bi wê re wê pêşbixê. Sînorê wê afirandinê bi sûbjeyî wê di mejî de nebê. Li ser têgînan re xweşik dîtin weke serkevtibûnê xweşik dîtin, weke başbûnê xweşik dîtin û hwd wê, bi mirov re wê pêşkeve. Ya ku wê xweşik û nexweşik wê bide têgihiştin û bi me bide derkkirin wê ji aliyekê ve jî wê têgîneka sûbjeyî a ku ew dihê derkkirin û têgihiştin jî bê. Li vir wê dema ku em di mijare wê bi dîtinê xweşikdîtinê re kûr herin wê demê em, divê ku rewşa darizandin û muhakeme ya zêhnî wê, li berçav çav bigirin û wê, bi wê werênina li ser ziman. Darizandin wê, nerîneka ku mirov wê dikarê di wê rengê de wê, werênê li ser ziman bê. Ya ku li mirov rast û baş û di cih de dihêt wê, ya ku ew ji mirov re rast, levhatî û xweşik hatî bê. Di wê rengê de wê, ew weke darazekê jî wê bi mirov re wê hebê. Di wê warê de wê, felsefeya dualisme başî û nebaşîyê bi giştî û çerçoveya xwe re wê, di wê warê de wê, karibê têgîneka estetîkî a têgihiştînî jî wê biafirênê. Ya ku ew li me xweşik hat wê ji ber çi wê û çawa û li ser çi temen û levhatinê wê were? Di aslê xwe de wê, ev wê, weke aliyekê ku mirov wê dikarê bi têgîne estetîsmê re wê, di wê çerçoveya têgînî de wê hilde li dest û wê fahmbikê bê. Xweşikbûn, sipehîbûn jî wê ji aliyekê ve wê weke darazna me jî bin. Em wê bi nerîna xwe re wê wusa dibînin. Ev tişta ku ew, minaq li min xweşik hat li yekê din dibê ku ew bi heman rengê xweşik newê. Yan jî yekî din bi şêwayekê din wê, xweşik û an jî xweşiktir bibînê. Wê cûdahîya di nava têgînê de wê, bi rengê hiş û darazê a bi hevdû re ku mirov wê hilde li dest û fahm bikê wê, hingî wê rastîya **wê were dîtin**.

Her wusa ´ya ku weke hatî hizirkirin´, weke aliyekî giring ê têgînê ku mirov wê werêne ser ziman. Têkiliya di nava têgîna hişa tiştê de weke ku mirov werêne ser ziman, bi têgîna rastiyê re mirov divê ku li wê bihizirê. Di nava jîyanê de hertişt, ”weke xwe” heya. Mirov, dema ku dihizirê, ku ew ya ku mirov li wê hizirî ku keseyet bê, bi rengê wê yê zayendî re mirov dikarê wê werêne ser ziman.

Em dema ku li vir bi Zerdeşt re gotinekê bibêjin, divê ku mirov di temenê dû gîyanên vajî hevdû de rastkirin, levkirin û levhanîna wê ya têgînî mirov kifş dike. Ev jî, weke têgînekê mirov dikarê li vir li ser wê bihizirê. Têgîna adilandinê, li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa bi rengê adilandin û ahenga wê ya ku heya re mirov divê ku li wê bihizirê.

Têgîna aheng û adilandinê, weke têgînek şûbjeyî ya adilandinê mirov divê ku wê werêne ser ziman. Her wusa, hêstetî, dema ku mirov li wê dihizirê, weke aliyekî têgînî ya estetîkî ya. Hêst, salixkirina wê, her wusa ku bi wêjeyê bê, helbestgerîyê û hwd bê, mirov wê dibînê. Helbestgerî, weke têgîneka ku di wê de hêstîyarî adilandinekê bi xwe re diafirênê ya. Hêst, dema ku dihê ser ziman, bi xwe re rewşekê diafirêne. Rengên hêstan, ku *´hêstên şahîyê´* bin, ´hêstên êşîyê´ bin, ´hêstên hêrsbûnê´ bin, ´hêstên acibandinê´ bin, ´hêstên naskirinê´ bin û hwd, wê bi rewşa xwe re rengekê bi laşê mirov re biafirênin. Her hêst, bi rengê xwe yê ku xwe di tevgerîyan de dide re wê awayekî bide afirandin. Her wusa, hêsta zayendîtîyê jî, mirov dikarê bi vê rengê werêne ser ziman. Bi hêstî, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa her hêst têja wê heya. Her mirov, xwediyê têjek xwe ya teybet a. Em dema ku di vê çerçoveyê de lê dinerin, em dibînin ku weke ku çawa ku mirov dikarê bêje ku her mirov xwediyê acibandina xwe ya teybet a, bi heman rengî mirov dikarê bêje ku her mirov xwediyê têja xwe ya teybet a. Bi heman rengî ku em dikarin weke temen û hîmê têgîna hûnerî werênina ser ziman, her mirov xwediyê nerîna xwe ya teybet a.

Nerîn, acibandin û têj, weke rengna hêstî ên ku mirov divê ku wan jîyane subjeyî re werêne ser ziman bin. Her wusa, dema ku mirov bahse nerînê bike, divê ku mirov werêne ser ziman ku nerîn xwediyê nerînîya xwe ya teybet a. Nerîn, bi dîtina mirov re teybetîya wê bi nerînê re dihê dîtin. Lê nerîn, bi nerînê re xwediyê levkirinekê, levhanînekê, levhatiniyekê û her wusa lêhatînîyekê û hwd a. Em dema ku nerînê bênina ser ziman, mirov divê ku di vê çerçoveyê de werênina ser ziman. Têgîna nerînê, wê di temenê adilandinê de wê levkirinê, levhanînê,

levhatiniyê û lêhatînîyê û hwd re xwediyê heyînê bê. Dema ku mirov dinerê, mirov çawa dibînê? Ev pirs, weke pirseka têgîhiştinî û felsefîkî ya. Her wusa, dema ku em li vir di çerçoveya mijara xwe de wê dihênina ser ziman, weke aliyekî bi dîtinê re mirov wê dibînê. Ev nerîna ku em bahse wê dikin, weke nerîneka bihişî û têgînê û zanînî ya. Çerçoveya vê nerînê, bi têgîna levkirina adilandinî re weke têgîneka hûnerî xwe dihêne li holê.

Têgîna nerînê, her wusa dema ku mirov bi çerçoveya wê re lê dinerê, çendî ku weke hizrekê jî bê, bi wê levkirin, levhanîn û lêhatînîyê û hwd re bi adilandinê re weke hûnerîyekê dide li der. Têgîna levkirinê li vir, têgînek adilandinê ya. Têgîna adilandinê bi nerînê re bi gotinên levkirinê, levhatinê, levhanînê û lêhatiniyê û hwd re xwe bi me re dihêne ser ziman. Her levkirin û ankû levhanîn, bi hêsta lêhatînîyê re bi têgîneka acibandinê re xwe dihêne ser ziman. Li vir, têkiliya di nava nerînê û acibandinê de, wê bi adilandina bi levkirinê, levhanînê û her wusa lêhatînîyê re wê xwe bi wate bike. Dema ku mirov diaxifê, ew axiftina xwe de di serê xwe de rast dike. Wê diadilêne. Wê axiftina xwe, çerçoveya wê amede dike di mejiyê xwe de. Di mejiyê xwe de wê binetera wê axiftinê pêş dinivîsêne û wê piştre dihêne ser ziman. Ev bineter(metina axiftinê ya di mejî de), wê weke çerçoveya estetîkî ya adilandî jî bê. Her wusa, di nava wê çerçoveyê de gotinên ku wê werina ser ziman, levkirina wan û her wusa dengê bi kirina wan gotinan re ku dihê derxistin, rastkirina wê jî bi wê adilandinê re dihê kirin. Deng, weke hebûnaka heyînî ya ku pirr zêde dikarê hêsta şîyar bike ya. Di rewşa dengê de wê, levkirina wê, hêstan bi mirov re wê bide çêkirin. Levkirinên di dengên helbestekê de wê, mirov dikarê minaq bide nîşandin. Di wê dengê de wê levkirinên ku ew hatina kirin wê, di mejî de wê, bina temenê hizirkirin, hêstkirin û hîskirinên ku mirov wan bikê. Estetism bi dengê re wê, bi hêstîyarî wê şîyarîyan biqasî ku wê bi mirov wê çêbikê wê, bi heman rengê wê, hîskirinan wê biafirênê. Lê ji aliyê dihisênê bixwe ve jî wê, cerbên wî yên jîyanî ên di mejî de ku ew hena wê, ji aliyê wan ve jî wê, ew bi teybetmendiyên wî kesî ve wê bibin. Yanî wê, di wê rewşê de wê, ew bandûr wê, temenê wê ji aliyekê ve wê bi mirov re wê hebê. Xweşikatîya deng wê, tenê wê weke rewşekê bê. Lê her deng wê dema ku ew hat derxistin wê bi wê re wê, levkirinek û mêyl û awayekê wê hebê. Qêrînek wê ji tiştekê bi hêrsbûnê û ankû tirsbûnê re wê bibê. Tişta ku ew ji wê ew hêrsbûn û ankû tirsbûn bû wê, berê wê qêrînê li wê bê. Di axiftineka asayî de jî wê, dema ku ew axiftin hatkirin wê bi armanca wê

ya ku ew axiftin dihê kirin û kesên ku ew li wan dihê kirin wê, bi hevdû re wê, xwe bide dîyarkirin. Deng wê, di rewşa xwe de wê, heyînî wê, rengê wê yê bi dengî û hwd re wê ew wê hebê. Ya ku wê, bê temenê bandûrê wê ew rengê wê bê. Mirov rengê dengê nabînê. Bi dengkirinê re mirov wê, bi çerçove dikê di mejî de. Eew çerçovekirin wê rengekê salixkirinê a di mejî de bê. Mirov wê dema ku wê dengekê wê nasbikê wê, ew deng li çi û ji çi bê wê, ew wê, bi wê re wê bibê. Deng dema ku ew wê were derxistin wê, pêşîya wê, ew bê ku wê, mirov wê, bi sazûmanakê wê dengê wê, derxê. Ya ku wê rengê wê bide dîyarkirin jî **wê ew bê**. Deng, çendî ku bi gotinên ku bi wan derdixe re ku weke hizrekê werêne ser ziman jî, bi wê re her deng aliyekî wê yê din jî ew a ku xitabî hêstîyarîya mirov dike. Her wusa, di nava dengekî de hêrsbûn, dilxweşîbûn, û ankû bi bandûrbûn û girîn û hwd, wê çend ji wan rengên hêstî ên ku bi bandûra dengê wan gotinan re ku şîyarbûna bin.

Hêst, her wusa divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku hêst, wê têgînek afirandî di temenê wê şîyarbûna wan de bê. Şîyarbûna hêstan, hertimî wê bi gotinan re bibê. Şîyarbûna hêstan, di temenê wê de hişekî ku mejî wê diafirêne heya. Em divê ku şîyarbûna hêstan, bi hinek hişna têgîhiştî re werêne ser ziman. Divê ku em bi zanînna re werênina ser ziman. Şîyarbûna hêsta, çendî ku zanebûnekê re dibê jî, her wusa divê ku mirov bi wê re êdî afirandinek jî bê. Ev hêstîyarî, giringa ku mirov wê bi teybetî kifş bike na.

Hêst, dema ku mirov bahse wê dike di çerçoveya têgîna adilandina estetîkî de, mirov vê yekê jî divê ku werêne ser ziman ku hêst afirandinna giring ê zindiyî na. Hêst û zayendîtî, her wusa hevdû şîyar dikin. Ev jî, bi laş re xwe didina dîyar kirin. Dema ku mirov bahse zîzbûna laş û ankû şehweta zayendî dike jî, dîsa di temen de ew têgîna hêstîyarî ya ku afirîya heya. Hêst, divê ku mirov vê yekê jî, bi wê re werêne ser ziman ku hişekî şîyar a. Her wusa, dema ku mirov bahse wê hişê şîyar bike, wê bi wê re ew têgîna hêstîyarî wê werê ser ziman. Hêstîyarî, bi têgîneka hizrî ya adilandî re heya. Her wusa, her hizir, dema ku bi hişê şîyar ku şîyar bû, wê êdî ew hêstîyarî were li holê. Hêstîyarî, bi hebûna xwe re hişê şîyar a. Her wusa, têgînaka adilandî ya. Li vir, dema ku mirov bahse hêstê bike, divê ku mirov ji bîrnekê û bahse hîsîyetê jî bike. Hîsîyet, wê ew şîyarîya hêstî ku bûya, wê bi wê re hebe. Lê hîsîyet, weke têgînaka zêhnî wê bi hêstîyarî re hebe. Em divê ku hîsîyetê, weke rêyeka hêstî ya fahmkirinê jî werênina ser ziman.

Hîsîyet, wele têgîna hizrî ya hêstîyarî, mirov dikarê weke hêza fêrbûnê jî, werêne ser ziman. Her wusa, ew hêza fêrbûnê ya bi hîsîyetê û ankû hêstîyarîyê, wê bi têgînek adilandî bê. Hêstên weke şahî û hwd, hemû jî, di ancamê de ancamna daraza mirov ya têgînî ya hizrî na. Hizirîya mirov ya şûbjeyî, li vir, divê ku mirov bibîr bike. Ew hêstîyarî, bi ast û radayaka zanînê re heya. Ev hêstên ku em dikarin weke şahî û hwd, werênina ser ziman, wê li ser wê ast û radayê re weke têgînna ancam wê werina li holê.

Têgîna hêstê, li vir, divê ku mirov wê werêne ser ziman ku li ser astekê û radayekê re heya. Bi wê re jî, divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîn heta ku bi zanebûnê re werê wê astê ku hêstan bi afirêne, wê gelek pêvajoyên têgînî ên têgihiştinî wê bi ser xwe re bi buhurêne. Em dema ku hêstan li vir hewl didin ku werênina ser ziman, wê bi astekê werênina ser ziman. Têgînên weke wêjeyî, hûnerî, helbestgerî û hwd, wê weke ancamna têgînî yên bi ast û rada bin. Hêst, dema ku bi têkiliya herîkbar ya hoyandî re heya. Ev têkiliya herikbar ya hoyandî ku di nava rewşê û mejî de dibe temenê ´angaje´bûnekê, wê li ser wê re hêstîbûnî biafirê. Her hêst, dema ku hoyandinek zayendî bi rewşê û têgînîye re afirî û hwd, wê bi wê re êdî biafirê. Hêst, dema ku bi rewşê re mejî sadîsad ku hat hoyandin, wê biafirê. Hêst, bi vê yekê û rengê, weke têgînek ancama wê têkiliya jidahî ya ku diafirê bi wê re difirê ya. Li vir, ew hêst, weke ancama ast û radaya têgînî ku mirov rewşenbîrîyê jî hilde li dest, divê ku mirov ji wê cûda neyêne ser ziman. Zîzbûna di nava nerînê de diafirêne.

Em dema ku li vir, weke hêstan werênina ser ziman têj, weke têgînaka ku di temenê wê de hişê şîyar heya ya. Her wusa, ev hişê şîyar bi zanîn û zanebûnê re diafirê. Ev zanîn û zanebûn, bi perwerdekirinê û hwd bê, wê hişarîya xwe biafirêne. Ew hişarîya wê ya ku êdî hêstîyarîyê diafirêne, wê hêstên ku hena bi afirêne. Ev rewş, tiştekî bi me dide têgihiştin. Ew jî, ew a ku hêst hişarna têgînî ên bi rengê hişên şîyar in. Bi nerînê re hûner û ankû çand û hwd, weke astaka hêstiyerî ya ku mirov bi vir ve girêdayî weke hişarna werêne ser ziman in. Têgîna hûnerî û çandî a kevneşopî, bi koka xwe re her wusa têgîneka wê ya adilandî heya. Ev, têgîn bi hişarî, xwediyê astaka ku mirov divê ku wê fahm bike ya. Ev jî, bi hêstê re dihê ser ziman. Hêst, hêstîyarîyaka têgîhiştî ya bi hişar a. Çend ku dema ku mirov wê hêstê, dijî, weke ku ji xwe diçê li mirov tê jî, mirov dîsa divê ku bibêje ku hêsteka hişarî û têgîhiştî ya.

Têgîna estetîsmê, her wusa, divê ku mirov bi ast û radayaka têgînî re wê werêne ser ziman. Dema ku mirov li vir, bi hêstan re wê dihênina ser

ziman, mirov dibînê ku hêst weke astaka têgînî ya. Hêst, her wusa, di kifşkirina têgînîya adilandinê de jî weke darazekê ya.

Di dewama hanîna li ser zima hêstê de, dema ku mirov wê werêne ser ziman, mirov divê ku ji bîrnekê û werêne ser ziman ku hêst weke ast û radaya darazî jî ya. Mirov nikarê tenê hêstê weke ast û radayekê werêne ser ziman. Ji wê zêdetirî, weke ast û radayaka darazî jî, werêne ser ziman. Têgîna acibandinê, têgînek ji wan têgînên hêstî ên adilandinê a estetîkî ya. Her wusa, têgîna acibandinê, divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna acibandinê, têgîneka darazî jî ya. Mirov, dema ku aciband, li gorî çi û çawa aciband, wê weke nirxek, radayekê û astakê were li holê. Di vê temenê de, dema ku mirov van nirx, rada û astan werêne ser ziman, divê ku mirov di temenê têgînekê û hişarîyekê de werêne ser ziman. Her wusa, ev hişarîya têgînî ya biastî, bi darazî, divê ku mirov wê werêne ser ziman.

Têgîna acibandinê, her wusa, giringa ku mirov li ser wê bisekinê. Li vir, têgîna acibandinê, weke têgînek adilandinê a estetîkî ya darazî ya ku mirov wê werêne ser ziman a.

Hizirkirina bi nerînê re, di vê çerçoveyê de divê ku mirov weke têgîna acibandinê, wê jî weke têgîneka darazî jî werêne ser ziman. Lê têgîna nerînê, mijareka kûr a. Her wusa bi çerçoveya wê re dema ku mirov li wê dihizirê, bi wê re mirov kifş dike ku nerîn, di çerçoveya hişarîyekê de dihê li holê. Têgîna nerînê di temenê wê de dîsa acibandin û têja bi nerînê re heya. Têja bi nerînê re her wusa, bi hişarî û hêstîyarîyê re mirov divê ku werêne ser ziman.

Nerîn, di çerçoveyeka têgînî de bihişarî heya. Her wusa, têgîna nerînê bi çerçoveya wê re dema ku mirov wê dihêne ser ziman, mirov dibînê ku di hundurê wê çerçoveyê de bi hêstî û têgîna acibandinî adilandina gotinan mirov kifş dike. Di temenê wê têgîna adilandinê de çendî ku ew têgîna acibandinê heya jî, mirov divê bi wê re bi hişarî werêne ser ziman. Ew adilandin, bi hişarîyekê dibê. Her wusa, ew acibandin jî, bi hişekî şîyar û têgîn û hêstîyerîyekê dibê.

Xwestekên mirov bi têgînên weke acibandinê re bi ast û radayî dihên ser ziman. Xwestek, di temenê wê de acibandin bi têgîna xwe re heya. Xwestek, weke têgînek darazî ya têgînî ya adilandinî jî ya. Xwestek, bi hêsta xwestinê û acibandinê re mirov wê dihêne ser ziman. Her wus xwestek, wê bi nerînê re werê ser ziman. Lê xwestekê, divê ku mirov wê bi hişarîyekê hêstîyarî wê werêne ser ziman. Nirxên têgînî ku weke nirxna hişarî ên rewîstî jî bûna, wê di kifşkarîya wê de bin. Di aslê xwe

de rewîst(ahlaq), wê weke hişarîyek têgîhiştî ya bi rêgezî bê. Ew çerçoveya wê ya rêgezî wê, levkirineka wê hebê. Ew levkirin jî wê, çerçoveyek xwe ya estetîkî wê biafirênê. Em divê ku di vê çerçoveyê de wê werêne ser ziman. Çendî ku têkiliya wê bi jîyanê re heya, wê ew çendî afirandîna wê hebe. Lê kengî ku têkiliya wê ji jîyanê qût bû jî, wê êdî tenê weke rêgezek ku dike kifşkirin wê li holê bimêne. Hingî jî, wê bike ku li gorî xwe re rast bike. Di vê çerçoveyê de ketina li dijî rastîya jîyanî de dibê.

Rewist, weke aliyekî giring ê darazî ku bi şenberî dide dîyar kirin a. Her wusa, ev xalên rewîstî, dema ku mirov li wan dihizirê, mirov divê ku werêne ser ziman ku têgînna darazî ên kifşkar in. Têgînên darazî, hertimî di jîyanê de dikarê weke xalna rewistî xwe salix bike û bide hanîn ser ziman. Her wusa, ev têgînên darazî, ku mirov wan dihêne ser ziman, divê ku mirov van aliyên wan di serî de kifş bike. Ev jî, giringa ku mirov li ser wan bisekinê. Têgîna xwestekê, bi têgihiştinên weke ên adilandin û acibandinê re wê di nava jîyanê de bi nerînê re xwe werênina ser ziman.

Li vir, dema ku mirov bi hêstîyarîyê re wê dihêne ser ziman, weke aliyekî hişarî mirov wê kifş dike. Xwestek, bi têgînek acibandinê re wê bi hiş werê ser ziman. Lê ev têgîn, dema ku hat ser ziman, wê weke darazekê were ser ziman. Xwestek, bi têgîna xwe re li xalekê hoyandinê jî bi xwe re dihêne ser ziman. Her wusa, di temenê wê têgîna xwestekê de ya rast bi wê xwestekê re çî ya, mirov wê hîs dike. Ew hîskirin, hişekî şîyar ê têgihiştî ya. Ku di vê çerçoveyê de bi gotina darazê re mirov wê werêne ser ziman, şîroveyên mirov, wê weke darazna mirovî ên nerînî jî bin. Ji xwe nerîn, daraz a. Nerîn, daraza mirov a. Her wusa dema ku mirov nerînê dihêne ser ziman, weke ku mirov dide dîyarkirin, mirov li gorî ya ku mirov wê rast dibînê dihêne ser ziman. Ankû, li gorî têgîna levkirî, ku mirov di wê çerçoveyê de ne di heman nerînê de jî bê bi wê hizrê re, ku mirov dihêne ser ziman a. Levkirin, di nerînê de weke têgîneka di rez ya ´rastîtîyê´ de ya.

Têgîna levkirinê, giringa ku mirov bi nerînê re wê werêne ser ziman. Her wusa, dema ku mirov di çerçoveya nerîna gotina ´rast´ de hertimî ku hewl bide ku werêne ser ziman, wê êdî mirov di nerînê de weke aliyekî darazî werê û bide nîşandin. Li vir, bo ku ev nebe, têgîna levkirinê, weke têgîneka ku çerçoveya axiftinê ya di mejî de ku bi nerînê re dihêne ser ziman a. Gotina, rastîyê ya di hundurê têgîna levkirinê de, li vir, dema ku mirov wê kifş dike, yewêtîya(aîdîyet) wê, her wusa di çerçoveya wê

gotina levkirinê de ya. Ne di çerçoveya hizra ku mirov bi mejiyê xwe ji xwe re rast dibînê de ya.

Têgîna rast dîtînê, weke têgîneka ku pirr-alî ku mirov dikarê li ser wê bisekinê ya. Di aslê xwe de hemû têgîna darazî ya diafirê, wê hinekî di temenê wê de weke têgîneka dîyarker wê hebe. Ya rast, ku mirov bi darazî hewl bide werêne ser ziman, wê têgînên weke dîtinê, hêstan, hîsê, têgînên rewşenbîrî, xwestekê, hûnerê, çandê, wêjeyê, zêhnê mirov, tevgerên mirov ên weke xûy, hişarîya mirov, têgînên deronî, civaknasî û hwd ku bi gelek aliyên din re wele hîm ên afirîner ji xwe re bijêrê. Her wusa, ev alî hemû bi mirov û zindîtîya mirov re hena. Hişarîya mirovî û zindîtî, her wusa, di vê çerçoveyê de weke du hîmên bingihînê mirov dikarê werêne ser ziman.

Rastî, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, weke têgînaka darazî, divê ku mirov wê hilde li dest. Li vir, dema ku mirov bi hiş û şûbjeya têgînî re darazê werênina ser ziman bi van têgînên ku me li parafrafa li ser vê de ku hanîna ser ziman, wê ji me re weke rê û têgînna ku em dikarin ji wan sûd bigirin bin. Têgîna mirov her wusa bi nerîna mirov re bi darazê re pêş dikeve.

Têgîn, li vir, dema ku mirov bi şûbjeya wê ya têgînî re lê dihizirê, tiştekî ji me re dihêne ser ziman, Têgînên xwe-afirandinî ku mirov bi wan re kifş dike ku zêhnê mirov bi aqilê mirov re pêş dikeve. Her wusa, aqil jî, bi zêhn re di rêwîtîya xwe ya têgînî de di pêşketinê de ya. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî ji bîrnekê û werêne ser ziman ku têgîna darazê, wê bi nerînê re hebe. Nerîn, li gorî xwestek, acibandin û hişarîya mirov heya û bi wê re di temenê xwestekê de ya. Bi xwestekê re têgîna acibandinê, wê bi rengê têgîna ´ya rast´ ku mirov wê dibînê re, wê werêne ser ziman.

Li jor, me hinekî bi têgîna hêstî re daraz hanî ser ziman. Lê li vir, divê ku mirov di çerçoveya darazê de li ser wê bisekinê. Her wûsa, têgînên weke têgîna hûnerî, têgîna çandî, têgîna wêjeyî, têgîna wênevaniyê û ankû nîgarvaniyê û hwd, çend ji wan têgînên afirîner ên bi têgîna adilandînî ên estetîkî ku hena na. Lê ev têgîn, dema ku mirov di çerçoveya jîyanê de li wan dihizirê, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku hinekî darazên mirovî ên li jîyanê na. Çand, hûner, wêje, wênegerî û ankû nîgarvanî û hwd, hemû rengên bi vî rengî ên têgînî ku pêşdikevin di jîyanê de weke nirxne nerînî ên darazî na jî. Em ji aliyê aqil ve jî, ku lê binerin, aqil bi xwe jî bi felsefeyî bê û ankû bi rengên xwe yên din ên pêşketinê bin, weke nerînî dibina darazna mirovî ên li jîyanê jî. Her wusa ev têgînên nerînî ên bi darazî, divê ku mirov wan bi teybetî

werênê ser ziman. Têgîna hûnerî, çandê, tîyatroyê, musîkê, wênegerîyê û ankû nîgarvaniyê û hwd, weke têgînna nerînî ên li jîyanê na. Her wusa ev têgîn, wê pêşketina wan, weke têgînna ku jîyanê jî bi xwe re diadilanênin bin. Dema ku em dibêjin ku wê jîyanê bi xwe re biadilênin, em keseyetîyê û hwd jî, di navê de dihasibênin û vê gotinê dibêjin.

Têgînên weke têgînên çandî, hûnerî, tîyatroyî, helbestegerî, musîk, wênegerî û ankû nîgarvanî û hwd, têgînna ku mirov dikarê bi aqilê hêstiyarî jî werêne ser ziman in. Her wusa ev têgîn, hêstên ku mirov wan kifş dike jî, hem şîyar dikin û hem jî bi têgîn û têgihiştin dikin. Di vê çerçoveyê de hêst, divê ku mirov weke çerçoveyeka hîmî a bingihînî jî werêne ser ziman. Minq, dema ku mirov helbestek lê hisand û ankû xwand, wê di wê demê de çi hêst bi me re şîyar bibin, ev jî, wê were dîtin. Her wusa gotinên ku wan hêstan şîyar dikin, gotinên helbestê na û bi wê hûnandina wan re hêst hatîya hûnandin. Di têgîna çandê, hûnerê, musîkê, wênegerîyê û ankû nîgarvanîyê û hwd de, weke helbestegerîyê wê hûnandina hêsyarî bi wan re hebe. Li vir, divê ku mirov di serî de vê yekê kifş bike. Hêst, bi gotinên wan têgînan re şîyar dibin. Li vir, gelo mirov di farqê de ya ku her hêsta ku şîyar bûya yan êdî hişeka şîyar a û yan jî êdî hişeka ku afirîya?

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku têkiliya di nav zayendîtîyê û keseyetîyê, mirov divê ku werêne ser ziman. Zerdeşt, li vir, dema ku mirov bahse têgîna estetîkê bike, bi adilandinê re weke ku cihêrengîyek kirîya nava zayendîtî û pîrozîyê de. Wî, pîrozî cuda weke astaka têgînî hanîya ser ziman. Li ser wê jî serî wastandîya ku wê salix bike. Heta deverekê, kirîya ku wê salix bike. Têkiliya di nava gîyanê û gîyanê de jî, di vê çerçoveyê de bi gotina ´baş´ û ankû ´xirabîyê´ de hanîya ser ziman. Têgîna başî û ´xirabîyê´, weke têgînna biastî na.

Her wusa, li vir, têgîna dûalîsma zerdeşt, wê di vê çerçoveyê de têgînek baş bide me. Li vir, ew salixkirina ku wî hewl daya ku bi jîyanê de werêne ser ziman, wê bike ku ew adilandinaka estetîkî biafirêne.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna dûalismê, têgîneka esttîkî ya adilandî jî bi xwe re dihêne ser ziman. Zerdeşt, ev yek, baş salix kirîya. Her wusa, di vê çerçoveyê de dema ku mirov salixkirinên zerdeşt bi têgînên wan re dihêne ser ziman, mirov vê rastîyê dibînê.

Li kurdistanê, di nava civatê de, ew têgîna wî ya ku bicihbûya, wê adilandina xwe di nava jîyana civatî de jî werêne ser ziman. Her wusa, mirov divê ku vê jî werêne ser ziman ku Zerdeşt, heta ku bawermendên

wî wê çawa cilan jî lixwe bikin, wê ew jî bê dîyarkirin. Salixkirina bi têgînê, wê were kirin.

Em dema ku li rengê jîyane civatê kurdistanî ên yazdanî dinerin, em li vir, têgîneka estetîkî ya pirr adilandî bi têgînîya wê re dibînê. Her wusa, rengê jîyanê li wê hatîya hizirin. Her xalên jîyanê, hatina bitêgh kirin. Di wê çerçoveyê de fahmkirinek afirandina.

Yazdanîyan, bi rengên ku xwe yên ku bikardihanîn ên weke kesk û sor û zer ku pîroz kirina, ew ahenga ku di nava wan de didan çêkirin bi rengên din re, wê hewl bidin ku jîyane xwe bixamilênin. Li vir, divê ku miirov vê yekê jî werêne ser ziman ku heta me jî di zimanê kurdî de maya gotina ´xamilandinê´ wê têgînaka bi vî rengî ya dîrokî bi xwe re werêne ser ziman. Em dema ku tenê li ser gotinan re herin jî, mirov vê rastiyê werêne ser ziman. Gotin, bi xwe re têgîneka ku afirî dihawênin û dihênin ser ziman. Em dema ku li wan gotinan bi nerin jî, em vê rastiyê bi rastîyên wê yên dîrokî re kifş dikin. Têgîna jîyanê, li vir, mirov dibînê ku weke ku di kurdî de dihê dihênina ser ziman, di ´xamilandin´. Gotina ´xaml´ û ´naqşê´, wê weke gotinna bi wan jîyan û mirov dihat xamilandin bûn. Gotina xamilandinê, gotinaka teybet ya têgîna adilandina estetîkî ya civatî ya weke ya ´naqşê.´ Em li vir, vê yekê jî dibînin ku reng û salixkirina wan hatîya kirin. Çend ku di nava têgîn û bawerîyê de ev hatîya kirin jî, em di vê çerçoveyê de ew şîrove û têgînên ku bi rengan re hatina kirin, wê li ser wê re xamilandina jîyanê wê werê kirin. Di çerçoveya gotina xamilandinê de adilandin, wê di nava jîyanê de werê kirin. Rengkirina jîyanê jî, wê bi wan şîroveyan re were kirin. Î ro jî, dema ku mirov li wan serdemên berê ên kevn ên civate kurdistanê dinerîn, em dibînin ku bi têgînî ´xamilandin´ hatîya kirin. Xamilandin, têgîna xweşikatiyê, bi xwe re dihanî ser ziman. Lê gotina xamilandinê, çendî ku bi bi cil û bergên ku jineka kurd di nava jîyanê de li xwe dikir û xwe bi wê xweşik dikir re dihat ser ziman, bi heman rengî wê bi gelemperîya civatî re bi heman rengî wê werê ser ziman. Heta roja me jî, ew ´daqên´ ku weke ´şanikan´ ku jinên kurd di çerçoveya wê têgîna ´xamilandinê´ de ku li xwe li rû, anî, zenî û pişta destê xwe çê dikirin, wê bidom in.Têgîna xamilandinê, her wusa weke têgînaka giring ya ku mirov wê bi çerçoveya wê re ku divê ku werêne ser ziman. Têgîna xamilandinê, weke têgînaka xweşikkirinê ya civatî bû ku jinên kurd di malên xwe de û bi xwe re dikirin bû. Her wusa, wê li ser wê re jî, êdî werêne ser ziman. Ew daq û ankû şanikên ku çê dikirin, wê gelek wate lê dikirin. Li ser wan wateyên pîroz û ankû nirxî ên civatî û hwd re, ew

xamilandin bi wan dihat kirin. Xamilandina jina kurd, bi wê têgîna wê re bi nav û deng a. ´**Xamla kurdan**´, bi xwe re dîrok nivîsandîya. Divê ku mirov wê bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman. Li gorî wê têgîna xamilandinê, wê ne tanê daq û şanikên li laş wê bihatan çê kirin.. Ji wê zêdetir jî, cil û bergên wan jî, di çerçovey gotina xamilandinê de dihatina ser ziman. Her wusa, jinên kurd ên pîr, wê ´xiftan´ li xwe kiriban. Jinên kurd ên ciwan ku ne zewicîna lê ku hatina dema zawacê, wê ´fistan´ li xwe kiriban. Jinên kurd ên ku zewîcî na û navserî xwe na, wê ´kiras´ li xwe kiriban. Her wusa, serdem bi serdem, wê wê cil û berg li gorî xwe û xweşikatîya xwe çêkiriban.

Bi heman rengî, weke ku çawa ku bo jinê cil û berg dihatina çêkirin bo mêr jî dihatina çêkirin. Her wusa ji ´şal û şapik´ên wan bigra û heta ku digihişt ´abayên pîrên wan´, mirov dikarê bahse wê bike.

Ev rewşên ku em kifş dikin bi civatî û keseyetî, wê pirr zêde pêş bikevin. Rengên têgînî ên xamilandina kurdan a estetîkî, wê li vir dema ku mirov van rewşên wan ên civatî kifş dike, mirov bi gelek rengên wann în din re kifş dike. Her wusa, têgîna xamilandina kurdan a estetîkî, weke têgînek dîrokî ya. Pêvajoyên wê ên dîrokî û civatî ên bi dîrokê re hena. Her wusa, di nava wê têgîna xamilandina kurdan a estetîkî de divê ku mirov bi civatîtî ´dengbêjîya´ wan jî werêne ser ziman. Ew jî, wê weke têgîneka pirr kevn ya pêşketî bê. Em li vir, divê ku vê yekê jî, werênina ser ziman ku têgîna xamilandina kurdan a estetîkî wê bi rengî pirr zêde di jîyanê de hebe. Heta ku dema ku miriyên wan dimirin, ew jî, bi paçên rengînî ên ku di hatina avêtin li ser miriyan re wê ew rengînî weke nirxekê bijîyandan.

Têgîna xamilandina kurdan a estetîkî, wê di çerçoveyekê de bi civatî jî, hin pêvajoyên hemdem bi xwe re bide buhurandin. Gelekî rengînîtî bi wê re pêş dikeve. Hingî, ew rengînîtî pêş dikeve, mirov dikarê weke ´modayeka hemdem´ wê rengîya wê bi cil û bergên wê werêne ser ziman. Têgîna xamilandina kurdan a estetîkî, wê xwe bi demê re her wusa bi pêşketina civatî re werê pêş xistin. Di temenê wê de nirxên ku bi pîrozî hatina dîtin re bûya. ´Rengên jîyanî´, ku di çerçoveya wê xamilandina kurdî a estetî de bahse wê dihê kirin, wê bi nirxna pîrozî û baweriyê re werina bi têgîn kirin û ser ziman. Her wusa, minaqe vê jî, têgîna ´şahmaran´ a. Şahmaran, di serî de bi ´ her sê rengên pîroz´ ên kesk û sor û zer re werê çêkirin. Kompuzisyona bi wêneya şahmaran re wê, bi reng û levkirinên wê yên bi xîzkirinê re wê, xwediyê çerçoveyek estetîzekirî jî bê. Wê rewşê de wê, reng û xîz wê levwerin. Ew levhatin wê, dema ku

ew bû wê, bi dîtinê re wê, dema ku ew hat dîtin wê, hêst û hîsan wê bi mirov re wê biafirênê. Di têgîna estetîsmê de şîroveya rengan û wateyan wan wê kûr hebê. Fahmkirina rengan wê, di wê warê de wê, zêdetirî wê, giringîya wê di wê de wê hebê. Minaq rengên ku ew li mirov xweş dihên, rengên ku ew mirov aciz dikin, rengên ku mirov ji wan nexweş dibê, rengên ku mirov ji wan xweş dibê, rengên ku ew rehetîyê didin mirov û hwd mirov dikarê werênê li ser ziman. Her reng wê bi rengîtîya xwe re wê xwediyê heyîn û bandûra xwe bê. Her reng wê ji aliyekê din ve jî wê çerçoveyek giştî a levkirî bê. Reng wê ji aliyekê ve wê, bi dîtbarîya wê re wê hebê. Li gorî rewşê wê karibê ji kesan li kesan cûda were dîtin û hêst û hîsan bide afirandin. Minaq rengê sor pirr germ û kel a. Reng zer şîrewolkî ya. Rengê reş tarî ya. Reng wê, ji aliyê din ve jî wê, weke rohniya ji rojê ku ew ji tişt û heyîna bi biriqîna wê re wê, biriqîn û têrîna ku ew **dide li çav bê**. Bi wê rengê wê reng wê bi rewşên xwe yên ku ew afrîna re wê hebin. Lê rewşek pirr teybet a li mejî ya. Dikarê pirr zêde hêst û hîsan biafirênê û mirov ji rewşan bikê rewşan de. Kêm carna rengên din tevlî van hersê rengan dikirin û ew naqşa şahmaran dihat çêkirin. Lê çend ku kêm caran reng dihatina tevlîkirin jî, pirr bi heyîdarî û baldarî tevgerîya ku ew kompozisyona bi wan hersê rengan newê xirakirin li berçav. Ev, weke têgînekê, dihat pêşxistin.

Têgîna xamilandina kurdî a estetîkî, her wusa, weke têgîneka dîrokî, çandî, wêjeyî, hûnerî, helbestgerî, dengbêjî, û hwd re mirov divê ku bahse wê bike. Her wusa bi civatî xwediyê pêşketina pêşketî a xweşik a. Têgîna xamilandinê ya estetîkî, li vir divê ku mirov bi rengên wê yên civatî û têgîna wê ya xweşikkiirn, levkirin, levhanîn û lêhatînîyê û hwd re werênina ser ziman. Em li vir, vê rastiyê pirr bi başî bi dîrokê re fahm dikin ku rengên ku li jîyane hena, wê weke nirxna werina şîrovekirin. Bi watekirina wan, wê weke hişmendiyeka ku li ser wan re dihat afirandin bê. Her wusa, bi wate kirina wan rengan re, wê êdî bike ku ew reng bi wan re werina ser ziman. Minaq, rengê ´sor´ weke rengekî ku tevgerî, nirxîyîyeka ku bi ´yazdan´ re dihat şîrovekirin re wê werênina ser ziman. Di serdema Mîtra de, wê ev rengên ku hena, wê bi wateya wan re, werina şîrovekirin. Heta ku wê bikin û bixwezin ku ji wê şîroveya rengan ku ´peyamên pîroz´ ku fahm bikin û hildin. Ev jî, wê bi bawermendîn Mîtra re pêş bikeve.

Şîroveyên rengan, divê ku mirov werêne ser ziman ku nîşanaka pêşketina hêstîyarîya ku hatîya bi têgînî kirin jî. Şîroveya rengan, wê weke şîroveyeka ku êdî jîyanê jî bi reng bike bê. Li ser wê re êdî wê

hewldana fahmkirina wê pêş bikeve. Dem ku tê serdema Zerdeşt, wê êdî zerdeşt, hinekî jî di çerçoveya têgîna estetîkî a hemdem de bike ku şîroveyeka adilandin û levkirinê ku em dikarin î ro bi têgîna estetîkê werênina ser ziman, wê bi afirêne. Salixkirinên Zerdeşt, wê zelal, saf û bi hiş û hêstîyarî bin. Şîroveyên Zerdeşt ên di çerçoveya felsefe ya wî de, vê rastîyê werênina ser ziman. Zerdeşt, li jîyanê nirxdayînekê dihêne ser ziman. Her wusa, ´gîyane pîroz´ weke salixkirinaka li ser hemûyî re dihêne ser ziman. Rewşa xamilandina li jîyanê ku dihê şîrovekirin û ya têgînî ya bi pîrozîya gîyanê re wê bi Zerdeşt re cuda were dîtin. Piştî Zerdeşt re wê Manî, hewl bide ku şîroveyek gelemper ku wan dike nava hevdû de ku pêş bixe. Şîroveyên Manî, wê têgîneka hizrî ya adilandî bê. Her wusa, çerçoveya jîyanî ya di nava gotin û felsefeya Manî de, xwediyê têgîneka estetîkî ya hemdem û pêşketî ya.

Têgîna estetismê, di roja me de bi hûner û çandê re ´modayê´ jî ji xwe re weke hîmekî pêş dixe. Moda, bi darêjkkirina cilan re tê ser ziman. Her wusa, weke modaya cilan jî tê ser ziman. Moda, wê di temenê levkirin, levhanîn û lêhatinekê de wê were adilandin. Têgîna bi adilandinê re acibandinê tê ser ziman moda ya.

Em li vir, divê ku vê vê yekê werênina ser ziman ku têgîna kevneşopîkî ya adilandinî, ji vê aliyê ve ku mirov lê dinerê, mirov dibînê ku xwediyê hîmekî mazin a. Di têgîna kevneşopîkî ya adilandinî de cil û berg jî bi tevger û xûyan re hatina levkirin, levhanîn û lêhatin.

Î ro, di nava jîyane kurdan de, weke têgînna tevgerî ên kevneşopî ên ku tenê me heta roja me tenê di nava kurdan de dîtina, raks, govend û dengbêjîtî ya. Ev jî, weke têgînna dîrokî ku hatina adilandin in. Bi jîyane civatî re hatina adilandin in. Raks, govend û dengbêjî, weke sê xoslet û teybetîyên ku tenê di nava jîyane kurdistanî de hebûn. Ev her sê, têgînên ku me bahse wan kir, bi dîroka civatî re dîroka wan ne du û ankû sê hezar salan re na. Di vê çerçooveyê de, bi tevger, xûy û adetên civatî re mirov divê ku li wê binerê. Di nava jîyane kurdistanî de kevneşopî, xwediyê dîrokeka pirr zêde demdirêj a. Kevneşopî, bi hezaran salan xwediyê dîrokekê ya.

Kevneşopî, weke têgîneka adilandinî ya civatî ya herî kevn a li kurdistanê ya. Dîroka kevneşopîtîyê û adilandinîya wê em ji serdemên sûmerîyan û heta serdemên qasît, gûtî, hûrî û mîtannîyan re mirov dikarê bahse wê bike. Piştre jî, serdemên Medîya, Şadadî, Merwanî û hwd jî, weke serdemna hemdem bin. Di van serdemên dawî de wê kevneşopî bi

têgîneka bi aqilî wê pêş bikeve. Her wusa, mirov di nava kevneşopîyên xwe de xwe bizane û aqil hîs dikin û dibînin.

Kevneşopî, wê weke têgînaka ku jîyanê bi xwe re bi rêzik û rêgez dike ya. Her wusa, rastîya civatê di çerçoveyekê de diadilêne. Keseyetîyê, bi wê re li gorî wê bi rêxistin, têgîhiştin û wate dike. Her wusa, di nava wê jîyan kevneşopîkî de hemû hal û tevger, xûy û adetên mirovî ên keseyetîyê civatî û hebeş hatina kifşkirin. Mirov, di vê çerçoveyê de, bi wan rêgez û rêzikan, xwe dibînê, pêşîya xwe dibînê, dihizirê û dihêne ser ziman. Ev jî, weke rengekî pêşketina wê ya. Kevneşopî bi rêzik û rêgezên wê re xwwediyê nerîneka xwe ya keseyetî û piştre jî civatî ya. Bo vê yekê, bi nerînê re darazî hatîya pêşxistin. Nerîn, pêşketîya. Em li vir, tenê li serdema Zerdeşt binerin jî, mirov wê vê yekê bibînê. Di serdema Zerdeşt de, bi rêzik û rêgezên têgînî ku hîm û temenê bawerî û civatîtîyê diafirênin, zelal û têgîhiştî na. Di serê mirovan de zelal in. Mirov li wan dinerê û diaxifê. Dema ku Zerdeşt hizrên xwe bi ´avesta´ re dihêne ser ziman, ku rastî bertekan tê jî, wê bi wê têgîna zelal ku di mejî de bi hiş bûya re bibe. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman.

Adilandina Kevneşopîkî, bi têgîna acibandinê re xwediyê heyîn û hebûna têgînî ya pêşketî ya. Adilandina kevneşopîkî bi têgînaka sentetîkî jî xwediyê pêşketina xwe ya. Her wusa, bi cil û bergan salixkirina bi wê re ku dihê kirin, hinekî jî, mirov dikarê bi wê re werêne ser ziman. Cil û berg, her wusa, darêjkna sentetîkî ên objeyî ên têgîhiştî na. Her wusa, li vir, dema ku mirov di wê çerçoveya van objeyên sentetîkî ên têgîhiştî re dinerê, mirov dikarê bibêje ku ew têgînên ku bi cil û bergan dihê ser ziman, di nava jîyane xwezayî de bi têgînek şûbjeyî de mirov dikarê wan werêne ser ziman. Ew reng û têgîn, têgînna şûbjeyî ên ku ji xwezayê hatina hildan in. Xweza, objeya têgînî ya kevneşopîkî jî li vir diafirêne. Li ser wê re salixkirina van pêşketinên kevneşopîkî jî, wê weke rastîyeka wan ya têgînî û hîmî jî bê. Kevneşopî, pergalek têgînî ya jîyanî ya. Kevneşopî, di vê çerçoveyê de adilandina ku di nava xwe de bi ser û cilê mirov re û bi mirov re dide çêkirin, wê kevneşopîyê bike rastîyek afrîner jî. Her wusa, kevneşopî, bi wê pêşnûma xwe ya têgînî re wê afirandinê salix dike.

Li vir, dema ku em li kevneşopîyê dinerin jî, vê vê yekê bi wê re dibînin. Têgîna adilandinê, weke têgînek xwezayî ya ku afirî ya. Têgîna adilandinê, di temenê hoyandinek li hevdû de xwediyê têgînek

hiyererşîkî jî ya. Her wusa li vir, dema ku mirov bi kevneşopîyê re dihizirê, mirov vê aliyê bi teybet kifş dike.

Li vir, divê ku mirov hinekî jî li ser wê rengê hoyandina adilandinê jî bi hizirê. Di nava jîyane asayî de mirov dema ku cilekê li xwe dike, mirov li gorî nerîna xwe ya ku mirov xwe bi wê xweşik bibînê li xwe dike. Her wusa, ew têgîn jî, car bi car di serî de diafirê ku wê li dervî me ve wê me çawa bibînin jî, li berçav hatîya girtin. Li vir, ew weke têgîneka hoyandî ya adilandinê ya. Têgîna adilandinê, bi lixwekirinê û hişkirinê re xwe dide dîyar kirin. Her wusa, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov di vê çerçoveyê de divê ku vê rastiyê bi teybetî kifş bike û werêne ser ziman. Têgîna kevneşopîkî ya adilandinê, di vê çerçoveyê de, aliyekî wê tê din jî heya. Ew jî, her wusa ew a ku hevbeşbûna nerînî ya.

Têgîna estetîkî, bi keseyetîyê mirov divê ku werêne ser ziman. Di temenê wê de ast û radaya zanîna mirov a di mejîyê mirov de heya. Li ser wê ast û radaya zanînê re mirov dikarê bahse wê bike. Nerîna mirov, li gorî wê têgîna mirov ya bi ast û radaya mirov a.

Her wusa bi nerînê re dema ku mirov dinerê bi acibandinê re mirov nerîna xwe dihêne ser ziman. Ya ku mirov wê diacibêne, dibê weke darazaka mirov ya bi nerînê re jî. Di serî de ew nerîn, her wusa wê bi têgîna dîtinê re biafirê. Mirov, dema ku li wêneyekê û ankû nîgarekê dinerê, mirov wê bi hêstna ku bihiş ku di me de şîyar bûna, bi wan re mirov li wê dinerê. Ew hêstên me, bi nerîn û dîtinê re wê levkirinekê bi xwe re bide çêkirin. Li ser wê re êdî wê acibandina mirov hin bi hin biafirê.

Têgîna acibandinê, weke darazeka nerînî wê xwe bi têgîna hêstîyarî re bide dîyarkirin. Her wusa, têgîna hêstîyarî, li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov weke hişarîyaka şîyar wê dibînê. Her hêst, weke têgînaka hiş ya şîyar a. Bi gotinaka din, mirov dikarê bibêje ku hêst hişê şîyar a jî. Ev hişê şîyar, di çerçoveya wê hêstê û ankû hişê şîyar de bi xala ku lê hatîya hoyandin û hûnandin jî, wê nerînê bi afirêne. Hêst, weke hişekî şîyar, mirov divê ku weke darazek têgînî jî ya bi nerînê re werêne ser ziman.

Têgîna adilandinê ya estetîkê, li vir, di nava jîyanê de xwe diafirêne. Her wusa, ji jîyanê rewşên jîyanî ku hatina qaydkirin, wê werina nivîsandin. Bi wê nivîsandinê re êdî ew rewş, weke rewşna têgînî yên hizrî na. Bi rewşê re ew darêjka wan heya. Piştre jî, ku ew weke tîyatroyekê û ankû rewşek çandî û hûnerî hat rastkirin, wê bi xwe re bibe weke têgîneka ku êdî diadilêne jî. Di mejî de her têgîna bi darêjk,

adilandinaka ku em dikarin weke têgîneka estetîkî jî werênina ser ziman a jî. Li vir darêjk, weke rastkirineka adilandî ya. Ew darêjk, bi hişmendîya wê re wê di jîyanê de êdî bi xwe re bidest afirandinê bike.

Dema ku em bi têgîna estetîkê re bi nerin, bi têgîna hêstîyarî ku mirov li wê dinerê û bi wê re dihizirê, bi wê darjkê re li wê dihizirê. Estetîsm, li ser têgîna rengînî ya sentetîkî jî xwe salix dike. Her reng, weke têgîneka estetîkî ya ku bi xaml êdî ku afirîya ya. Di têgîna levkirina rengan de mirov bi wê re lê dinerê. Her reng, bi tîrîtîya xwe ya bi xwe re wê li gorî wê bandûrê li mirov û li mejiyê mirov bike. Her reng, bandûraka wê ya li mejî heya. Ev bandûr li gorî tîrîtî û levkirina wê ya bi têgînî ya. Levkirin û ankû levkirin, bi rewşê re bi lêhatînîya ku hatîya kirin re wê kompozisyonekê bi xwe re biafirêne. Ev, wê di mejî de bi wê çerçoveya wê re xwe bide dîyar kirin. Lê di nava wê çerçoveyê de reng, bi tîrîtîya xwe re weke hêzek xort ya têgînî ya. Her reng, bi hêstî, weke hêzek xort ya jîyanî ya. Reng û hêzîtîya têgînî, mirov divê ku bi hevdû re hilde li dest û werêne ser ziman. Bandûra reng, li ser deronîya mirov, ji ya ku em dizanîn zêdetir jî heya. Her reng, her wusa dema ku mirov li wê dinerê, weke nerîneka hişî ku mirov wê hilde li dest, wê bi xwe re şîyarîya ku bi hêstîyarî ku dide çêkirin re wê bandûra wê hebe. Reng, hêst a. Tîrîtîya hêstê ya. Em li vir divê ku vê yekê werêne ser ziman. Jîyane bi reng, em dikarin weke jîyaneka bi hêst û hêstîyarî jî werênina ser ziman. Her wusa, weke jîyaneka bi hişê şîyar jî werêna ser ziman. Her wusa her reng, bi tîrîtîya hêstê re wê di nava jîyanê de weke hişekî şîyar ê tîr wê were li holê.

Em dema ku bahse reng dikin û her wusa levkirin û levhanîna wan di nava hevdû de dikin, hinekî jî em bahse levkirin û levhanîna hêstan a di nava hevdû de jî dikin. Her wusa, em bahse levkirin û levhanînaka tîrî jî dikin.

Reng, hinekî jî xaml a. Yanî tîrîyaka têgînî ya adilandinî ya. Dema ku mirov bahse wê dike, her wusa mirov werêne ser ziman. Reng, bi bandûra xwe ya li hêstên mirov heya re mirov wê hîs dike. Bandûra rengê, bi awa, reng û her wusa levkirina wê re li mejîyê mirov heya. Li ser deronîya mirov, ew bandûr pirr zêde heya. Li vir, dema ku mirov bahse têgîna reng dikin, em bi vê yekê re bahse wê têgîna deronî jî dikin. Reng, hêstîyarîya tîr a levkirî ya.

Em dema ku bahse rengê dikin, em li vir, dizanîn ku em bahse têgîneka levkirî a bi darêjk dikin. Têgîna rengê, em nikarin bi rengê re lê bi hêsta xwe re werênina ser ziman.

Têgîna rengê, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa bi vir ve girêdayî dema ku mirov hewl dide ku fahm bike, mirov bi hêstîyarî wê dike. Hêst û deronî, weke dulingên bi hevdû re hoyandî na. Hêst, deronîyê diafirêne. Deronî jî, hişa hêstî ya şîyar ku bi têgînî hatî hoyandin a. Di dema ku mirov li rengekî pirr zêde dinerê, heya ku ew reng li ber çavên mirov hin bi hin winda jî bibe. Weke ku neyî bibe. Ev jî, ji çi tê? Ev ji wê têgîna hişî ya hêstîyarî ya şîyar tê.

Teybetîyeka rengînî heya ku bi nerîna li lê re çendî ku mirov zêde lê dinerê, ew têgîna bi bandûrê re wê zêdetirî were dîtin û xwe bide dîyar kirin. Her wusa, zêde nerîn wê reng bike têgîn. Wê reng di mejî de hin bi hin weke qalibê qaşayê ku dihalihê, wê ji ber çav hin bi hin bibe. Weke ji rengekî gelek reng li berçav rû bidin. Minaq, rengekê sor ê tîr, dema ku mirov bi nrîneka lê hoyandî ser sih dakêkayê re ku lê binerê û hîç nerîna xwe jê nebe, wê ew tîrîtî, piştre ku mirov çavên xwe ji wê hilda û ku me çavên xwe bi aliyekî din ve jî da, wê were çav. Û ankû, wê ew reng wê ji berçav bi gûharînekê xwe bide dîyar kirin.

Reng, her wusa bi nerînê re xwe dide dîyar kirin. Reng li jîyanê dihê afirandin. Em nikarin tenê bibêjin ku tenê ew tîrêja ku tê û li ´retîna´ ya çavên mirov dikeve û piştre diafirê ya. Reng, bi rohniyê re heya. Her wusa, rohnî, wê diafirêne. Reng, hinekî jî rohnî ya. Bandûra li rohniyê ya ji tiştê ku li gorî hin rewş û ankû pozisyonna ku ku dibê, wê diafirêne ya. Ev jî, bi dîtinê re xwe dide dîyar kirin. Pozisyona rewş, rohnî û nerîna mirov a bi çavên mirov re, weke sêkika ku bi wê re di nava wê de reng xwe dide dîyar kirin a.

Reng, her wusa, têgînek dîtbar ya ji jîyanê ya. Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman. Têgîna rengê, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov wê bi hêstê re dikarê salix bike. Mirov nikarê rengê bi tiştekî din re salix bike. Lê mirov dikarê bi rengê re salix bike. Hêst, weke têgîneka ku li vir, mirov bi şîyarî werêne ser ziman. Têgîna rengê, weke mijaraka kûr a ku mirov divê ku mirov li wê dihizirê ya.

Têgîna rengê, giringa ku mirov li wê bihizirê. Reng, weke hêsta tîr a. Di nava wêneyekê û ankû nîgaraka ku hatî çêkirin de reng, weke hêsteka ku tîra. Rengê ku dihê salixkirin bi çêkirin û boyaxkirinê re, tîrîtîyek hêstî bi xwe re dihêne li holê. Reng, dema ku mirov li wê dihizirê, li vir, giringa ku mirov werêne ser ziman ku reng tîrîya wê tîrîya hêstî ya. Her wusa, tîrîya rengî û levkirin û levhanîna rengînî, mirov divê ku fahm bike. Reng, çendî ku tîrîtîya wê dihê kirin, her wusa ew rengê xwe yê ku heyî jî, hin bi hin winda dike. Çendî ku tîrîtî bû, wê gûharîn bi wê re

bibe. Ev, weke destûreka rengê ya afirînerîya wê ya. Tîrîtîya rengê, dema ku dihê kirin jî, bi rewş rohniyê re xwe diadilêne û dihêne li holê.

Têgîna rengê, li vir, li ser levkirin û levhanîna wê re giring a ku mirov li ser wê bisekinê ya. Levkirin û levhanîn, wê lêhatinekê bi hêstan re bide çêkirin. Xatên rengînî, wê li vir tîrîtîya wan bi kifşkarîyekê re were dîtin. Levkirina rengan, weke levkirina hêstan a. Her reng bi hêstîtîya xwe ya tîrî re, weke nerîneka ku mirov dikarê wê fahm bike ya. Di nava rengên jîyane kurdan a kevneşopîkî de giringî dayîna li rengan weke teybetmendiyekê hertimî derketîya li pêş. Bi levkirina rengan ew kevneşopîyên xwe hanîna ser ziman. Reng, dema ku dihanîna li holê jî, wê çawa di nava hevdû de di ahengekê de werina ser ziman, li wê jî dihat hizirîn. Reng, di jîyanê de weke têgînna tîr ên hişî na. Her wusa, fahmkirina rengan, wê di vê çerçoveyê de fahmaka giring bê.

Bi dîrokê re reng, weke mijaraka ku li ser wê hatîya sekin a. Her wusa, dema ku mirov li têgînên bawerî ên kurdistanî dinerin, em dibînin ku salixkirina rengan di nava têgîna bawerîyê de bûya. Bandûra rengan, bi vê yekê, mirov kifş dike ku hatîya dîtin û kifşkiirn. Ew bandûra rengan bi têgînekê bawerî re hatîya hanîn levkirin û levhanîn.

Ji ber çi giringa ku mirov vê xate olî ya kurdistanî bi vir ve girêdayî werêne ser ziman? Bi sê sedeman giringa ku mirov werêne ser ziman. Sedema pêşî, ew a ku weke têgîn û dîroka herî kevn a û gelek pêvajo û serdemên demdirêj ên têgîhiştin û pêşketinê bi xwe re buhurandîya. Her wusa weke sedema duyem jî, di çerçoveya jîyanî de salixkirina jîyanê hatîya kirin û reng jî di nava wê salixkirinê de hatîya bi wate kirin. Ev jî, weke têgînekê ya ku mirov biteybetî li ser wê bisekinê ya. Levkirin û levhanîna têgînî, birengan re hatîya kirin. Vê jî, di nava jîyane civatî de kevneşopîyek dîrokî afirandîya. Sedema sêyem jî, her wusa bi salixkirin û her wusa levhanîna bi rengan re ya têgînê ya. Her wusa, em dema ku diçina serdemên hûrî û mîtannîyan, em vê yekê baş dibînin ku levkirina têgînî bi rengan re hatîya çêkirin. Ne tenê bi rengan re, her wusa bi têgîna teybetî û xosletan re jî, ev hatîya kirin. Her wusa, şêrê ku baskê eylo pêve hatîya çêkirin. Mirovê ku laşê wî weke laşê şêrekî ya hwd, a.

Ev rengê salixkirina bi teybetî û xosletan re wê weke aliyekî giring ê afrîner bê. Li ser wan re salixkirina bi nerx hatîya kirin. Ev levkirin û levhanîn hemû, di çerçoveya nerîn û darazekê de hatina kirin. Her levkirin û levhanîna bi nerînî, bi hebûna xwe re darazaka têgînî ya. Em li vir, divê ku vê yekê bi teybet werênina ser ziman.

Levhanîn û levkirin, bi nerînê re weke têgînekê ya. Her wusa, dema ku mirov bahse têgîna levkirin û levhanînê dikin, em di farqê de na ku em bahse gelek têgînên ku hatina hanîn li cem hevdû û bi hevdû ve kirin. Ev levkirin, bi hevdû re ku hatkirin, wê weke nerînekê xwe bide dîyar kirin. Her têgînên ku hatina salixkirin û di mejî de wateya wê dihê zanîn ku dihênin hanîn li cem hevdû, wê bi wê re ew wate ya wan ya ku hatî salixkirin jî, wê çawa bi hevdû re weke kirin yek û bi hevdû re bê kirin weke têgînekê, ew jî, weke mijaraka darêjkî ya têgînî ya ku mirov li vir li ser wê bisekinê ya. Levkirina wateyê û ankû bi hev ve kirina wateyê bi hevdû ve, wê weke rastîya wê têgîna levkirin û levhanînê bê ku dihêne ser ziman. Reng jî, bi heman rengî, dema ku mirov li wê dihizirê, bitêgîna rengê ku mirov li wê dihizirê, mirov divê ku werêne ser ziman ku gelek reng bi rengekî dikarin werina dîyar kirin. Ev jî, di nava wê de na. Dahûrkirina rengan, wê her wusa, bi têgînê re werê kirin. Ev dahûrkirin, wê salixkirina wê ya li ser hêstê re wê weke aliyekî wê bê. Lê aliyê wê yê din jî bi şîroveya(dahûrkirina) wê ya ji hevderxistina rengê ya. Ji hevderxistina rengan, wê ppêşî ji me bixwezê ku mirov rengê salix bike. Li ser wê salixkirinê re êdî hewl bide ku wê fahm bike û werêne ser ziman.

Têgîna rengan li vir, dema ku mirov li wê dihizirê bi awayekî ji hevderxistina rengan re mirov bi wê re tê digihijê. Reng, kombînasyonaka. Bi wê kombînasyonê re levkirinek û levhanînek xwezayî heya. Dema ku em bi têgîna rengê li wê dihizirin û dihizirin ku di hundurê rengekê de dikarê gele kreng hebin, hingê, em divê ku werênina ser ziman ku bi levkirin û hevhatina rengan re ew rengê ku mirov wê dibînê afirîya. Ew reng, bi heyîn û hebûna xwe re weke kombînasyonakê ya. Ew kombînasyona rengê, salixkirina wê, êdî giringa ku mirov li ser wê bisekinê. Dahûrîya wê, wê reng weke têgînekê raxê li berçav. Reng, em dema ku wê dahûr bikin û jevderxin û çendî ku me jevderxist jî, wê bi wê jevderxistinê re hin bi hin dîyarîya xwe li holê winda bike. Ji ber ku ew kombînasyona wê, ji hev diçê. Ew ji hevçûyîna wê jî, wê êdî ya reng ji holê rake û ji berçav winda bike û yan jî wê reng bide gûharandin. Bi rengekî din werêne li holê. Bi kombînasyona reng re, rengê reng ê ku hatîya li berçav bi salixkirinê re, wê bi tîrîtîya wê re werê dîtin. Ew tîrîtîya reng ya kombînasyonî, weke ew hêtîyarîya me, wê bi xwe re salix dike û bi wê re dide kifşkirin. Salixkirina reng, bi têgînî dahûrî ya. Lê bi hêstî şîrove ya. Li vir, dema ku mirov bahse wê kombînasyona reng bikin, ew têgîna bi gotina xamlê û ankû xamilandinê

re ku me li jor hanî ser ziman dihê berbîra me. Her wusa, li vir divê ku mirov werêne ser ziman, Xamilandin, bi têgîna xwe re têgînek kombînasyonî jî dihêne ser ziman.

.

**Têgîna estetîsmê a teorîkî, rewşenî û rewîstî**

Têgîna estetîsmê ya têgînî her wusa dema ku mirov li wê dihizirê mirov wê bi şûbjeya wê ya têgînî re kifş dike. Têgîna şûbjeyî, li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov wê bi kevneşopîya civatî re dikarê wê kifş bike. Kevneşopî, weke pergalek têgînî û teorîya kirinî(piretîkî) ya jîyanî ya. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov wê dihilde li dest û wê fahm dike, mirov bi rêgezên wê re fahm dike.

Têgîna darêjkê her wusa li vir, weke xale giring ku mirov wê kifş bike ya. Têgîna şûbjeyî ya têgîna darêjkê, wê bi awayê wê yê ku heya re wê xwediyê heyîneka têgînî bê. Weke ku me li jor bi têgîna rengê re hanî ser ziman, her wusa têgîna estetîsmê xwe bi şûbjeya xwe ya têgînî re dihêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna estetîsmê, wê bi têgîna şûbjeyî ya di derbarê wê de, bi wê afirandina wê dibe. Her têgîna objeyî ku bi darêjk afirî û reng û nav standî, êdî bi xwe re têgîna xwe şûbjeyî diafirênê û bi dest hizirandinê dike. Her wusa bo têgîna estetîsmê jî mirov dikarê vê yekê werêne ser ziman. Lê têgîna estetîsmê, bi heyîna xwe re, weke têgînek şûbjeyî ku bi darêjk dike û diafirêne ya.

Di çerçoveya têgîna kevneşopîyê de dema ku mirov dihzirê, mirov her wusa bi hizrên ku hena re rêzikên têgînî ku jîyanê didina dîyarkirin dibînê. Ev têgînên bi rêzikan re dihên ser ziman, di mejî de xwediyê şenberîya heyberî jî na. Mirov bi wê şenberîya wan re êdî wê kifş dike. Li vir, dema ku mirov bi wê re li wê dihizirê, mirov wê rewşê weke têgînekê kifş dike.

Di jîyanê de têgînên ku dihên bidarêjkkirin û salixkirin ên weke hûner, çand û musikê û hwd, li vir, mirov wan bi rengekî teybet kifş dike. Berhemek hûnerî, her wusa, têgînek şûbjeyî ya hatî afirandin a.

Em li vir, dema ku li têgîna estetîsmê dihizirin, em bi wê re vê rastiyê kifş dikin ku weke têgîneka ku diadilênê ya. Her wusa li ser keseyetîîyê re jî li vir cardin mirov çend gotinan divê ku bibêje. Lê bi keseyetîyê re dema ku mirov werêne ser ziman, aliyê hanîna me ya li ser ziman a bi keseyetîyê re wê xwediyê têgîneka rewîstî jî bê. Ev jî, wê êdî di vê çerçoveyê de bi me bide xwestin ku em aliyê estetîkî ê rewîstî jî kifş bikin. Di aslê xwe de hemû têgînên ku adilandinî ku mirov wan dihêne ser ziman bi zêhn re bin û ankû bi hêstê re bin, wê xitabî keseyetîyê jî

bikin. Yanî, bi vê rengê weke ku aliyekî wan têgînan ê rewîstî bi xwezayî bi wê têgîna keseyetîyê û hewldana fahma wê re xwe dide dîyar kirin. Her wusa, çendî ku mirov bi fahm bû, wê di derbarê xûy û teybetî û tevgerîyên mirovî de jî zanîn û hiş biafirê. Ji xwe li vir, xûy û tevgerîyên qarakterê keseyetîyê, têgînak estetîsmê bi wê re dihêne ser ziman. Her wusa, keseyet, bi xwandinê re xwe diadilêne. Ev tê wê wateyê ku xwandin û ankû perwerde, têgîneka ku aliyekî wê yê ku em dikarin bi têgîna estetîsmê re jî werênina ser ziman heya.

Rastkirin û adilandina li ser zêhnê mirov re bi perwerdeyê dibê. Ev jî, wê bi hişekî bibe. Her têgîna ku mirov bi zêhnê xwe re bidest xist, wê hêstekê bi hişê wê yê ku afirî re biafirê. Ev jî, di aslê xwe de wê hêstê bi me re dide çêkirin ku her têgîn, bi hiş re hêstîyarîya wê têgînî heya. Ankû, her têgîn hêsteka têgîhiştî ya ku mirov divê ku wê êdî bi vê rengê fahm bike ya.

Têgîna hêstî, her wusa li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku bi hîsê ya. Her hîskirin, wê bi têgînekê re bê. Ji xwe her hîskirin têgîneka jî. Ev hîskirin, dema ku mirov wê kir, wê bi xwe re êdî wê bide kirin jî. Ev jî, çend ku weke şûbejeyê ew hîs pêş dikeve, wê bi hiş re li ser wê şûbjeyê re têgînek duyemin a şûbjeyî bi xwe re bide afirandin. Têgîna hêstî, di temenê fahma me de ya. Hîskirin, weke têgînaka ku mirov li vir bi teybetî bi fahmkirinê re li ser wê bisekinê ya. Hîskirin, çendî ku tîrîtî bi wê re (pêre) bû wê zîzbûn bi wê re (pêre) biafirê. Zîzbûn, hêstîyara şîyar a. Ev jî, weke şîyarîyaka ku mejî ji girtinê divekê ya. Ev jî, tê wê wateyê ku ev zîzbûn, hîmekî fêrbûnê ya. Her wusa, têgîna fêrbûnê, li vir, dema ku mirov wê dihêne ser ziman bi hêstan re, mirov bi wê re têdigihê ku hêst li jîyanê bi dîtin û fêrbûnê re dibê. Dîtin û kifşkirin, wê çê bike. Her wusa, wê şîyarîyê bi hişarî bide çêkirin. Ji xwe hêstîyarî jî, şîyarîya hişî ya. Divê ku mirov bi vê rengê werêne ser ziman, ku hêst weke hêzek afrînerî ya bi şîyarîya wê ya hişî re. Şîyarîya hişî, bi hêstê re weke ku me li jor bi têgîna fahmkirina rengan re hanî ser ziman re diafirê.

Di hundurê wêneyeka ku hatî çêkirin bi dest de rengên ku hatina levkirin û bi hevdû re kirin, wê bi wê kombînasyona ku li berçav diafirênin, wê têgînna bi me re bi afirênin. Ev pêşîm weke hêst in. Lê em li vir vê jî bibêjin ku her hêsta ku afirî û pê de, wê piştre weke pêvejoyaka wê ya duyemin ya di mejî de wê bê têgînek hişî û piştre aqilî.

Li vir, dema ku mirov hewl bide ku bi wê re werêne ser ziman ku têgîna estetîsmê bi nerîna xwe re xwediyê têja xwe ya wê rast bê. Ev têja bi têgînî, ku mirov wê dihêne ser ziman, mirov wê bi hêstan re dihêne ser

ziman. Weke têgînek estetîkî dema ku yek ji min re bahse dîtîna govendekê bike û bibêje çendî hijê kirîya û jê xweş maya, bi wê re ku çend mirovên din jî werina cem min heman hizrê werênina ser ziman, wê wê bide nîşandin ku çendî bi hêstî ji wê têj girtina bide nîşandin. Têjgirtina bi hêstê re li vir, bi têgînî, me li jor hinekî bi têgîna acibandinê re hanîbû ser ziman. Li vir bi têgîna darazê re mirov dîsa divê ku werêne ser ziman ku her hanîna li ser ziman a bi têgîna acibandinê, wê weke têjek estetîkî ya bi nerînê re jî bê. Têja estetîkî, her wusa bi dîtin û acibandinê re ew hêsta xweş ku bi mirov re çêbû re xwe dide nîşandin re dihê dîtin.

Têja ji hêstê girtin, weke têgîneka ku mirov wê hewl dide bi wê têgîna estetîkê re fahm bike ya. Li vir, dema ku mirov wê têgîna acibandinê dihêne ser ziman, mirov hinekî jî bahse wê dike. Têgîna hêstî ya xweş, çendî ku gelekan bi dîtina xwe re girtina û weke hevdû hanîna ser ziman jî, wê di temenê xwe de bi têgînê re cudahîya wê ya bi nerîna darazî re wê hebe. Em li vir divê ku vê yekê werênina ser ziman. Dema ku mirov tiştek aciband û ji wê têjek hêstî girt, ev wê bi me re weke têgînekê hebe. Di nerînê de her nerîn, ne weke hevdû ya. Li vir, divê ku mirov vê jî bi wê re werêne ser ziman ku nerîn, wê bi têgîna xwe re fahm bike.

Bi vir ve girêdayî mirov dikarê vê minaqê jî bide. Yeka ku xwe xwe dixamilêne û xweşik dike, bo çi wê dike? Her wusa, li vir, ew têgîna xwe xweşikirinê a jinê bi xwe adilandin û xamilandinê re, wê were dîtin. Ev, weke têgînekê heya. Xwe adilandina bi hewldana xwe xweşikkirinê, wê di temenê xwe dana acibandinê de bê. Têgîna acibandinê, her wusa weke têgîneka li ser ast û radayekê de ku afirî ya. Mirovekî ku dema ku yeka xweşik û li xwe meyizendî dît û aciband, wê piştre ji yên din ên ku dîtin jî wê heman dîtinê bixwezê ku bibînê. Ev jî, bi têgîna acibandinê ya mirovî re ya. Her wusa, acibandin, weke têgîneka ku ji mirov û li mirov ku digûharê ya. Xweşikatî, bi vê re acibandinê bi nerînê re dihêne.

Xweşikatî, ne tenê hêsteka ku afirî ya.Herwusa bi xweşikkirinê re rewşeka ku hatî afirandin a jî. Xweşikatî, weke xanîyekê ku li li ser stûnekî disekinê ya. Ew stûn jî, acibandin a. Ya ku wê hêsta xweşîkatiyê dirakê serpîyan û şîyar dike hanîna ser ziman ya acibandina wê ya.

Xweşikatî, bi hêstek zîz û tenik re heya. Lê ew hêst jî, bi xweşikkirinê re weke ku xwe salix dike hîsekê çê dike. Hîsa xweşikatiyê, wê her wusa pirr zêde bi hêstîyerîyekê were dîtin. Hêsta xweşikatiyê, wê bi wê hîsa xweşikatiyê re bi têgîna acibandinê re bê. Levkirina ku hatî çêkirin, wê

têgîna acibandinê dîyar bike. Xweşikatî jî, her wusa levkirineka adilandinî ya.

Di serdemên berê de jinan, wê cilên rengîn li xwe kiriba bo xwe xweşik bikira û bide nîşandin. Her wusa, heta roja me de jî gotina xweşikatiyê di kurdî de ew têgîna xweşikkirinê bi xwe re parastîya û hanî ya. Ji ber vê yekê ya dema ku mirov gotina xweşikkirinê ji xweşikatîya jinekê cuda, bi tiştekî din re dihêne ser ziman, di mejiyê mirov de weke ku mirov şaşîyek kiribê hêstek bi mirov re diafirê. Gotina xweşikatîyê, wê têgîneka xweşikkirinê ya bi jinê û cil û bergên wê re bi xwe re werêne ser ziman.. Her wusa li ser wê re xwe bi wate bike. Rengê jîyanê, bi wê re dihat hanîn ser ziman.Gotina xweşikkirinê, dema ku bo tiştekî din dihat bikarhanîn, weke ku şibandinekê di mejî de bi wê xweşikatîya jinê re bike li mirov dikir. Hê jî, ev hêst, dema ku mirov gotina xweşikatiyê bi kar dihêne bi mirov re çê dibê. Jin, xamla jîyanê ya. Xweşikatiyeka. Têgîna xweşikatîyê, bi têgna acibandinê re mirov dema ku li wê dinerê, mirov wê bi wê re wê kevkirina têgînî kifş bike. Her wusa, kombînasyona bi xweşikatîyê re ku dihê li holê, mirov li vir divê ku hinekî balê bikişêne li ser wê. Ew kombînasyona bi reng û rewş û awayê adilandinê re ku dihê kirin, ku bi nerînê re hat acibandin wê bê xweşikatî jî.

Li ser têgîna acibandin û xweşikatîyê re em dikarin bi têgîna kevneşopîyê re herina serdemên berê jî. Di serdemên berê ên kurdistanî de wê bi kevneşopî û rengên wê yên ku bi rengên cil û bergan ku dihat saixkirin re were dîtin. Her wusa, di jîyanê de çêkirina xanî û mal û her wusa kirmanên weke bi naqş, wê weke têgînna teybet ên têgîna adilandinî a estetîkî bin. Di serdemên berê de her wusa di nava jîyanê de çêkirin û rastkirina hewirdora xwe, weke hewldanakê bûya.

Bi wê dîzaynkirinê re ya xweşik û ku li berçav xweşik adilandî tê dîtin, dihat xwestin ku werê çêkirin. Pirranîya çêkirinên weke kirman û ankû malan, li gorî têgîna yazdanî dihatina çêkirin. Her wusa, têgîna estetismê ya yazdanî, wê serdestîya xwe bi wê rengê bi kevneşopî û avakirinê re bide dîyarkirin. Bi awakirin û naqşkirin, wê weke karekî teybet xwe bide dîyarkirin. Naqşkirina di destê jinên kurd de ku dihat çêkirin, minaqaka vê ya teybet a ku divê ku mirov li ser bisekinê ya. Ji xwe gotina ´naqşê´ bi xwe jî, di wateya xwe ya ku di serê me de dide çêkirin ew a ku hûnandina li ser paç ya bi dest a. Bi wê re jî, ew çêkirina ku dihat çêkirin, wê bi motivên xweşik ên ku li berçav pirr xweşik dihatina acibandin wê bihata çêkirin. Di wê de, wê çi reng dihatina

bikarhanîn, wê pirr zêde li ser wan bisekinî yan. Jinên kurd, bi naqş, ji kevîyên lihêf, doşek û balgihan bigra û heta ku yên çêkirina xaliçeyên ku bi hêt ve di hundurê malê dihatina dalaqandin û hwd re wê ew çêkirin çêbikiran. Ev çêkirin, her wusa karekî hûnerî ê bi hezara salan bû ku di destê jinên kurd de bû.

Jinên kurd, bi wê naqşkirinê, mala xwe û cil û bergên xwe xweşik çê dikirin. Bi wê naqşê, wê hundurê mala xwe li gorî ku wan diaciband wê biadilandan. Bi wê re cilên ku li xwedikirin jî wê çê bikiran. Her wusa, dema ku kenzeyek çê dikirin, wê çi naqşê li ser wê çê bikin, li wê jî dihizirin. Li vir, em bi gotinî li ser bisekin in ku gotina ´naqşê´, bi qasî ku bi têgîna xwe ya ku bi wê hatî salixkirin re bahse wê naqşa ya ku bi dirûtinê dihat çêkirin dihat kirin, bi heman rengî ew wêneya ku bi naqş li ser paç dihat çêkirin û ku dihat temem kirin jî, dibû naqşek. Her wusa, bi gotinaka din, wateya têgîna nîgarîya wêneyê ku bi dest çêkirina di hundurê naqşê de dihat ser ziman. Bo vê yekê, dema ku kenzeyek dihat çêkirin, ji wê kenzeyê wê re wê çi motiv û ankû xatên xamilandinê bihata çêkirin li wê dihat hizirîn. Wê çi reng bi hata bikarhanîn, ew jî bi teybetî dihat kifşkirin. Di kûderê de wê çi reng bi heta bikarhanîn ew lê dihat hizirin. Di rengekî li berçav adilandî û xweşik were dîtin de ew dihat çêkirin.

Di wê temenê xwe de xweşikatî, dihat çêkirin. Ev, weke kevneşopîyekê jî bû. Bi wê re, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ew têgînên kevneşopîkî ên civatî çi bûn û çawa bûn, wê ew bihetan xatkirin û xîzkirin bi wan naqşayan. Minaq, weke şahmaran û hwd.

Her wusa, têgîna naqşkirinê, weke ya xamilandinê û xweşikkirinê di nava çand û kevneşopîya kurdistanî de bi nav û deng bû. Naqşên kurdistanî ên ku jinên kurdistanî çê dikirin, bi nav û deng bûn. Her wusa, bi wê rengê di male xwe de ew çê dikirin. Herkesekê, di malê de ev dikir. Jinan ew weke kevneşopîyekê dizanîn ku piştî xwe re ew kevneşopî bi keçên xwe re didan domandin. Keçên wan, wê ew naqş piştî wan re kiriba. Weke ku wan dayikê wan dikir, wan jî bi wê naqşkirinên ku dikirin, malên xwe di xamilandin û bi wê xamilandinê xweşik dikirin. Ev, weke çandakê û hûnerekê hebû.

Naqş, her wusa, ku kevirek ba û ankû bi dirûtina li ser paç ba, bi çêkirina gûl û çîçek û nêrgizan re ew çê dikirin. Her wusa, çi dîtiban ew dikarin naqş bikin. Ew naqşvanîya jinên kurd, em dikarin weke nîgarvanî û ankû wênevanîya hemdem a roja me werênina ser ziman.

Adilandina ku di malê de dihat kirin, wê malê xweşik bikira. Her wusa, bi têgînekê dihat gotin ku «ya ku malê dike mal jî, ew xweşikkirina di malê de ya» bû. Bi vê rengê bi gotinî jî dihat gotin û ser ziman. Têgînaka adilandinê ya xweşikkirinê di jîyanê de bi destê jinên kurd serdest bû. Em vê yekê divê ku bi qadr û qiymetekî bi wan re werênina ser ziman. Her wusa, li vir, têgîna xweşikkirinê, mirov wê dibînê ku heya. Li vir, her têgîna xweşikkirinê, bi têgînî li ser ast û radayekê re mirov dikarê bahse wê bike. Her têgîna adilandinê, bi astakê re dihê dîtin û ser ziman. Ev, weke têgîneka ku em divê ku wê bi hişmendîya xwe re wê werênina ser ziman a.

Her wusa li vir, divê ku mirov hinekî li ser aqil re bahse wê bike. Ji xwezayê ew girtin dihê kirin. Vaca ku mirov dikarê wê bi têgîna ji xwezayê girtinê re ya bi darêjkî re werêne ser ziman, wê li vir jî bi têgîneka afirandinê xwe bide dîyar kirin.

Mirov, di jîyan xwe de ya ku diacibêne ji xwe re dixwezê. Her wusa, acibandin, weke hoyandinaka wê ya bi mejî re heya. Ew jî, bi têgîna rast dîtinê re ya. Bi têgîna xweşikatîyê re têgîna adilandinê, bi hêzeka hoyandinî dikişêne li xwe. Ev jî, bi hêstê re ya. Hêst, li vir giring a ku mirov wê dubara kifş bike.

Têgîna estetismê, her wusa li vir divê ku mirov werêne ser ziman ku em divê ku ast û radayekê werênina ser ziman. Wê ast û radayê mirov divê ku bo hemû mirovan werêne ser ziman. Li vir, ew têgîna estetîsm ancama astekê û radayeka têgihiştinê ya, wê gelemperîyekê piştre bi pêşketina aqil re bi xwe re werêne li holê. Lê ku em têgîna estetîsm hildina li dest, em divê ku wê bi destpêka wê re bibina ta destê destpêkirina hizirkirinê jî. Di destpêka hizirkirinê de mirovên ku di şikeftan de dijîn li ser hêtên şikeftan hinek xîz çêkirina. Ew xîzên wan, wê afirandinek bi aqilê wan bê. Yanî, em dikarin weke têgîna afirandinê û adilandinê ya pêşî jî ji wê bidina destpêkirin.

Piştre ku çendî ku hizir pêşket û hizirkirin zêdetir bû jî, wê ew xîzkirinên di şikeftan de stûrtir bibin û bi rengtir bibin. Wê piştre ji şikeftan derkevin. Wê li ser hêtên malan û kirmana bi naqşkirina kevir û ankû adilandina bi hevdû re wê xwe bide dîyarkirin. Peykel û hêkelên ku dihatina çêkirin ku ji harîyê bin û ankû ji keviran bin, wê xwediyê têgîneka estetîkî bin. Ew kêvilbar (nivîsên bizmarî) bi wan kevirên ku li ser wan hatina nivîsandin re di destpêkên serdemên şariştaniyên sûmerîyan û hwd de, bi wan û hebûna wan re jî em vê têgîna adilandina estetîkî divê ku kifş bikin.

Ev afirandinên van demên buhurî, afirandina detpêkê ên ji aqil û mejî na. Her wusa, ew afirandin, dema ku hatina kirin, pêşî hewl hatîya dayin ku wan li gorî awayekî bi şekl bikin. Piştî ku bi awa bi şekl kirin û pê de, êdî weke ku afirandin, ew dihê dîtin. Peykel û hêkelên ku dihatina çêkirin ên serdemên berî demên şariştaniyê jî, her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman. Di serdemên şariştanîyê de wê ew afirandin, di mejî de bi darêjkî were çêkirin û naqşkirin. Her wusa, di roja me de, ew afirandinên ku hena, mirov divê ku di vê temenê de werêne ser ziman.

Nivîsêne bizmarî ên serdemên destpêkê ên şariştanî, her wusa, wê di vê temenê de bi hebûna xwe re têgînekê bidina me. Dema ku mirov li wan dihizirê, mirov bi wan re kifş dike ku ew çerçoveya wan kêvelbaran hatîya hizirîn. Di wê çerçoveyê de ew hatina çêkirin. Piştre jî, li ser wan ew nivîs hatina bicih kirin. Mejî, piştî ku bi dest hizirkirinê kir û pê de, çerçoveya wê hizirkirinê, weke darêjka wê, ku mirov wê kifş dike û biwê re hewl dide ku werêne ser ziman, wê ew çerçova bi hebûna xwe re weke çerçoveyek û ankû pêşnûmayek bi têgîna estetîsmê jî bê. Estetîsm, hinekî şûbjeya têgîna darêjkê ya. Her wusa, bi wê re têgîna wê ya ku mirov wê bi afirêne di jîyanê de ya.

Têgîna adilandinê ya bi zanîna mirov jî divê ku mirov li vir çend gotinan li ser wê bibêje. Her wusa, çerçoveya hişmendî ya ku dihê ser ziman, wê ew çerçova, têgîneka estetîkî ya adilandî bi wê çerçoveya xwe re bi afirêne. Li vir, dema ku em bahse estetîkê dikin, di cih de di vê çerçoveyê de helbest dihê berbîra me. Helbest, weke binetereka ku mirov dikarê wê weke hûnandina bi hêstan re werêne ser ziman. Di dema gûhdarkirina wê de, şîyarîya ku di mejî de dibê jî, bi vir ve girêdayî û bi hêstan re divê ku mirov wê werêne ser ziman. Ew şîyarî, ew hêstên ku bi wê re di mejî de diafirin, wê bi wê re êdî di mejî de pêşketinê bi wê re bidina çêkirin. Hêst, salixkirina wan, wê bi helbestê û hwd re bibe. Salixkirina hêstan bi tevgerîyan re û her wusa bi hişmendî fahmkirina wan, wê karê têgîna estetîkê ya şûbjeyî bê. Em dema ku di vê çerçoveyê de li wê dihizirin, em dibînin ku wê hê gelek aliyên ku wê di bin vê sêwana têgîna estetîsmê de ku wê werênina ser ziman wê hebin. Ev têgîn hemû jî, wê bi hêstîyarî werina kifşkirin û werina ser ziman. Têgîna şûbjeyî ya estetîsmê, wê her wusa bi wê adilandina ku bi têgînî dike re wê afirandinê li ser hêstan re di vê çerçoveyê de bike.

Li vir, dema ku em bahse têgîna estetîsma bi teorîkî bike, divê ku mirov pêvejoyekê bi serdemên şariştanî ên ji serdema sûmerîyan û heta serdemên hûrî û mîtannîyan werêne. Li vir, dema ku em li serdema hûrî û

mîtannîyan dinerin, em dibînin ku bi aqilî hûnandinaka wan ya pirr xort heya. Her wusa, Mîtra di wan serdeman de weke nîşanaka vê yekê ya. Mîtra, bi têgîna xwe re, felsefeyek hanîya ser ziman.

Em dema ku li cihên bergê ên Mîtrayîyan dinerin, em dibînin ku bi hêtên wê ve sûretên şêr, gav û hwd hatina çê kirin Her wusa, gelek sûretên ku weke tevlîhev hatina çêkirin. Lê her xata ku çêkirina jî, reng di wê de bikarhanîna. Em vê rewşê weke rewşek teybet dibînin. Em dema ku tên serdema Zerdeşt jî, bi heman rengî mirov rastî heman rewşê tê. Cihên ku di wê de bergê dikin, dilên ku tîrêja rojê bide hundur û di hundur de li hêtan û heta li derve jî li ser kevirên hêtan naqş hatina çêkirin. Têgînên pîroz ku ji nava têgîna bawerîya xwe derxistina di wê de bicih kirina. Ew naqş kirina.

Li vir, me bahse bawerîtê kir. Em pêşî gotinekê bi wê re jî werênina ser ziman û piştre ji wê êdî bidomênin. Her wusa, têgîna bawerîyê bi serê xwe, mirov dikarê weke têgîneka estetîkî werêne ser ziman. Li gorî wê bawerîyê ew adilandina ku hatîya kirin, her wusa wê temenê têgîneka bi vî rengî bê. Bi wê re jî, salixkirina li ser wan têgînan re mirov dikarê werêne ser ziman.

Têgîna bawerîyê, têgînên weke ên rûmetê, têgînên weke ên pîrozîyê û hwd, rengna têgînî ku em dikarin weke têgînna adilandî û bi hiş werênina ser ziman in. Zerdeşt, li vir, dema ku hizirî ya, wî salixkirinek di nava gîyanan û mirov û her wusa jîyanê de kirîya. Xweza, aqil û hwd, li gorî weyna wan, wî hewldaya ku salixkirinekê bi wan re werêne ser ziman. Li ser wê re jî, wî xwestiya ku bi têgîneka adilandî werêne ser ziman. Hanîya ser ziman jî.

Zerdeşt, di vê çerçoveyê de ew çerçoveya wî ya ku wî di hundurê wê de salixkirin kiriya, wê li vir, weke çerçoveya ku mirov wê li berçav bigrê bê. Her wusa, ev têgîna adilandinî a estetîkî ku mirov werêne ser ziman, mirov divê ku bi têgîna estetîsma a di xate yazdanîyê de wê werêne ser ziman.

Têgîna estetîsmê ya xate yazdanîyê, dema ku mirov li dîroka wê dinerî, bi wê re mirov wê bi awadanî, avakarî û çêkirin û pergale wê ya aqil û bawerîyê re mirov wê kifş dike. Her wusa, bo salixkirina têgînên pîroz jî, reng û dagerên jîyanî ku dihên bikarhanîn li vir, mirov divê werêne ser ziman. Minaq, melekê Tawis, bi tayrê tawis re dihê hanîn ser ziman. Bi wê re tayrê tawis, tefsirên ku li ser wê û bask û parrên wê hatina kirin, weke hin têgînna ku bi payxamî ku dihên hanîn ser ziman in.

Têgîna estetîsmê ya xate yazdanîyê, wê xwediyê dîrokek bi hezaran salan bê. Her wusa li pirranîya herêmên asya, pêşketinên bi awadanî û her wusa bi têgînên adilandin û xweşikkirinê wê di kifşkirina wan de ev hebe. Her wusa, ´ya rast´ ku weke ya ku ´divê ku were herê kirin´ û ankû ´baş dîtin´, wê di vê çerçoveyê de were pêşxitin. Ya ku rast tê dîtin, wê hîmê têgîna acibandinê jî bê. Ev jî, wê bi demê re êdî bidest rastkirinekê di mejî de jî bike. Rafaransên têgînî ên şûbjeyî ku mejî wan di temenê têgînek levkirî û levhatî de ku pêş dixe, wê li vir, êdî kifşkar bin.

Têgîna estetîsmê ya xate yazdanîyê, em dema ku li wê dihizirin, em vê rastiyê bi wê re kifş dikin ku salixkirin û şîrovekirina bi xwezayê re bi wê re li pêş a. Her wusa, ev jî, tiştekî dide nîşandin. Ew jî, ew ku xwediyê pêvajoyên pêşketinên ên demdirêj a. Her wusa, di serdema Mîtra-Zerdeşt de, wê şûbjekirina bi aqil êdî zêdetirî pêş bikeve. Zerdeşt, çerçoveya wî ya bi avêsta re ku wî hanîya ser ziman, ew çerçova, wê çerçoveyek giring bê ku mirov li vir wê kifş bike û werêne ser ziman. Têgîna Zerdeşt, wê bi gotinên têgînî ên aqil re wê werê ser ziman. Zerdeşt, salixkirina tiştên ku li jîyanê hena dikir. Her wusa, ´tişta ku rast´ û ´ya ku baş´, wî bi hevdû re bi têgînekê hanîna ser ziman. Zerdeşt, aliyê baş û yê ne baş salixkirina. Her wusa, herdû alî jî, tefsîrên ku wî di derbarê wan de kirina hena. Di vê çerçoveyê de têgîna Zerdeşt ya estetîkî, sîmsettira li berçav. Wî bi ya baş re ya ku bi rastî were herêkirin hanîya er ziman. Bi ya ne baş re jî, ya ku newê acibandin û ne baş hanîya ser ziman. Her wusa, Yanî, Zerdeşt, ne tenê bi salixkirin û şîrovekirina ya baş nayêne ser ziman.

Ev teybetmendiya şîroveya Zerdeşt, teybetmendîyek giştî ya xate yazdaniyê ya. Divê ku mirov bi wê re werêne ser ziman. Her wusa, di nava ya ´baş û ne baş´, de ya ´xweşik û ne xweşik´ de xat kişandîya û ew zelal kirîya. Li ser wê serî wastandîya. Ev têgîna Zerdeşt, wê weke têgîneka felsefîkî ku divê ku mirov pirr zêde li vir li ser bisekinê û wê baş fahm bike ya.

Zerdeşt, dema ku di nava baş û ne başîyê de xat kişand û ew dîyar kir û pê de, êdî bi şîroveyan ya baş çî ya û çawa ya, hewl hatîya dayîn ku were hanîn li ser ziman. Ya xweşik çî ya, ew hewldaya ku kifş bike û bi wê re werêne ser ziman. Ya xweşik, ya aliyê baş a. Yanî, bi gotinaka din, bi têgîna Zerdeşt re tişta xweşik baş a. Ya baş jî, ya rast a. Ya rast jî, ya ku were esas girtin a.

Têgîna Zerdeşt ya ku mirov bi wê re kifş dike ku ´ tişta xweşik, baş a. Ya baş jî, ya rast a. Ya rast jî, ya ku were esas girtin a´, weke têgîneka

ku wî bijartîya û pêşnîyar kiriya ya. Her wusa, ya vajî wê jî, wî hewldaya ku fahm bike, şîrove bike bi reng bike û werêne berçav. Ev jî, bi vê yekê, divê ku mirov werêne ser ziman ku Zerdeşt, hanîya ser ziman. Salixkirina wî ya, di vê çerçoveyê de têgîneka baş bo têgîna estetîsmê dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de li gorî têgîna Zerdeşt ya rast çi ya ew bi başîya wê re hanîya ser ziman. Di jîyanê de jî, li gorî wê rêxistinîyek bi pergalî û civatî re hatîya kirin. Têgîna bawerîyê jî, di vê çerçoveyê de bi jîyanê re hatîya kûr kirin.

Di jîyanê de ´rengên weke rohnîyê´, ´ku mirov ji wan başîyê hîs dike´, wî hanîna ser ziman. Vajî wê jî, rengên ku ne başîyê jî dihênina ser ziman, ew jî hanîna ser ziman. Li ser vê rastiyê re salixkirineka Zerdeşt heya. Ev salixkirina Zerdeşt, dema ku mirov li ser wê dihizirê, mirov bi têgîna estetîsmê di nava xwe de kûr û dûr dibê.

Li vir dema ku mirov vê kifş dike, êdî mirov baştir fahm dike ku ji ber çi di nava êzdayî (yazdanî)yan de hertimî tefsîrên rengan hatina kirin û ew tefsîr di jîyanê de hatina esas girtin. Ji wan tefsîran jî, hewldana ku peyamên pîroz û ankû têgînên başîyê kifş bikin. Di vê çerçoveyê de li wê hizirîna û hanîna ser ziman. Têgîna rengan, divê ku mirov werêne ser ziman ku weke têgîneka giring ya dîrokî ya bi hezaran salan a. Her wusa, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku têgîna rengan, di nava civatên kurdistanî de pirr kûr bi dîrokî û kevneşopî bicih a.

Têgîna rengan, dema ku mirov wê xate bawerîyê ya yazdanîyê şîrove dike, mirov wê bi re weke mijareka ku nebê nabê dibînê. Bi wê re aliyekî giring ê vê xate dihê ser ziman. Di vê çerçoveyê de xate yazdanîyê ku di sedsala me de bi navê ´êzîdî´ û ankû ´êzdayî´ dijîn jî, wê têgîna rengan di nava dîroka wan ya bawerîyê a demên berê de bi kevneşopî hebe. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê têgîna bawerîyê di vê çerçoveyê de pirr zêde kûr hilde li dest. Dema ku em hewl didin ku têgîna estetîsmê fahm bikin, têgîna êzdayî bi dîrok û kevneşopîya wê re têgîn û temenekî pirr mazin ê bi dîrokê re didêne ber me ku em ji wê sûd bigrin û bi wê re werênina ser ziman. Salixkirina li ser rengan re giringa di nava vê xate bawerîyê de. Her wusa, ev ji kûderê tê. Weke ku di nava bawerîyê de êzdayî de tê ser ziman ´jîyan pîroz a´. Di vê çerçoveyê de, ew rengên wê ên baş hertimî dihên kifşkirin û dihên ser ziman. Bo vê yekê, têgîna ´rengên baş´ em li vir divê ku werênina ser ziman. Di nava vê bawerîyê de di vê çerçoveyê de ev hatîya hanîn li ser ziman. Têgîna rengên baş, rengên ku mirov ji vn hêstek baş digirê û bi wan re xwe baş û di ewlatiyê de hîs dike na.

Hinekî jî, ku heta roja me di nava jîyane kurdistanîyan de rengên rengînî ku weke xaml dihên bikarhanîn di jîyanê de divê ku mirov bi vê kevneşopîyê ve girêdayî werêne ser ziman. Kevneşopîya rengan, di nava jîyanê de pêş dikeve. Her wusa, her rengê ku di jîyanê de dihê bikarhanîn, li gorî rengîya wê ya ku dihê dîtin salixkirin, şîrovekirina wê hewl hatîya dayîn ku werê kirin. Li ser vê têgînê re gotina ´rengên pîroz´ di nava jîyane kurdistanîyan de bicih bûya. Rengên pîroz, rengên ku di çerçoveya wê têgînê de hatina tefsîrkirin in. Bi wateyên ku li wan hatîya kirin re ev başkirin dihê kirin. Her wusa, minaq, rengê sor, weke rengekî jidahî û tîr hatîya şîrove kirin. Ji wê rengê, têgîneka pîroz jî hatîya kirin. Weke rengê rojê jî hatîya ser ziman. Rengê Zer jî, her wusa, weke rengekî ne jidahî ku lawaz hatîya şîrovekirin. Ev têgînên ku bi rengan ku hatina pêşxistin in. Her wusa, ev têgîna rengan, em divê ku hê jî, di vê xatê de bi wateyên ku bi wê re hatina çêkirin re werênina ser ziman. Heta ku bi xewnê re reng hatina şîrovekirin. Ev jî, wê bi wateyekê werina kirin.

Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna yazdanîyê ya baweriyê, bi rengên jîyanî ku di nava xwe de salixkirina, bi wan re xwe bi wate dike. Her wusa, weke rengekî jîyanê xwe dihêne ser ziman. Î ro, ku li nava rengê jîyane kurdan dinerin, em wê rengîtîya wê, hinekî jî bi vê têgîna yazdanîyê re dibînin. Ji ber ku di serdemên wan ên berê de bi rengînî hatîya salixkirin. Ev rengên ku hatina salixkirin û weke nirx hatina bicihkirin di jîyanê de wê li ser wan re jîyan were rengî kirin. Her wusa, ev têgîna rengan a di nava bawerîya yazdaniyê de giringa ku mirov wê bi rastî kifş bike û werêne ser ziman. Ev, wê tenê weke renga jîyanê nemênin. Her wusa, weke rengna ku jîyanê êdî diadilênin wê bibin. Di vê çerçoveyê de nêzîkatîya li jîyanê û adilandina wê hatîya kirin. Têgîna di jîyanê de ku hatîya pêşxistin, wê bi wê re êdî were ser ziman.

Têgîna rengan a di jîyanê de her wusa, wê weke kombînasyonaka afrîner ya jîyanî bê. Bawerî jî, her wusa li ser van rengan re hatîya salixkirin. Reng, bi wateya wan re her reng bi fahmkirina wan re têgînek jîyanê hatîya pêşxistin. Li ser rengên jîyanê, wê bandûra wan li mejiyê mirov bibe. Bandûra rengan a li mejiyê me, wê bandûrê li têgîna salixkirina rengan jî bike. Her rengek, dema ku hat salixkirin, wê li gorî wê bandûrê were tefsîr kirin.

Tefsîra rengan, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku wê bi wê têgîna wan ya hatî kirin re wê jîyanê biadilênin. Reng, wê bi têgînekê bina rengên gotinan.

Reng, wê jîyane bi wê têgîna wan ya ku ew ji wê re bûna obje bi wê re wê êdî bi xamilênin. Xamilandina di jîyanê de bi wê re, wê pirr zêde bi wê re bibe. Li vir, dema ku em bahse rengan bikin di xate êzdayê li kurdistanê de, divê ku mirov biqasî wan rengan giringîyê bidina şîroveya xewnan. Ev jî, weke rengna têgînî ku mirov divê ku wê bi teybetî serêne ser ziman in. Ev têgîna xewnan, wê weke giringîya wê bê ku bi reng, rewş, tevger û her wusa kirinên jîyanî ku hatina şîrovekirin, tefsîrkirin û bi watekirin re wê werina ser ziman. Ev jî, weke têgîneka ku êdî bi wan têgîna rengan ku di ahengekê wê kifşkirina wê di jîyanê de hebe û kifşkirinê bide kirin. Her wusa, di şîrovekirina gotinan bi rewşan û li ser wan re şîrovekirina wan bi xewnan re wê bibe. Ew têgîna dualîtî ya Zerdeşt a bi du gîyanên vajî hevdû re wê li vê jî bi bandûrî hebe. Minaq, weke têgîneka şîroveyî ya xewnê ku tê gotin ku «yekî ku dît ku di xewnê de mir, wê temenê wî dirêj bê», weke têgîneka di vê vacê de ku hatîya ser ziman a. Reng, wê di kifşkirina têgîna gotinan de wê bikeve rengê teorîyeka kirinî(piretîkî) de. Her wusa, vê jî, bi jîyanê re dibînin. Teorîya rengan, di vê çerçoveyê de mirov dê bi kevneşopîya kurdistanîyan re dibîne. Her wusa, bi gotinên şenber re ew rengê teorîya kirinî dihê dîtin. Ew gotinên teorîya kirinî jî, wê her wusa di vê rengê de wê êdî werina salixkirin bi rengînî. Têgîna rengan û afirandina wê bi teorîkî, wê weke teybetîyeka xate bawerîyê ya yazdaniyê ya bi hezaran salan bê.

Têgîna rengan, wê bi şîrovekirina wan re jî, di temenê têgîneka afirandinê de xwe bide çêkirin. Li vir, em vê rastiyê jî kifş dikin ku bi şîroveya rengan re ku li ser wateya ku li wan hatîyakirin û her wusa salixkirina rengan bi xwe re ew hevgirtin(sentez) di nava wan de hatîya çêkirin. Minaqe çêkirina wêneya şahmaran û çêkirina wê divê ku mirov li vir bi wê rengê werêne ser ziman. Em dema ku li vir, hinekî hewl bidin li ser wêna(naqşa)ya şahmaran bihizirin, em bibînin ku hevgirtineka têgînî bi wê re heya. Her wusa, rengên ku bi pîrozî hatîna dîtin, weke kesk, sor û zer hatîya çêkirin. Her wusa, di nava bawerîya yazdaniyê de marê reş jî xwediyê têgînekê ya. Bi wê re jî, jin ji xwe pîroz hatîya dîtin. Ev nirx hemû hatina hanîn li cem hevdû û bi hevdû re hatina kirin yek. Hevgirtineka têgînî ya bi binirx hatîya çêkirin. Ev hevgirtina bi naqşaya şahmaran re ku hatîya çêkirin, wê weke weke hevgirtinaka ku kevneşopîkî bê di nava jîyane kurdistanî de. Her wusa, naqşaya şahmaran bixwe jî, wê weke minaqeka bêminaq ya têgîna estetîkî jî bê.

Têgîna şahmaran, bi wê re ku hatîya ser ziman, wê bi wateyên ku li wê hatîya kirin re wê şîroveya wê were kirin. Lê li vir, divê ku mirov

werêne ser ziman ku minaqe şahmaran, wê bi şîroveyî xwediyê kifşkirinekê bê. Di mejiyê mirovan re, ew reng, bejn(fîgûr)a jinê û ya mar jî, wê bi hevdû re werina gerekirin (hevîrtin). Hevîrtina her sê rengên pîroz, bejna jinê û ya mar bi hevdû re di nava naqşaya şahmaran ya ku hatî çêkirin re wê giring bê.

Naqşaya şahmaran, weke naqşayaka ku her jina kurd ku bi naqşî çê dikir û di male xwe di dalaqand. Ew dalaqandina naqşaya şahmaran, bi du wateyan bû. Wateya pêşî bo xweşikkirin û adilandinaka bi xweşikkirinê re bû. Her wusa wateya duyemin jî, ku divîyabû ku me pêşî bihanîya ser ziman ya bi pîrozî û nirxîtîya şahmaran re bû. Di her malê de hebûna naqşaya şahmaran, wê hem weke dagera torînî(asîl)ya malê ba. Her wusa bi wê re jî, wê weke têgîneka ku bi bawerî ku xwe bi wê re rehet hîs dikirin bû. Her wusa, bawer dikirin ku şahmaran xwûdawendeka. Ew xwûdawend, wan diparêzê. Naqşaya şahmaran, weke naqşayaka ku bêminaq bû. Wateya ku lê hatibû kirin jî, wusa bû. Naqşa(wêne)ya şahmaran, şûretê pêşî ê xwûdawendekê bû. Bi vê rengê, dihat bawer kirin. Li ser wê re torînîyek bi têgînî bi têgîna şahmaran de dihat ser ziman.

Her wusa, rengên ku xweşî di dil de çê dikirin, di bijartin û ew di çêkirina naqşaya şahmaran de dihatina bikarhanîn. Her reng, di çêkirina naqşaya şahmaran de ne dihat bikarhanîn. Ev jî, rengên ku bihatan bikarhanîn divîyabû ku li gorî sîyane(qûdreta) şahmaran û nirxîtîya wê ba.

Li vir, dema ku mirov li naqşaya şahmaran dinerê, her wusa mirov dibîne ku rengên xwezayê û rengên din ên pirr kifş hatina bikarhanîn. Her wusa li ser têgîna wan rengan re jî divê ku mirov li naqşaya şahmaran binerê. Naqşaya şahmaran, weke naqşayaka ku em dikarin ji gelek gelek nirxên yazdanî ku di wê de hatina cem hevdû bi wan ew naqş hatiya çêkirin fahm bikin.

Her wusa, li vir, bi vir ve girêdayî mirov vê jî kifş dike ku bi salixkirina rengan re mirov dibînê ku têgîna jîyane werêne ser ziman. Rengên jîyanê, rengên ku jîyan bi wan dihê salixkirin in. Rengên ku bi wan naqşaya şahmaran dihê çêkirin de jî, ev reng in.

Têgîna estetîsmê, li vir, dema ku mirov bi wê re li dîroka hizir, bawerî û her wusa ya kevneşopîyê ya kurdistanîyan dinerê, mirov bi wê re digihijê têgîhiştina dîrokî ya bi hezaran salan. Her wusa, li vir, têgîna rengan, mirov di serî de dibînê. Emê hinekî jî li jêr, bahse têgîna xewnan

û şîrovekirina wan jî bikin. Ev jî, weke aliyekî din ê ku mirov li vir di çeçroveya mijara xwe de werêne ser ziman in.

Têgîna xewnan û şîrovekirina wan, her wusa weke mijaraka ku her timî bi mejiyê mirov re bi wê re eleqeder bûya. Mirov, xwestîya ku xewnên xwe fahm bike û wateyekê bide wan. Bo vê yekê jî, di têgîneka hûnerî û têgînî de nêzîkî xewnên xwe bûya. Ji xewnan, hewl hatîya dayîn ku ´peyam´ bo rêwîtîya bi ber pêşarojê de ku ji wê were derxistin. Ev jî, wê weke têgîneka ku em divê ku hûr û kûr li ser wê bisekin in a.

Têgîna xewnan, wê ti kesek nikaribê weke rêmildarên Medî û berî wan bawermendên hûrî û mîtannî û her wusa weke bawermendên mîtrayî ku karibê wan şîrove bike. Her wusa, pergale astronomîyê ku bawermendên Mîtrayî birêxistinkirina, wê têgîneka estetîkî di derbarê têgîna gerdûnê de bi me re bide çêkirin. Gerdûn, weke rastîyeka ku mirov divê ku wê werêne ser ziman. Her wusa, gerdûna ku em di wê de dijîn, bi hewldana fahmkirina wê û her wusa şîroveyên astronomîkî û têgînên weke kosmolojîkî û kosmogonîkî û hwd re, wê hewl bê dayîn ku were fahm kirin. Li vir, estetîsm, wê awayekî xwe yê ku teybet bi têgîn bike. Her wusa, weke têgîneka gerdûnî, ku mirov li têgîna estetîsmê dihizirê, her wusa, têgîna Melekê Tawis û piştî wî re ya Mîtra û li dûv Mîtra jî ya Zerdeşt bi ya Manî re wê têgînaka pirr levkirî û baş ya tekûz derxe ber me. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, weke aliyekî teybet werêne ser ziman ku têgîna gerdûnê, estetîsma wê, wê di jîyane li dunyê de bi têgîna stêr, roj, heyv û hwd re wê bi têgînî were naqşkirin di mejî de. Li ser wê re jî, wê hin bi hin ev têgîn were berfireh kirin û kûrtir kirin.

Dema ku em bahse têgîna gerdûnê bikin, divê ku mirov hinekî li vir li ser wê bisekinê. Her wusa têgîna gerdûnê, bi heyîn û hebûna xwe re xwediyê pergalîya xwe re ku bi wê re pêş dikeve ya. Gerdûn, heyîna wê, salixkirina wê ya ku bi mejîyê me mirovan ku me hewl daya ku wê bikin, wê me li ser wê re bigihêne têgînekê. Me hinekî li jor bahse şahmaran kir. Her wusa, dema ku bahse şahmaran dihê kirin, şîroveya ku bi wê re dihê kirin bi gerdûnê re dihê kirin. Şahmaran, weke têgîneka ku li ser gerdûnê re jî dihê dîtin. Her wusa, tê gotin ku «Şahmaran, xwediyê zanîna demên buhurî û demên ku wê werin jî ya.» Di vê çerçoveyê de jî, bi vir ve girêdayî dihê gotin ku «şahmaran, xwediyê hemû nepenî(sirra) gerdûnê ya.» Ev gotin, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa têgînekê bi me re dide çê kirin. Ev têgîn, her wusa giringa ku mirov wê fahm bike.

Têgîna gerdûnê, wê di nava xwe de hewldana lêgerîn, lêkolîn û salixkirina wê jî bi wê re ku bike bi xwe re bihawêne. Hewldana

fahmkirina gerdûnê, wê hertimî hebe. Mirov wê mejî li ser wê bi wastêne. Her wusa, li ser wê êdî wê hizrên xwe werêne ser ziman. Têgînên kosmolojîkî û kosmogonîkî, hinek ji wan têgînan ku bi wê hewldanê re na.

Gerdûn, weke têgîneka ku di serdemên berê ên weke serdemên Mîtra hwd de jî, ku li ser wê serî hatîya wastandin a. Têgîna Mîtra, wê ji aliyekî ve ji hîm ve li ser têgîneka gerdûnî ya bi kosmolojikî û kosmogonîkî bê. Di wê çerçoveyê de, dema ku mirov li hizrên wî dihizirê, mirov kifş dike ku wî pergalîyek têgihiştinî a felsefîkî bi têgînî di derbarê gerdûnê de hanîya ser ziman. Dema ku mirov van aliyan li berçav digirê û hewl dide ku fahm bike, mirov wê baştir wê fahm dike. Mîtra û ankû Mîtrayîyan, wê salixkirinekê bi têgînên weke kosmolojikî û kosmogonîkî û hwd re werênina ser ziman. Ev têgîn, weke ku Mîtrayîyan di jîyanê de hanîya ser ziman, pergale astronomîyê di wê temenê de afirandina. Her wusa, têgîna falvanîyê û ankû ´fal meyîzendinê´ bi vê yekê û rengî pêş xistina. Li ser vê re Mîtrayîyan, bi bawermendên xwe re hewl didan ku li ser wan tefsîrên xwe yên bi gerdûnê re hewldana ku xwe bigihênina têgînan di derbarê pêşarojê de jî. Di vê çerçoveyê de hizrên xwe hanîna ser ziman.

Bawermendên xate yazdanî, di vê çerçoveyê de biqasî ku weke bawermendna bûn, her wusa bi heman rengî jî wilqasî jî rêmildarna ku xwediyê têgîna gerdûnê bûn û dikirin ku pêşaroja mirov jî ji wan re werênina ser ziman bûn. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wan bi dualî werêne ser ziman.

Mîtrayîyan li vir, divê ku mirov bi giringiyekê werêne ser ziman. Ew pergale wan ya di derbarê gerdûnê de wê têgînekê jî bi estetîkî di derbarê gerdûnê de bi têgînî bide me. Her wusa li vir, divê ku mirov jiv ê aliyê, hinekî estetîka gerdûnê ji wî fahm bike. Estetîka gerdûnê, wê bi salixkirina wê ya ku bi astronomî, kosmolojikî û kosmogonîkî û hwd ku hatîya kirin re wê were li holê. Stêr, roj heyv û hwd, wê di vê têgînê de rengna têgînî ên xamilandinî jî bin bi hebûnên xwe re.

Têgîna gerdûnê ya Estetîkî, wê her wusa bi xwe re mirov di nava têgîna jîyanê de jî bibe. Hizra hewldana fahmkirina pêşarojê, wê weke hizreka ji wan hizrên ku mirov di nava wê de dibê bê. Hizra gerdûnê, wê bi gelemperîya wê re têgîneka giştî ya serdest jî bê.

Li vir, dema ku mirov li têgîna gerdûnê dihizirê, her wusa, wê ev têgîn me di nava xewnê de kûr bibe. Xewn, weke têgîneka afrîner ya di wê re gihiştina gerdûnê jî ya. Xewn, weke demekê ku ji wê zanîna ku em di hişê wê de na û bi kardihênin ji wê zêdetir jî bi zanîn û tevgertira. Her

wusa, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku xewn, wê karînaka têgînî ya dîrokî bide nîşandin. Her wusa, ku em xêva xwe bikina temenê xewnê de, wê xewn weke afirînerîyeka pirr bizane ya afirîner bê. Li vir, şîrovekirina xewnê, wê wê zanebûna wê bide me. Her wusa, dema ku mirov naqşaya xewnê derxê, mirov wê bibînê ku gelek zanîn, têgîn û her wusa hildanên ku mejî girtina ku di temenê de xwediyê hevgirtinekê na. Her wusa xewn, hinekî jî hevgirtinna çêkerî ên mejî na. Ev hevgirtîn, bi hevdû re hatina cem hevdû. Xewn, vaca wê ya hildana mejiyê me ya. Vê vacê, di serdema mîtolojiyê de serdemek xwe jîya. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku xewn, bi wê hevgirtina xwe re xwediyê gelek têgînên ku hatina berhevkirin in. Em li ser wê xewnê re dikarin bahse estetîka xewnê bikin.

Xewn, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku xwediyê wê têgîna xwe ya teybet a. Xewn, weke xosleta hizirkiirna mirov a. Her wusa xewn, dide nîşandin ku çi di mejî me de girtî heya jî. Her wusa, pêvajoyên girtina di mejî de jî, bi wê re dihên dîtin.

Li vir, em divê ku vê yekê bibêjin ku li ser xêva mirov re rakendîyeka mirovê heya ku xwe bi demê re dide domandin. Her wusa, dema ku em bahse xewnê dikin, em divê ku vê têgînê di temenê wê de weke hîm hidina li dest û fahm bikin. Yanî, xewn, ji ya ku em dizanin zêdetir xwediyê temenekî bi hîm ê bi zanebûn û girtina di hundurê mejî de ya.

Girtina mirov, ji destppêka mirov ya bi hizirkirinê re di wê xêvê de heya. Her wusa, dema ku mirov bahse wê bikin, em divê ku werênina ser ziman ku têgîna xewnê, di vê çerçoveyê de, weke nerîneka darazî ya bi hemû deman re jî ya. Xewn, darazaka mirovî ya hundurî bixwe jî ya. Em divê ku di vê çerçoveyê de jî wê werênina ser ziman. Lê dema ku mirov xewnê, di vê temenê de hilde li dest, divê ku mirov werêne ser ziman ku xewn, afirandinaka bi çêkerî ya ku ev zanîn hemû ya ku me bahse wê kir ku di temenê wê de ya.

Xewn, pergalîya wê hizrî, ku mirov li wê dihizirê, her wusa bi wê re ew pêşnûmaya wê ya ku heya re, bi wê re mirov dikarê werêne ser ziman. Ez li vir, di vê têgîn û zanînê de me ku mejiyê me gerdûna me ya. Her wusa, em çendî ku dikarin xwe bigihênina giştîya mejiyê xwe, her wusa mirov wê karibê xwe bigihêne têgîna gerdûnê jî. Mejiyê me de, gerdûne me ya ku bi me re dijî ya. Ev jî, weke aliyekî ku mirov werêne ser ziman, Bi awayekî smitrîkî ku ew têkiliya di nava mejî û gerdûnê de danîna wê, wê têgîna gerdûnê, weke ku di serdemên berê de hatîya kirin, wê fêra gerdûnê bi me re bi bide çê kirin.

Li vir, emê li jêr hinekî li ser wê bisekin ku du hundurê felsefeyê de ew têgîna estetîsmê ku mirov li ser wê disekinê, mirov bi darêjkê re wê çawa ku xwe dihêne ser ziman. Her wusa, ew şûbjeya hizirkirinê, ku bi fêrî ku heya, çawa ku mirov wê dihêne ser ziman, wê bi wê hanîna me ya ku hatîya ser ziman re wê têgîna estetîsmê salixkirinekê bi wê re bide kirin. Estetîsm ku adilandin bê, her wusa ew darêjkîya felsefîkî wê weke kirdeyekê xwe bi wate bike di vê çerçoveyê de. Dîroka felsefeyê ya hizirkirinê, di vê çerçoveyê de wê têgîneka baş bê bo fahmkirina têgîna estetîsmê jî. Li vir, dîroka hizirkirinê, mirov li wê dihizirê, her wusa, weke şûbjeyeka têgînî, têgîna estetîsmê jî salixkirineka wê ya bi afirandinên ku bûna re dike. Rexneya estetîkî a li dîroka hizirkirinê ew a ku ew adilandina ku têgînî ku bi felsefeyê ku bûya ya.

Em li vir divê ku vê yekê werênina ser ziman ku felsefe, wê dîroka xwe ya bi hizirkirinê, dîmenê wê yê hizirkirî, weke têgînekê didêne ber me. Li vir, em dema ku li vir bi estetîskî li wê dihizirin, ew hizirkirina me, wê weke rexneyeka têgînî ya felsefîkî jî bê li wê. Felsefeya estetîkê, weke têgîneka di temenê têgîna naskirina zayendîtîyê de ku mirov wê hilde li dest a. Her wusa, temenê wê li vir, li ser têgîna naskirina weke hûnerekê û ankû çandekê jî ku mirov ava bike, wê ev têgîn têrê nekê ku mirov wê bi tememî fahm bike. Her wusa, têgîna estetîkê, ji wê zêdetirî, salixkirina têgînê bi naskirina wê re ku dike û dixwezê ku mirov bike, wê weke rengekî fahmkirinê xwe werêne ser ziman. Estetîsm, wê pirseka metafîzîkî jî li dawiya xwe dihêle. Lê ji wê zêdetirî, zêde bi ser wê de naçê. Bi ya naskîrî û afirî re xwe dihêne ser ziman.

Her wusa felsefeya estetîkê, em li vir, bi têgîna şûbjeyî ya hizirkirinê re dihênina ser ziman. Li ser wê re jî, em salixkirina rewşê ku hatîya kirin bi nasîna wê re wê dihênin ser ziman. Estetîsm, weke têgîneka ku rastîya zayanedî û bi wê re zayendîya rastîtîyê, di temenê hewldana fahmkirinê de ku dihilde li dest a. Her wusa, têgîna rastiyê ya, ku bi têgîna wê ya hîmî re ku fahm bike ya. Em li vir, dema ku hewl didin ku gerdûnê fahm bikin û ankû hizreka nêzî rastiyê di derbarê wê de di mejiyê xwe de biafirênin, ev hewldana me, wê nêzîkî têgîna estetîsmê dike. Hizra estetîkê, her wusa bi têgîna ku xwe bigihêne rastiyê re tevdigerihê. Ev jî, di çerçoveya salixkirina di jîyanê de ku wê rast bike û biadilêne re ku çê bike. Her wusa li ser wê re jî, ku êdî biafirêne. Yanî, ya rastiyê ku bi têgînî ku şenber bike li berçav.

.

**Têgîna estetîsmê a felsefîkî, hûnerî û çandî**

Têgîna estetîsmê, dema ku mirov li wê dihizirê, weke ku mirov li ser kevneşopîyê re kifş dike ku mirov darêjka weke ya rastiyê, zayendîtî û başîtîyê bi wê re dihêne ser ziman. Her wusa darêjka salixkirî, wê weke têgîneka ku em li vir dikarin ku bi wê were werênina ser ziman a. Li vir, di serî de divê ku mirov vê yekê baş kifş bike ku estetîsm, weke têgîneka ku ew rêgezîya felsefîkî ya bi dîrokê re ku bi hizirkirina wê re pêşketîya bi mijarên wê ên ku hatina ser ziman re ji xwe re kirîya palgih û li ser wan re salixkirinek têgînî bi xwe re dike. Em li vir, divê ku vê yekê baş fahm bikin, ku têgîna estetîsmê, wê di vê çerçoveyê de hemû têgîn û hizirkirina dîroka felsefeyê bi mijarên wê ên ku li ser wan hatîya hizirkirin û axiftin re nerîn û daraza xwe ya pêşxistîya bi wê re têgînekê bi xwe re û bi me re dihêne ser ziman. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku estetîsm, di vê çerçoveyê de bi heyîn û hebûna xwe ya têgînî re weke têgîneka felsefîkî ya darazî xwe dide dîyarkirin. Hûner û çand, di jîyanê de pêşketina wan, çend ku weke ancama têgînek û astaka têgînî û têgihiştinî ya, bi heman rengî weke rexeneyekê jî jî wan di jîyanê de li jîyanê pêş dixe. Hûner û çand, bi têgîna xwe re, qancî û başîyên jîyanê dike nava xwe de. Li ser wan re nerînekê li jîyanê diafirêne. Armanca di navaroka afirandina çand û hûnerê de, li vir, wê di derbarê têgîna nerîna darazî a estetîkê de têgînekê bi wê re bi felsefîkê bide çê kirin. Ev armanc û têgîn, wê nehêle ku em estetîsmê bi hesanî weke mijaraka ji rêzê şîrove bikin û werênina ser ziman.

Dema ku mirov van aliyan li berçav negrê û hewl nedê ku rast fahm bike, wê hingî, bi başî jî, mirov wê nikaribê têgîneka baş bi dest bixe. Li vir, hebûna çand û hûnerê, bi hêstîyarî, astaka têgîna jîyane ku dihê jîyîn a jî. Ev ast, bi estetîze kirina wê re, wê têgîna ku em dixwezin ku bi dest bixin wê bê bidest xistin. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku têgîna estetîsmê, weke nerîneka darazî xwediyê têgînê ya wê rast bê. Ev jî, li ser çand û hûnerê û asta wan ya ku heya re ya. Her wusa, li vir, rêgezî(dîsîplîn)ya çandî û hûnerî, divê ku mirov bibîr bike. Rêgezîya çandî û hûnerî, bi adilandina bi wan re dihê kirin. Ev jî, bi têgîneka ku ew jî, xwe di berçav de derbas bikin û kêmesîyên xwe bibînin û xwe temem bikin, bi wê re dihêne ser ziman.

Têgîna estetîsmê, di vê çerçoveyê de, mirov bi wê nerîna wê re dema ku dinerê, her wusa weke têgînaka rêgezî û ankû rêzkarî, mirov wê bi felsefîkî kifş dike. Berhemek ku bi têgîna estetîsmê lê werê nerîn, wê çawa lê werê nerîn, ev di temenê şenberkirina wê ya li berçav de û bi

jîyankirina wê re wê xwe bide dîyar kirin Li ser wê jî, dema ku ew bi rêzkarîyekê ket jîyanê de tememî û ankû ne tememîya wê, wê xwe bide dîyar kirin. Ev jî, wê weke rewşekê bê. Lê ev tenê aliyekî ku mirov wê bibînê ya.

Her wusa, dema ku berhemek hat vejandin û hat xistin wele berhemek zîndî ya çandî wê li jîyanê jî bê nerînek. Her wusa, ew têgîneka ku bi xwe re li jîyanê dinerê ya. Berhema ku bû hûnerek û hat leyistin, ew nerîneka li jîyanê ya. Her wusa, kîjan rewş bi çi awayê û çawa di wê de cih û war digirê jî, ew jî, wê weke têgîneka ku mirov êdî wê kifş bike bê. Lê ew têgîn, weke têgîneka ku li jîyanê bê. Wê jîyan, di wê çerçoveyê de lê were nerîn. Wê ew nerîn, weke têgînekê bê rafarans li jîyanê jî. Her wusa, ev jî, wê di mejî de têgînekê bide afirandin. Ev afirandina ku di mejî de kir, wê bi hiş û zanînê bê. Piştre jî, ew hiş û zanîn wê li jîyanê weke têgînna hebûnî xwe ku kirina nerîn bin. Me li jor, bahse nerînê kiribû ku weke darazekê li jîyanê.

Estetîsm, dema ku mirov bi serê xwe wê hilde li dest, weke têgîneka razber wê hebe. Lê bi berhema ku di çerçoveya wê de xwe hilda li dest re ew heya. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî kifş bike ku têgîna estetîsmê, ew têgîna berhemê ya ku bi wê bûya nerîn a. Em li vir, divê ku vê yekê fahm bikin. Di vê çerçoveyê de, estetîsm, ji têgînekê zêdetirî weke rêbazekê jî xwe derdixe li holê. Em di çerçoveya wê de têgînên hizirkî dikin. Ew têgînên me yên hizirkî, bi berhemên ku hatin bûn re em wan dikin. Li ser wê re, ew têgîna wan berheman, weke têgînna hizirkî wê hebin. Her wusa nerîna hizirkî ya berhemê, weke nerîneka hûnerî û ankû çandî ku li jîyanê xwe da nîşandin, wê ew li jîyanê dayîna nîşandinê re wê weke têgîneka nerînî ya li jîyanê bê. Her wusa, her berhem, bi hizir û nerîna xwe re têgîneka şûbjeyî ya afirî ya. Ev têgîna afirî jî, bi xwe re salixkiirna ku dike, wê bi wê re jîyan were salixkirin. Wê weke têgîneka ku bi wê li jîyanê werê nerîn bê. Em dema ku bi wê re li jîyanê dinerin, em hingî wê dinerina weke nerînekê û ankû darazakê li jîyanê jî.

Têgînên ku weke mijare ku di serdemên buhurî de ku hatina hildan li dest ên weke naskirina xwezayê, têgîna hûnerê, çandê û kevneşopîyê û her wusa piştre bi civatîtîyê re ku pêşketina ku bû ku ew weke berhemekê ku hat li berçav girtin û hat kirin weke mijareka estetîsmê. Çand, hûner û mûsik, her wusa, bi têgînên hêstîyarî ku di hundurê xwe de diparêzên re, wê bib têgîna şûbjeyî ya ku didin dîyarkirin re wê wê werêne ser ziman. Di serdema me ya î ro de, her wusa estetîsm, weke mijareka zanistî jî bûya xwediyê têgînekê ku divê ku mirov di vê çerçoveyê de jî li wê

binerê û wê werêne ser ziman. Her wusa, têgînên zanistî û her wusa ên kosmolojikî û kosmogonîkî û hwd, wê bi wê re xwe di temenê nerînekê de pêş bixin bigihênina adilandinekê. Zanist, wê adilandina ku ew di nava xwe de dide çêkirin, divê ku mirov wê li vir bi vir ve girêdayî werênina ser ziman.

Estetîsm, li vir, weke pirseka ku li pêşîya wê ya ku bi ber pêşarojê de dinerê bi wê adilandina ku dike. Her wusa li vir, ew adilandin jî, wê hertimî bi demê re bibe. Di vê çerçoveyê de, mijarên ku weke mijarên estetismê werina ser ziman ên weke çand, hûner û her wusa musik û hwd, wê di nava jîyanê de bi wê adilandinê re xwe pêş bixin li gorî wê rastîya jîyanî û ya civatî. Her wusa li vir, rastîtîya ku êdî dihê dîtin, ew a ku wê bi wê re tîrîtîyek bi têgînî û zanînî biafirê.

Em li vir dema ku vê di çerçoveya civatîtyê de dihênin ser ziman, weke hizreka ku civaknasî zêde jî ne xweş jî tê dîtin. Her wusa, civaknasîtî, wê xwe li vir weke mijareka lê rexnegir bide dîyar kirin.

Têgîna civatîtîyê li vir, divê ku mirov hinekî li ser wê bisekinê. Her wusa, têgîna hûnerê, çandê û musikê û her wusa ya felsefîkî, wê rêzkarîya ku bi jîyanê re bi nerîna darazî re ku diafirênin, divê ku mirov wê fahm bike. Li vir, têgîna hizrî, wê hertimî bi nerînî xwediyê têgîneka rexnekir bê bi hanîna li ser ziman re.

Di nava felsefeyê de weke mijara têgînê ku mirov li ser bisekinê ya nasînê, wê weke têgîna ku li vir divê ku mirov wê hilde li dest bê. Her wusa, nasîn û ankû hewldana fahmkirinê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê werêne ser ziman. Nasîn û ankû fahmkirin, weke têgînna ku bi wan re jîyan salixkirina wê hatîya kirin in.Her wusa, li ser ya salixkirî û têgihiştî re naskirin û ankû fahmkirin dihê ser ziman. Felsefê, li vir divê ku mirov werêne ser ziman ku van mijaran, hertimî dike mijara xwe. Lê hertimî wê bi demê re pirsgirêka naskirin û fahmkirinê wê hebe. Ji ber ku jîyan didomê. Bi domîna jîyanê re wê hertimî hewldana naskirin û fahmkirinê jî xwe bide domandin. Ev bi hevdû ve ji navikê ve girêdayî na.

Têgîna estetîsmê, li vir, dema ku mirov wê dihêne ser ziman, her wusa ew têgîna ku afirî, wê weke nerînê li jîyanê bê. Hûner û çand, du têgînên ku bi wan re jîyan salixkirinê bi rewşî bi jîyanê re dike na. Salixkirin, wê weke mijaraka têgînê ya hemû deman bê. Her wusa, têgîna demî ya ku afirîya, bi rêzkarîkirina wê re hewldana fahmkirina wê serdemê re, dihê dayîn nîşandin. Mijarên ku di nava hûner û çandê de ku dihên ser ziman, mijarên jîyanî na. Her wusa mijarên ku bi aqil dihên dîtin in. Aqil, bi

şûbjeya xwe ya têgînî re li wan dihizirê.Mejiyê mirov, wê hizirînê dike. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku di vê hizirkirinê de ya ku mirov rast dibînê û ya ku mirov diacibêne, wê weke têgînna ku werin kirin bin. Mirov, çi rast dibînê? Mirov, çi diacibêne? Her wusa ev, weke mijarna ku mirov divê ku hê hûr û kûr li ser wan bisekinê na. Mirov, di vê mejiyê xwe bixwe de jî, pêwîstî pê dibînê ku bi tiştekî bawer bê, ku ya rast a û ankû ya hatîya acibandin a. Her wusa, ev weke pêwîstîya deronî jî ya. Ya rast, ku mirov wê kifş dike, wê weke rastîyeka ku mirov wê kifşkiribê jî bê. Ev hîsîyet, hîsîyeteka jîyanî ya xort a. Têgîna çand û hûnerê, bi wê pêşketina xwe ya li jîyanê, her wusa weke nerîneke li jîyanê dibê. Nerîn, têgîneka felsefîkî ya. Divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku nerîn, bi wê darazîya xwe re jîyan diadilêne. Têgîna estetîsmê jî, her wusa têgîna vê rastîyê ya.

Dema ku mirov bahse têgîna çand û hûnerê dike mirov divê ku vê yekê werêne ser ziman ku çand û hûnerê bi dîrokê re û bi pêşketina hizrê û felsefeyê re xwe pêşxistîya. Her wusa hizir û ankû dîroka hizir, weke rengekî bi wê re ya. Lê dema ku mirov bahse çand û hûnerê bike, divê ku mirov bibêje ku ev bi jîyane civatî û kevneşopîyê re xwediyê têgîn û destpêkekê ya. Her tişta ku di jîyanê de afirî û heya, weke tiştekî ku bi wê heyîna xwe re hûnerîyekê jî dide nîşandin a. Hûnerî, hinekî karîn û çêkerîya afrînerîya. Divê ku mirov vê yekê û rengî werêne ser ziman. Lê hûner, dema ku mirov li wê dihizirê, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku **Hûner**, bi awayekî estetîkî û bi şeklên (awayên) cihêreng, hanîna ser ziman a hest, raman, û bi wê re jî bi pêşnûma an jî sipehîkirina. Bi awayekî cihêreng, bi awakirin û dîmenkirina sipehîtîyê ya. Sipehîtî, weke ku kurd jî, carna dihênin ser ziman, di jîyanê de bi afirandina wê re «delalî» ya. Delalî, ya bedew û xweşik a. Ya baş û rind a. Ya qanc û teze ya.

Em dema ku bahse hûnerî dikin, em divê ku vê yekê bi başî werênina ser ziman ku em bahse hêze xiyalkirina xwe jî dikin. Hûnerî, bi têgîn û tefkîrkirina afirandinê bi hêze xiyalê ya.

Di kurdî de gotina ´hûnerê´, weke gotina ku mirov dikarê bi wateya wê ya «karîna afirandina bi xiyalkirinê» re mirov werêne ser ziman. Her wusa, gotina «hûnerê», bi têgîna xwe re karîna çêkerîya mirovî jî bi xwe re salix dike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku karîna mirov ya bi xiyalkirin û bi wê re bi hizirkirinê û bi wê hizirkiirnê re afirandinê bi xwe re bi wate dike. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku karîna afirandinê, wê tenê ne bes bê. Her wusa

têgîna adilandinê ya estetîkî jî bi wê divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa weke ku mirov ji wate û kirdeya gotina ´hûner´ fahm dike bi darêjkkirina wê jî giring a. Yanî bi pêşnûma kirin û adilandina wê re çêkerîya çêkirinî nîşandinî pêwîstî bi wê tê dîtin. Li ser wê afirandin û çêkirinê re bi pêşnûmabûna ku hatî û bûyî re wê li sipehîtîyê werêne lêgerîn. Sipehîtî, têgîneka ku em divê ku bi xweşikatiyê re werênina ser ziman. Ya sipehî ya delal a. Ya delal jî, ya rind û bedew a.

Hûner, her wusa dema ku em di çerçoveya têgîna estetîsmê de dihênina ser ziman li ser têgîna gotinê re bi darêjkî adilandinaka bi têgînî bi xwe re dihêne ser ziman. Adilandina bi nerînê re li ser gotinan re wê destpêkeka têgînî ya hizirkirinî ya hûnerî werêne li holê û li berçav. Bi hûnerî, di nava xîz, awa(şekl) û rengê di jîyanê de ew ahenga ku divê ku bi wê adilandinê werê girtin, wê hûnerê weke têgîneka jîyanî ya kirinî werêne li berçav. Em dema ku têgîna teorîkî ya hûnerê di vê temenê de bi kirinîya wê re dihêne ser ziman, em di vê temenê de hûnerîyê, bi têgîna estetîkî bi levhanîn, levhatin û levkirinekê re dihênina li holê.

Bi gotinê re têgîn û hizirîna hûnerî, weke şûbjeyeka jîyanî ya ku bi adilandina estetîkê re ku hatî estetîze kirin dibe. Hûner, her wusa mirov dikarê weke hişna bi hêstî hanîna ser ziman dibê. Her wusa, hûner, hinekê hêstîyarîya bi têgînî ku bi afrînerîyekê hatîya dayîn nîşandin a.

Her wusa hûner, hanîna ser ziman ya hêstî û hêstîyarîyê ya. Li vir, dema ku mirov bahse hûnerî bike, divê ku mirov bi afrînerîyekê têgînî, hêstîyarî û afrînerî werêne ser ziman. Lê dema ku bi tevgerî û ankû xûyî, dana nîşandin bû jî, di nava wan danîşanan de afirînerî bi têgîneka adilandinî re dihê dayîn nîşandin. Her wusa, levkirin, levhanîn û levhanîna bi gotinê re weke karîneka têgînî ya afrînerî ya têgîna hûnerê ya afrîner bê. Hûner, li vir, weke aliyekê wê yê ku mirov werêne ser ziman ew a ku di levkirin, levhanîn û levhatina bi gotinî re de ku hat kirin û nîşandin, bi wê re bû jî, bi wê nîşandinê re hêstîyarîya ku dihê û difirê bi dîtin û nerînê re, wê weke ancamaka têgînî ya hûnerî ya. Adilandina estetîkî, li vir, di wê çerçoveya hûnerî de xwe dide nîşandin. Hûner, hinekî jî bi dana nîşandina hêst û hanîna wan ya li ser ziman re ya. Her wusa salixkirina li ser darêjkê re divê ku mirov bi têgîna adilandinê re weke rastîyeka hûnerî werêne ser ziman. Darêjk, her wusa adilandina bi levkirin, levhanîn û levhatinê re ya. Li ser vê re jî, dema ku mirov bahse hûnerê bikin, her wusa salixkirina li ser darêjkê re wê tenê ne bes bê. Li vir, ew têgîna darêjkê ya bi hebûna wê re ku afirî, bi hişê wê re ew hêstîyarîya ku afirî, hûner weke rastîyeka wê ya ku di jîyanê de ku mirov

dikarê werêne ser ziman a. Her wusa, têgîna hûnerî, li vir, dema ku mirov wê hêstê werêne ser ziman, wê çaxê, bi têgînek şûbjeyî ya darêjkê re mirov dibînê ku xwe dihêne ser ziman.

Têgîna darêjkê, li vir dema ku mirov dihizirê bi hizirkirina mirov ya şûbjeyî re weke têgînekê xwe dide dîyar kirin. Têgînek hûnerî, her wusa ji nava hizirkirina me derdikeve. Her wusa, mirov dikarê hûnerê, weke derkek têgînî ya ji hizirkirina mirov werêne ser ziman. Ev jî, weke têgîneka ku mirov bi çerçoveya wê re werêne ser ziman.

Hûner, li ser hizirkirinaka ku hatî hizirkirin re dibê. Lê li vir, çendî ku ew hizirkirin û ankû berhem hebe jî, di dema ku di çerçoveya têgînek hûnerî de ew hûner were salixkirin, wê bi têgîna hêstîyarî ku ji wê afirê re, wê weke berhemek xwemalî ya hûnerî jî xwe bide dîyar kirin. Her leyistika hûnerî, çendî ku dûbare were leyistin jî, di her care ku leyistin bû de jî, bi wê hêst û hêstîyarîya ku di wê tamaşa kirinê re ku diafirêne, bi wê re ew berhem bi dîtinê re dibe berhemek xwemalî ya hûnerî. Her berhem, hertimî her care ku lê were nerîn û ankû tamaşakirin ku ew bi dûbarakirinî jî bê, wê her carê xwe bi têgîneka xwemalî de bide afirandin. Di aslê xwe de rastîya hûnerî jî, bi vê têgîna xwemalî ya ku bi hûnerê re ku hertimî xwe diparêzê re ew wê hûnerîtîyê dihêne ser ziman. Hingî, mirov dikarê bahse wê bike ku ew têgîn hûnerî ya. Hûnerîtî, hinekî jî, xwemalîtî û parastina wê bi têgînkirinê ya.Her care ku dîtin û ankû tamaşa kirin bi wê re bû, wê ew xwemalîtî weke rastîyeka hûnerî xwe bide dîyarkirin. Ev jî, li ser hêst û hêstîyarîya bi hişmendî re dibê.

Hûner, hertimî, her berhema ku hilda li dest, bi xwandina xwe re xwemalîyekê bi wê re dide nîşandin. Xwemalîtî, weke rastîyeka hûnerî ya ku mirov divê ku wê werêne ser ziman a. Berhema ku bi hezaran salan ku hatî nivîsandin û piştre her sal hatîya leyistin û tamaşa kirin, her dîtina bi wê re wê hêstîyarî û hêstna nû bi mirov re bi têgîn bike. Ev hêstên ku weke derkna wê berhemê na, di aslê xwe de, di temenê û afirîna wê de zanîna xêva me û ya berhemê heya. Têkiliya van herdû aliyan bi hevdû re di dîtin û tamaşa kirinê de xwe dide dîyarkirin. Ev jî, wê di çerçoveya nerînek hûnerî de hertimî bi tamaşakirinê re wê xwemalîtîyê weke têgîneka hûnerî biparêzê. Di aslê xwe de hûnerîtî jî, hinekî ew xwemalîtîya bi têgîna wê re. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse afirîna hûnerî bike. Têgîna afirînî ya hûnerî her wusa di vê çerçoveyê de weke têgîneka ku dayimî bi dîtin û tamaşakirina berhemê re xwe diafirênê ya. Ji zêdebûna berheman zêdetirî, bi dîtin û nerênê re zêdebûna tamaşa û dîtinê, weke wê rastîya dihêne ser ziman a.

Dîtin û tamaşa kirin, weke rastîyna hûnerî yên giring in ku mirov divê ku li ser wan bisekinê na. Her wusa, têgîna hûnerî li vir, bi nerîn û dîtinê re wê xwemalîtîya xwe ya ku diparêzê re xwe û afirînerîya xwe dihêne ser ziman. Afrînerîya hûnerî, her wusa di vê çerçoveyê de bi hêstîyarî ya. Aqilê hêstîyarî, aqilê ku bi hûnerî diafirê ya.

Li vir, dema ku mirov bi têgîna estetîkê dinerê, mirov weke têgîneka ku gûharîner ya bi nerînê re ku mirov dikarê werêne ser ziman a. Her wusa, nerîn li gorî dîtina mirov gûharîn bi wê re heya. Ya ku di temenê wê de jî ya, ast û radaya têgînî û têgihiştinî ya. Em dema ku li ser hêstê re werênina ser ziman, mirov divê ku werêne ser ziman ku dîtina estetîkî bi hûnerî û hwd, li gorî nerîna mirovan digûharê. Bi vê re, divê ku mirov weke rastiyekê werêne ser ziman ku bi têgîna hûnerî, berhema ku heyî li jîyanê weke têgînek objeyî ya nerîna mirov a. Lê ew berhem, di nava jîyanê de heya. Ya ku her berhemê dike xwemal û li gorî nerîna me dike têgînek, ew têgîna hûnerî ya. Her wusa, hûner weke têgîneka ku çendî wê xwemalîyê bi hêstîyarî dikarê biparêzê, wê ewçendî karibê bahse hûnerîya xwe bike. Bi hûnerê re ew hêsta ku bi xwemalî ku bi dîtin û tamaşayê re afirî, ew di aslê xwe de berhema hûnerî ya têgînî ya afirî ya. Her wusa, têgîna hûnerî, bi şîyarîya hêstîyarî re afirînerîya wê xwe dide dîyar kirin. Têgîna çerçoveyî ya hûnerî, em li vir bi wê têgîna adilandina estetîsmî re dihênina ser ziman. Têgîna adilandinî, her wusa li ser çerçoveya hûnerî re dibê. Li vir divê ku mirov werêne ser ziman ku hûnerîtî, her wusa, bi afrînerîya mirovî ya jîyanî re heya. Em ku li destpêka wê bigerihin, her wusa, ji kêlîka ku mirov bi dest xîzkirinê kir û wate da wan xîzkirina re wê werê ser ziman. Her wusa, ew wate jî, dema ku mirov bi têgîna hûnerî werêne ser ziman, wê weke têgîneka ku xwe bihiş kirî mirov divê ku wê werêne ser ziman. Hûner, di vê çerçoveyê de, bi wê adilandîna xwe ya estetîkî re nerînek nû ya li jîyanê ya jî.

Di nava têgîna jîyanê de dema ku mirov bahse hûnerê kir, mirov ivê ku zanibê ku mirov bahse têgînekê adilandî ku di wê de li sipehîtîyê dihê lêgerîn dike. Li vir, xweşikatî, her wusa, di vê çerçoveyê de bi wê adilandina ku dihê çêkirin re ku were derxistin li holê, di wê temenê de mirov divê ku werêne ser ziman. Têgîna bi gotina ”xweşikatîyê derxe li holê”, hinekî jî, di vê temen de rastîyekê dihêne ser ziman. Levkirin, levhanîn û levhatin, di vê çerçoveyê de bi têgîna hûnerî re bi adilandina wê re di hîmê wê de na.

Di nava rûpelên dîrokê de her wusa ku mirov dinerê, di vê çerçoveyê de bi têgîneka adilandinî pirr zêde lê hatîya lêgerîn. Hûnerî, têgînaka rast

ya şenber a bi adilandina xwe re. Ev jî, divê ku mirov wê bi jîyanê û hemû afirandinên di jîyanê de bi wan re werêne ser ziman. Her wusa, adilandina têgînî ya bi çerçoveyî ya hizrî û hwd jî, mirov dikarê weke hûnerîyekê werêne ser ziman.

Dema ku mirov bi dîrokê re dihêne ser ziman, mirov dibînê ku ev bi hezaran salana ku bi dîroka mirovatiyê re ev afrînerî û hewldana adilandina bi levkirinî, levhanî û levhatinî hatîya pêşxistin. Hizirkirin, weke têgîneka şûbjeyî ya diafirênê û ku wê levkirinê, levhanînê û levhatinînê dike ya.

Di çerçoveya jîyanê de mirov divê ku wê werêne ser ziman. Her wusa, bi dîrokê re di nava jîyane civatî de gelek berhem û destanan hatina nivîsandin. Ev, afirandin hemû jî, çendî ku bi navaroka wan re hûnerîyek bi çêkerî û çêkirina wan re hebe jî, wê weke çandna dîrokî ya civatî jî bin. Çand, ku bi rêya fêrbûn, alimandin û perwerdekirinê re karîgerî, xûy û adetên ku bidest xistina ji wan re mirov dikarê bêje çand. Her wusa, Çand, temenê wê li ser fêrbûn û alimandinê ya.

Çand, hinekî jî, bahse ya ku bidest dihê girtin, ku mirov dikarê çê bike, bixamilêne û lê binerê, dihêne ser ziman. Têgîna çandînî di vê çerçoveyê de weke têgînek dîrokî ya bi hezaran salan a. Hemû afirandinê têgînî ên bi jîyana mirov û civatî û hwd re, bi hebûna wan ya afirî re mirov dikarê weke çandê jî werêne ser ziman. Her wusa, çand, hinekî bi qabilîyet û kapasîteya mirov re jî dihê ser ziman. Her kirin, di çerçoveya çandekê de mirov dikarê wê werêne ser ziman. Her têgîn, her wusa, weke afirandinaka çandî jî mirov dikarê wê werêne ser ziman. Wêjavanî, helbestgerî, û hwd, bi gelek alîyîn din ên têgînî ku diafirin re mirov dikarê bi çandî jî werêne ser ziman.

Têgîna çandî her wusa bi hizrî li ser ya rast û ya hatî afirandin re mirov dikarê werêne ser ziman. Ya rast jî, bi têgîna ya ku li jîyan hatî afirandin û heya re dihê ser ziman. Çand, bi têgînî, mirov dikarê wê bi kortasî li ser serborî û fêra me ya ku afirî re werêne ser ziman. Her wusa, serdemên buhurî ên ramyarî, karîgerî, nivîsandinî û hwd, wê di vê çerçoveyê de weke têgîneka çandî jî werina ser ziman. Di vê çerçoveyê de, çand, lingekî wê li ser tişta ku heyî û afirî û bi hebûn a. Yanî şenber a û bi dest tê girtin, dîtin û jê bihêstbûn û bi hişbûn diafirê. Lê lingê wê yê duyemin jî, bi têgîna fêrê re dihê ser ziman. Ev jî, weke aliyekî ku mirov salixkirina fêrê re dikarê werêne ser ziman. Fêr, ya ku dihê jîyîn û ankû hatîya jîyîn a. Her wusa, ya ku hatî jîyîn, ew fêr me ya. Ya ku me jîyankirîya û li şûn xwe hiştîya weke paşêroj, ew fêra me ya ku bûyî jî

dihêne ser ziman. Ev bi hemû aliyên jîyanî re mirov dikarê werêne ser ziman. Çerçoveya gotina çandê, di vê çerçoveyê de berfireh a.

Têgîna çandî, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku bi demê re xwe bi mirov re bicih dike û dihêne ser ziman. Mirov, dema ku di nava civatê de dijî, bi demê re rengê jîyane civatê fêr dibe. Li gorî nirx û darêjkên wê yên jîyanî bi fêrbûna wan re dijî. Ev biçandbûna mirov a li gorî wan nirxên civatîkî ya. Her wusa, her civatek, xwediyê nirx, darêjk û rengê jîyane xwe ya ku mirov dikarê weke çandîya wê werêne ser ziman a. Dîroka civatê, bi hemû rengên wê yên pêşketî û heyî re navaroka wê gotina çandê tişî dike. Têgîna çandî, her wusa, weke têgînek gelemper ya civatî ya. Fêrbûnên keseyetî ên mirovî, fêrbûna mirovî a çandî ya. Her wusa fêrbûna civatî ya bi dîrokê re û pêşketina wê ya bi deman re û ku hemû afirandinên wê yên civatîkî jî di nav de têgînîya wê ya çandî bi xwe re dihêne ser ziman.

Têgîna çandî, bi dîrokê re her wusa xwediyê pêşketinekê ya. Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman, ku piştî ku jîyan bicihbû û pêşket pê de, têgîna çandînîyê re temenê wê afirî. Kirinên mirovî ên bi tenê û her wusa ên bi hevdû re di vê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman.

Di serdemên buhurî de di nava jîyanê de pêşketina şivanîtîyê, çandînîyê û her wusa çêkirina mast û panîr û hwd, bi hemû aliyên din ên jîyanî ku pêş dikevin re wele karîgerîyna çandî ên ku mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa zanîna kirina karên jîyanî bi fêrbûna wan re, wê bi têgînî temenê gotina çandê jî bi xwe re biafirêne.

Gotina çandê, di kurdî de wateyê wê, ew a ku ya ku tê çandin, ya ku zanîn, ya ku hatî fêrkirin, ya ku bûya û heya bi hiş, ya ku miirov dike û hwd a. Bi van wateyan re mirov dikarê gelek wateyên wê ên din jî werêne ser ziman. Têgîna çandê her wusa di vê çerçoveyê de çerçoveya jîyanê ji xwe re dike temen û hîm. Her wusa çand, li vir, li ser tişta ku bûyî, heyî û fêrbûyî re mirov dikarê werêne ser ziman.

Mirov, weke zindiyekî bi hiş a. Hertimî fêr dibe. Heta ku jîyanê wê heya û didomê, wê ew fêrbûn û bizanînbûna wê bibe. Zanîn, li vir, dema ku em di vê çerçoveyê de lê dihizirin, weke têgîneka ku hinekî jî mirov dikarê bi têgîna çandê re jî werênina ser ziman a.

Çand, her wusa di nava jîyanê de mirov wê bihemû tiştên ku afirîna û hena re dikarê salix bike û werêne ser ziman. Di jîyanê de hemû afirandinên bi darêjk ku hena û bûna, bi wê çerçoveya xwe ya heyî û bûyî re, xwediyê têgînek çandî ya. Her afirandin, her wusa dema ku mirov li wê dihizirê, mirov dibînê û kifş dike ku bi darêjka û çerçoveya wê heya.

Mirov dikarê bi dest bigrê û dest lê bide. Her wusa, bi dîtina xwe re bibînê. Ji wê, fêr bibe.

Her wusa, di vê çerçoveyê de çand, çend ku bi darêjkî mrov bi afirandinên di jîyanê de ku dibin re dibînin jî, divê ku mirov li ser têgîna adilandin û hêstê re jî mirov li wê bihizirê. Hişmendîya fêrbûnê, her wusa bi mirov re dayimî pêş dikeve. Ev hişmendî, têgîneka ku mirov ji wê hêstîyarîyê jî dike ya. Her tişta ku heyî û bi afirîyî, mirov dikarê bi wê re hêstekê bidest bixe. Hebûn, ne tenê bi hizirîya wê re heya. Her wusa, ji aliyê çandî û hûnerî ve ku mirov li wê dinerê, mirov bi têgînekê wê bi hêstîyarî jî dibînê.

Çand, têgîneka ku pişta xwe dide kevneşopîya civatî ya. Her wusa, bi wê re jî xwe bi hîm û temen dike. Di vê çerçoveyê de fêrbûna kevneşopîkî, bi çandê re mirov dikarê werêne ser ziman. Têgîna çandî, di vê çerçoveyê de ku mirov li ser fêrbûnê re werêne ser ziman, weke têgîneka ku dayimî di xate pêşketinê de ya. Ev jî bi jîyane civatî û ankû ya mirov re ya.

Di jîyanê de têgîna çandî, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku afirandinîyeka jîyanî bi xwe re dihêne ser ziman. Bi çandê re fêr û cerbên mirovî û civatî û hwd, bi dîrokê re ku afirîna, wan dike hîm û bingeh. Di jîyanê de bi dîrokê re hertimî pêşketina bi demê re dibê. Ev jî, wê bi demê re hizirkirinê pêş bixe. Hizirkirin, li ser fêr, cerb û zanînên mirov ên bi demê re diafirê û dibe. Di çerçoveyê de afirînerîya hizirkirinê ya şûbjeyî jî mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, têgîna çandê bi mirov dide têgîhiştin ku mirov fêr, cerb û zanînên xwe yên demên buhurî ku wan di berçav de derbas bike û ji wan sûd bigrê û bi wê re jî xwe bigihêne têgînna nû ên bi demê re.

Me li jor bi têgîna hûnerê re xwemalîtîya afirînerî ya bi hêstê re hanî ser ziman. Ev, weke têgîneka ku mirov bo fahmkirina çandê jî ku mirov bi vir ve girêdayî hilde li dest a. Têgîna çandî, her wusa bi hizirkirina şûbjeyî re bi têgîneka fêrî xwe dide dîyarkirin. Bi dîroka civatê re û her wusa bi kevneşopîyê re mirov dikarê li wê bihizirê. Çand, weke têgîneka afrîner ya bi fêrî ya. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku her dîtin, wê di nava çandê de weke têgînekê xwe werêne ser ziman. Çand, rengê wê yê pêşketinê ê bi demê re bi jîyanê civatî re li ser zimanê civatê re xwe dide dîyar kirin. Têgîna civatê, divê ku mirov werêne ser ziman ku têgînek çandî jî ya. Kevneşopîtîya wê, her wusa divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Her afirandina bi têgînî ya di nava jîyanê

de wê weke têgînek çandî jî bê. Ev ku bi zanînê bê, bi bawerî bê û ankû bi cûreyên din ên têgînî û hwd bê.

Em li vir, hinekî bi hûnerê re di hanîna xwe ya li ser ziman de bidomênin. Her wusa, li vir, hûnerî, hinekî jî, bi têgînî xwediyê şûbjeka jîyanî ya. Ev têgîna şûbjeyî ya hûnerî ku mirov li wê dihizirê, divê ku mirov bi têgîna nerînê re li ser wê re kûr herê. Di vê çerçoveyê de têgîna hûnerê, mirov di nava jîyanê de dibê. Têgîna hûnerê bi nerîna xwe re xwediyê têgîneka çerçoveyî ya estetîkî ya. Ev jî bi têgîna adilandina wê re xwe dide li der. Dema ku mirov wê fahm dike, mirov vê yekê jî dibînê ku bi têgîna adilandinê re têgîna hûnerî xwe bi pêş dibe. Di nava hûnerê de bi têgîna adilandinê re li delalîyê gerîn weke têgîneka nerînî ya. Dema ku mirov bahse bijartinîtîyê bi nerînê re dike, her wusa li vir mirov di çerçoveya nerîn û têgîhekê de bahse wê dike. Di nerînê re bijartin û ankû vebijartin, wê di temenê xwe de lêgerîna li delalîyê bide dîyar kirin. Ya delal, ya xweşik, baş û teze ya. Her wusa têgîna delalîyê bi kurdî re ku her wusa têgîneka bijartî jî ya. Divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman.

Delalî, dema ku mirov bahse wê dike, mirov bahse xweşikatîyeka ku mirov ew acibandî dike. Di vê çerçoveyê de ew xweşikatî, bi acibandina mirov re bigotina delalîyê re dihê ser ziman. Ev têgîna adilandinê bi têgîna hûnerîyê re, ku em şîroveya xwe ya li ser çandê re ku me li jor jî kir ku em li berçav bigrin, bi wê re bi têgîna şenber û sîmset ya li berçav re bi estetîkî were ser ziman. Şenberîya xweşikatiyê, di vê çerçoveyê de bi adilandinaka delalî, dihê kifşkirin..

Xweşikatî, weke ku me li jor bi hûr û kûr şîroveya wê kir, wê bi adilandinekê re were ser ziman. Lê li vir, dema ku mirov bi têgîna hûnerê re li wê bihizirin, her wusa weke nerîneka bijartî jî dihê li holê û xwe dide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de têgîna xweşîkatiyê weke nerînekê, ku li ser ast û radayaka têgînî û zanînî re heya, wê bi wê re bi têgîna adilandinê û piştre bi acibandinê re bijartinê bike. Ev jî, bi têgîna hûnerî re weke têgînekê ya ku dema ku mirov li bi hûnerî dinerê, bi têgîneka bijarta mirov dinerê û her wusa ew têgîna bijarta jî weke têgîneka rexnegir xwe dide dîyar kirin.

Di têgîna bijartinê de lêpirsîna li adilandinê bo gihiştina adilandina hê çêtir a. Her wusa, di vê çerçoveyê de salixkirina xweşikatiyê bi têgîna acibandinê bi dîtinê û nerînê re êdî weke têgîna hişmendî dibê. Lêpirsîna li ser gotina hûnerê re, her wusa di çerçoveya dem û mekanê de, bi çerçoveya têgînî ya demê re ya. Em li vir, divê ku vê jî bi wê re werênina

ser ziman ku ast û radaya demî ya zanînî jî weke hîmekê kifşkar a ku mirov divê ku li vir werêne ser ziman a. Hûner, lêgerîneka wê ya dayimî heya li xweşikatiyê. Ev jî, bi têgînî wê li ser levkirin, levhanîn û levhatînîyê re xwe bi acibandina ku dibe re bide nîşandin.

Acibandin, wê rêya çûyîna bi ber xweşikatiyê ve bê. Lê wê ew acibandin, hertimî xweşikatiyê, gavekê li pêşîya xwe bibînê. Bi wê re jî, êdî wê li ser wê re xwe bi armancaka gihiştina wê re di nava têgîna hûnerî û demî de bibînê. Xweşikatî, weke têgîneka ku mirov divê ku wê bi rewş û adilandina nerînî re fahm bike ya. Her wusa, xweşikatî, hêsteka xort ya levkirî û levhatî ya.

Têgîna hûnerî, her wusa weke têgîneka ku di vê lêpirsîna li ser xweşikatiyê de ku xwediyê têgînaka acibandinê ya. Ya ku mirov wê diacibêne, ya ku mirov wê rast û baş dibînê ya. Ev tê wê wateyê ku di temenê acibandinê, têgîna başî û rastîtîyê heya. Her wusa, Lê xweşikatîya ku hatîya kifşkirin bi nerînê re hertimî bi gotina ´qanciyê´ re ne hatîya ser ziman. Bi têgînî qancî hevlingê başîyê ya. Lê ew têgîna xweşikatiyê, ku bi hêsta xwe kirina xwediyê re bi têkildarî, bi qancî û ankû ne qancî hatîya şîrovekirin. Li vir, xweşikatî, ku weke qanciyekê were dîtin, hêsta lê xwedîbûnê derketiya li pêş. Xweşikatî, hertimî wê bi adilandinê re hebe. Ev xweşikatiya zindiyê ya mirovî bê û ankû ya tiştî ku li jîyanê bi tiştan de hatibê salixkirin bê. Di vê çerçoveyê de hûnerîya têgînî bi xweşikatiyê re û ankû bi xweşikkirinê re eleqeder bûya. Bo vê yekê, têgîna estetîkî ya hûnerî, bi têgînek nerînî ya darazî re li wê rewşê dinerê. Her wusa bi vê yekê re êdî adilandinê dike berlêpirsînê de. Ev adilandina ku kir berlêpirsînê de wê bi wê re çawa bi xweşikatiyekê were ser ziman, ev jî êdî di ancama wê de dihê salixkirin. Yanî, têgîna hûnerî ya estetîkî lêpirsîneka bi nerînî ya bi acibandinê re dihêne li holê.

Têgîna acibandinê, weke têgîneka ku di hemû deman de li wê hatîya lêgerîn. Xweşikatî, weke tiştekî ku were bidest xistin hatîya dîtin û fahmkirin. Di vê çerçoveyê de xweşikatî bi hêstîyarîya xwe re bûya xewneka mirovî.

Têgîna acibandinê, wê li wê lêgerînê bi têgîna hûnerî û levkirin, levhanîn û levhatinîya wê re were lêgerîn. Xweşikatî, di serdemên buhurî ên şariştanîyê de bi gelek hizran û têgînan hatîya salixkirin. Biqasî bi ´ne qanciyê´ re hatîya salixkirin, her wusa bi wê re jî, bi ´pîrozî´ jî hatîya dîtin. Xweşikatî, weke têgîneka pîroz jî hatîya dîtin û lê wê hatîya hizirîn.

Di nava rengên baweriyên serdemên kevn de, şîroveyên li ser xweşikatiyê ku hatina kirin, divê ku mirov wan li vir bibîr bike. Her

wusa, di nava têgîna yazdaniyê de jî şîroveyek xweşikatiyê bi jinê re hatîya kirin. Jin jî, hatîya ´pîroz´ kirin. Di vê çerçoveyê de xweşikatî weke ´têgîn û ankû tiştekî li jîyanê rûdayî û heyî dihê dîtin. Bi wê re jî, bi hin şîroveyna, weke tiştekî ku yazdan dayî mirov dihê dîtin. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku xweşikatî weke têgînekê, di mejî de di vê çerçoveyê de bûya temenê lêgerîneka bi mejî û têgîhiştin û zanîna mirov re.

Em li vir dema ku bahse dîroka têgîna xweşikatiyê bikin, divê ku mirov dîrokeka giştî ya mirovatiyê li berçav bigrê û biwê re werêne ser ziman. Her wusa, dîroka mirov ya têgîhiştin û hizirkirinê, wê di temenê lêgerîneka bi wê re jî bê. ”Armanca xwe gihandina ya baş”, weke têgîneka ku mirov dikarê di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Armanca xwe gihandina ya baş, wê bi hizir re bihiş re were kirin. Ev jî, weke lêgerînekê ya. Car bi car, têgînên hizrî, weke têgîneka ´rastteqînî´ ku hatina ser ziman, wê di cewherê wan de ew ´xweşikatî´ lê werê hizirîn û hewl bê dayîn ku xwe bigihênina wê.

Xweşikatî, bi têgîna xwe re weke mijaraka ku mirov divê ku hûr û kûr li ser wê bisekinê ya. Bi têgînî, aliyekî mirov ê hizrî jî dihêne ser ziman. Her wusa dema ku mirov bahse xweşikatiyê dike jî, mirov bi vê yekê re xwediyê têgîneka bijarta ya. Têgîna bijarta bi xweşikatiyê re heya. Ji xwe, têgîna xweşikatiyê, weke têgîneka ku bijarta ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov li wê bihizirê û wê werêne ser ziman. Ev têgîn, bi hîmî xwediyê ast û radaya zanîna mirov a bi hemû deman re ya.

Têgîna estetîkî ya hûnerî, ev têgîna bijarta ya xweşikatiyê, weke têgîneka rexnegir jî bi têgîn kirîya. Divê ku mirov vê yekê jî li vir bi vir ve girêdayî kifş bike. Her wusa, têgîna xweşiaktiyê, dema ku mirov li wê dihizirê, di vê çerçoveyê de, bi gotina ´mirov ya xweşik dike ku bibînê´ re wê dihêne ser ziman. Ya xweşik, wê bi têgîna me re hebe. Lê bi adilandina di jîyanê de re jî wê hebe. Her wusa, li vir, tenê ew maya ku mirov wê kifş bike ya.

Weke têgîneka hûnerî ya bi xweşikatiyê re ku dihê ser ziman, ew a ku ´xweşikatî, li bendê kifşkirina xwe ya.´ Xweşikatî, dema ku mirov vê yekê dibeje mirov, wê weke hebûneka ku heyî herê dike. Di serdemên berê de, bi têgînên bawerî, felsefîkî û hwd re ev hebûya. Lê bi demê re têgîna felsefeyê, bi têgîna hûnerî û hwd re, têgînek adilandinê di temenê wê de hanîya ser ziman. Li vir, divê ku mirov dûbara werêne ser ziman ku daraza mirovî ya xweşikatiyê, bi nerîna mirov re heya. Her wusa, ev jî, vê têgîna estetîkê bi bîra me dike ku ”acibandinên mirovî, ji hev cuda

na.” dihêne berbîra me. Têgîna estetîsmê, li vir ev nerîna hûnerî ya kirina berlêpirsînê û bijarta, bi xwe re weke têgînaka afirandina wê dihêne ser ziman.

Mirov, dema ku li tiştekî dinerê, mirov li gorî acibandin û nerîna xwe wê dibijêrê. Her wusa li ser wê re mirov yan diacibêne û yan jî neacibêne. Acibandin, li vir dema ku mirov wê dike, mirov li gorî têgînna xwe ya zanînî dike. Her wusa, di wê çerçoveyê de mirov li adilandin, levkirin, levhanîn û levhatina wê dinerê. Ev rewş hemû bi dem û mekanê re bi dîtîna me re çendî ku lev dike, mirov di wê çerçoveyê de wê diacibêne. Ya ku mirov aciband, wê li gorê xwestek, mêyl û nerîna mirov bê. Ev têgîna bi nerînê bi zanebûnî ku hatî estetîzekirin, wê di wê çerçoveyê de xwe bide dîyar kirin. Xweşikatî, weke têgînekê mirov divê ku bi du aliyan re wê werêne ser ziman. Aliyê pêşî bi heyîna afirî re ya. Ev alî, wê bi wê hebûna li dervî me ku bi levkirinîya xwe re ku heya re divê ku mirov werêne ser ziman. Aliyê din jî, bi fêr û zanîna mirov re ya ku ev jî, bi keseyetîyê û aliyên wê yên weke rewîst, hişmendî û hwd re ku mirov dikarê werêne ser ziman.

03.12.2011/Kurdistan, Cizîra bota; Abdusamet Yigit

”,,,,